

K.T.
ZANÎNGEHA VAN YÜZÜNCÜ YILÊ
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ



MUQAYESEKIRINA ZIMANÊ HÎTÎTÎ Û KURDÎ
(KURMANCÎ)

TEZA LÎSANS A BİLİND

AMADEKAR

Süleyman YILDIRIM

ŞÊWIRMEND

Prof. Dr. Vechi SÖNMEZ

WAN -2019

**T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**



**HİTİTÇE VE KÜRTÇENİN KARŞILAŞTIRILMASI
(KURMANCI)**

YÜKSEK LİSANS TEZİ

HAZIRLAYAN

Süleyman YILDIRIM

DANIŞMAN

Prof. Dr. Vechi SÖNMEZ

VAN -2019

(Teza Lîsansa Bilind)

Süleyman YILDIRIM

ZANÎNGEHA VAN YÜZÜNCÜ YILÊ
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ

Cotmeh, 2019

(MUQAYESEKIRINA ZIMANÊ HÎTÎTÎ Û KURDÎ

(KURMANCÎ)

KURTE

Armanca vê tezê muqayesekirina zimanê Hîtîtî û zaravaya sereke ya zimanê Kurdî, Kurmanciyê ye. Zimanê Hîtîtî di Malbata Zimanê Hînd-Ewropî de zimanekî herî kevn e û di nava Koma Zimanên Anatolyayê de cih digire. Zimanê Kurdî jî di Malbata Zimanê Hînd-Ewropî de, di nava Koma Zimanên Îranî yê Bakurê rojava de cih digire. Ev xebat bi piranî ji çavkaniyên rêzimanî û metnên nivîsa mixî sûd wergirtiye û li ser van esasan hatiye amadekirin.

Ev xebat ji destpêk, sê beşên sereke û encamê pêk tê. Beşa yekem; ji aliyê ziman, dengzanî û peyvsaziyê ve beşa duyem; ji aliyê nav, cihnav û rengdêrê ve beşa sêyem; ji aliyê hoker, ergatîf û lêkerê ve hatiye muqayesekirin.

Peyvên Sereke : Zimanê Hînd-Ewropî, Zimanê Hîtîtî, Zimanê Kurdî,
Hîtîtî û Kurdî

Hejmara Rûpelan : 137 + XII

Şêwirmend : Prof. Dr. Vechi Sönmez

(Yüksek Lisans Tezi)

Süleyman YILDIRIM

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

Ekim, 2019

HİTİTÇE VE KÜRTÇENİN KARŞILAŞTIRILMASI
(KURMANCI)

ÖZET

Bu tezin amacı Hitit dili ile Kürt dilinin Kurmanci lehçesinin karşılaştırılmasıdır. Hitit dili en eski Hint-Avrupa Dil Ailesi'ne ait bir dildir ve Anadolu Dilleri Grubunda yer almaktadır. Kürt dili de Hint-Avrupa Dil Ailesinin İrani Kolunun Kuzeybatı Grubunda yer almaktadır. Bu çalışma, daha çok gramatik kaynaklar ve çivi yazılı metinlerden yararlanılıp bu esaslar çerçevesinde hazırlanmıştır.

Bu çalışma giriş, üç bölüm ve sonuçtan meydana gelmektedir. Birinci bölümde dil, sesbilim ve şekilbilim; ikinci bölümde isim, zamir ve sıfat; üçüncü bölümde zarf, ergativ ve fiil, açısından karşılaştırılmıştır.

Anahtar Kelimeler : Hint-Avrupa Dilleri, Hitit Dili, Kürt Dili, Hititçe ve Kürtçe
Sayfa Sayısı : 137 + XII
Tez Danışmanı : Prof. Dr. Vechi Sönmez

(M.Sc. Thesis)

Süleyman YILDIRIM

VAN YÜZÜNCÜ YIL UNIVERSITY
INSTITUTE OF LIVING LANGUAGES

October, 2019

COMPARISON HITTITES LANGUAGE AND KURDISH

(KURMANJI)

ABSTRACT

The aim of this thesis is to compare the Hittite language and Kurdish language Kurmanji dialect. The Hittite language belongs to the oldest Indo-European Language Family and belongs to the Anatolian Languages Group. The Kurdish language is also in the Northwest Group of the Iranian branch of the Indo-European Language Family. This study mainly benefited from grammatical sources and cuneiform texts, and has been prepared within the framework of these principles.

This study consists of introduction, three chapters and conclusions. In the first part, language, phonology, morphology, second part are compared in terms of noun, pronoun and adjective. In the third chapter, adverb, ergativ and verb are compared.

Key Words : Indian-European Languages, Hittite, Kurdish, Hittite and
Kurdish
Quantity of Page : 137 + XII
Supervisor : Prof. Dr. Vechi Sönmez

NAVEROK

KURTE	I
ÖZET	II
ABSTRACT	III
NAVEROK	IV
KURTEBÊJE	VII
PELRÊÇA TABLOYAN	IX
TERMÎNOLOJÎ	XI
PÊŞGOTIN	XII
DESTPÊK	I
1. ZIMAN, DENGZANÎ, PEYVSAZÎ	8
1.1. Ziman	8
1.1.1. Ji Aliyê Binyadê Ve Malbatên Zimanan	8
1.1.2. Zimanê Hîtîfî.....	9
1.1.3. Zimanê Kurdî.....	13
1.2. Dengzanî	16
1.2.1. Nivîs û Alfabe	16
1.2.1.1. Nivîs û Alfabeya Hîtîfî.....	16
1.2.1.2. Nivîs û Alfabeya Kurdî.....	21
1.3. Peyvsazî	32
1.3.1. Kok.....	33
1.3.1.1. Di Hîtîfî de Koka Nav, Rengdêr û Lêkeran.....	33
1.3.1.2. Di Kurmancî De Koka Nav, Rengdêr û Lêkeran	35
1.3.2. Qertaf.....	36
1.3.2.1. Di Hîtîfî de Qertafên Pêşgir, Navgir û Paşgir.....	36
1.3.2.2. Di Kurmancî De Qertafên Pêşgir, Navgir û Paşgir	44
2. NAV, CÎHNAV, RENGDÊR	52
2.1. Nav	52
2.1.1. Li Gorî Hejmarê Nav.....	52
2.1.1.1. Di Hîtîfî De Navên Yekjimar, Pirjimar û Komjimar	52
2.1.1.2. Di Kurmancî De Navên Yekjimar, Pirjimar û Komjimar	53
2.1.2. Ji Aliyê Zayendê Ve Nav	53
2.1.2.1. Di Hîtîfî De Zayenda Siruştî û Nêtar	53

2.1.2.2. Di Hîtîti de Zayenda Rêzîmanî.....	54
2.1.2.3. Di Kurmancî De Zayenda Siruştî û Nêtar	54
2.1.2.4. Di Kurmancî de Zayenda Rêzîmanî	55
2.1.3. Nerênî û Nerênîya Navan	58
2.1.3.1. Di Hîtîti De Nerênî û Nerênîya Navan	58
2.1.3.2. Di Kurmancî de Nerênî û Nerênîya Navan	60
2.1.4. Halê Navan	63
2.1.4.1. Di Hîtîti De Halê Navan.....	63
2.1.4.2. Di Kurmancî De Halê Navan	66
2.2. Cihnav	69
2.2.1. Di Hîtîti De Cihnav	69
2.2.1.1. Cihnavên Kesane	70
2.2.1.2. Cihnava Vegerok	73
2.2.1.3. Cihnavên Xwedîtiyê	74
2.2.1.4. Cihnavên Şanîdanê	77
2.2.1.5. Cihnavên Nediya	78
2.2.1.6. Cihnavên Pirsîyariyê.....	80
2.2.1.7. Cihnavên Girêkî.....	81
2.2.2. Di Kurmancî De Cihnav.....	82
2.2.2.1. Cihnavên Kesane	82
2.2.2.2. Cihnava Vegerok	83
2.2.2.3. Cihnavên Xwedîtiyê	84
2.2.2.4. Cihnavên Şanîdanê	86
2.2.2.5. Cihnavên Nediya	86
2.2.2.6. Cihnavên Pirsîyariyê.....	87
2.2.2.7. Cihnavên Girêkî.....	88
2.3. Rengdêr.....	91
2.3.1. Di Hîtîti De Rengdêr	91
2.3.1.1. Rengdêrên Çawaniyê	92
2.3.1.2. Rengdêrên Şanîdanê	92
2.3.1.3. Rengdêrên Nediya	93
2.3.1.4. Rengdêrên Pirsîyariyê.....	94
2.3.2. Di Kurmancî De Rengdêr	94
2.3.2.1. Rengdêrên Çawaniyê	94

2.3.2.2. Rengdêrên Şanîdanê	95
2.3.2.3. Rengdêrên Nediyaar	96
2.3.2.4. Rengdêrên Pirsîyariyê	96
3. HOKER, ERGATÎF, LÊKER.....	99
3.1. Hoker	99
3.1.1. Di Hîtîfî De Hoker.....	99
3.1.2. Di Kurmancî De Hoker	101
3.2. Ergatîf.....	103
3.2.1. Di Hîtîfî De Ergatîf.....	104
3.2.2. Di Kurmancî De Ergatîf	105
3.3. Lêker	107
3.3.1. Di Hîtîfî De Lêker	108
3.3.2. Di Kurmancî De Lêker	113
ENCAM	120
ÇAVKANÎ.....	123
PÊVEK.....	131
Pêvek 1. Termînolojiya Rêzimanî/ Grammatical Terminology.....	131
Pêvek 2. Îşaretên Nivîsa Mixî (Dengdar+dengdêr)	134
Pêvek 3. Alfabeya Bîn û Şad Masî Sûratî.....	135
Pêvek 4. Alfabeya Kurmancî ya Latînî.....	136
Pêvek 5. Tableta Peymana Kadeş	137

KURTEBÊJE

Kurtebêje

Daxuyanî

Abl.	Ablatîf
akd.	akadî
akk.	Akkusatîf
Akt.	Aktîf
amd.	amadekar
bnr.	binêrin
b.n.	berhema navborî
b.z.	berî zayînê
cld.	cild
c.	commune
C.	Consonant
d.	dingir
Dat.	Datîf
ed.	edîtor
enkl.	enklîtîk
f.	femînum
g.n.	gotara navborî
Gen.	Genîtîf
hît.	hîtîtî
h.b.	heman berhem
h.g.	heman gotar
hjm.	hejmar
HK.	Hîtîtiya Kevn
HN.	Hîtîtiya Nû
hw.	Herwiha
hwd.	her wekî din
Imp.	Imperatîf
Instr.	Instrumental
îdgr.	îdeogram
İ.Ü.E.F	İstanbul Üniversitesi Edebiyat Fakültesi

KDB.	Koka Dema Borî
kurm.	kurmancî
Lok.	Lokatîf
m.	maskulîn
Nom.	Nomînatîf
n.	Neutrum
Nom.-akk. n.	Nomînatîf-Akkusatîf-Neutrum
Part.	Partîkel
Pl.	Plural
Prs.	Prasens
Prt.	Preterite
Sg.	Sîngular
som.	somerî
t.	tîne
ûyd.	û yên din
Vok.	Vokatîf
Weş.	Weşanxane
Wer.	Wergêr
/-.../	Pêşgir
/...-/	Paşgir
/-...-/	Navgir
→	Dibe be
Ø	Sifir/nîn

PELRÊÇA TABLOYAN

Tablo 1. Krolonojiya Qralên Hîtîtiyan	3
Tablo 2. Malbatên Zimanan.....	8
Tablo 3. Qertafên Pêşgir û Paşgir (Kurmancî)	15
Tablo 4. Alfabe ya Hîtîti.....	18
Tablo 5. Tîpa î û e'yê (Hîtîti).....	20
Tablo 6. Tîpa a û e'yê (Hîtîti).....	20
Tablo 7. Kêşana a û e'yê (Hîtîti).....	20
Tablo 8. Tîpa z/ts (Hîtîti).....	21
Tablo 9. C+V û V+C (Hîtîti)	21
Tablo 10. Alfabe ya Kurmancî	23
Tablo 11. Tîpên Di Alfabe ya Kurmancî De	23
Tablo 12. Tîpguhertin: ê/î: i (Kurmancî)	24
Tablo 13. Tîpguhertin: e/i û e/î (Kurmancî)	25
Tablo 14. Tîpguhertin: î/i (Kurmancî)	26
Tablo 15. Tîpguhertin: î/i û ê/i (Kurmancî).....	26
Tablo 16. Tîpguhertin: a/e, î/i û o/u (Kurmancî)	26
Tablo 17. Tîpguhertin: û/u (Kurmancî).....	27
Tablo 18. Tîpguhertin: a/î (Kurmancî).....	28
Tablo 19. Tîpguhertin: a/e û a/ê (Kurmancî).....	28
Tablo 20. Tîpguhertin: o/w û o/y (Kurmancî)	29
Tablo 21. Tîpguhertin: o/h (Kurmancî).....	29
Tablo 22. Tîpên jihev û nêzî hev (Kurmancî).....	29
Tablo 23. Guherîna Dengdaran (Kurmancî).....	30
Tablo 24. Peyvên Xwerû (Hîtîti û Kurmancî)	32
Tablo 25. Qertafa Bêjesaz (Hîtîti û Kurmancî).....	32
Tablo 26. Peyvên Hevedudanî (Hîtîti û Kurmancî)	33
Tablo 27. Koka Nav, Rengdêr û Lêkeran (Hîtîti)	34
Tablo 28. Koka Nav û Lêkeran (Kurmancî).....	35
Tablo 29. Qertafên Pêşgiran (Hîtîti).....	37
Tablo 30. Qertafa Navgir -nîn (Hîtîti).....	37
Tablo 31. Paşgirên Navên Razber Çêdikin (Hîtîti).....	38
Tablo 32. Bi Qertafên Paşgiran Çêkirina Nomîna Actîons û Aktorîs (Hîtîti)	39
Tablo 33. Paşgirên Navên Hacetan Çêdikin (Hîtîti)	39
Tablo 34. Paşgirên Piçûker (Hîtîti)	39
Tablo 35. Paşgira -ant (Hîtîti).....	40
Tablo 36. Paşgirên Rengdêran Çêdikin (Hîtîti)	40
Tablo 37. Bi paşgira -uma/umna Etnîsîta Navên Cihan (Hîtîti)	41
Tablo 38. Bi Paşgira -îlî Çêkirina Navên Zimanan (Hîtîti).....	42
Tablo 39. Paşgirên Lêkeran Çêdikin (Hîtîti)	42
Tablo 40. Mînakên Paşgirên lêkeran çêdikin (Hîtîti).....	43
Tablo 41. Pêşgirên Lêkeran Çêdikin (Kurmancî)	44
Tablo 42. Pêşgirên Rengdêran Çêdikin (Kurmancî).....	45
Tablo 43. Qertafên Navgiran (Kurmancî)	45
Tablo 44. Paşgirên Navên Hacetan Çêdikin (Kurmancî).....	46

Tablo 45. Bi Rengdêran Piçûker (Kurmancî)	46
Tablo 46. Bi Paşgiran Biçûker (Kurmancî)	47
Tablo 47. Paşgirên Navên Razber Çêdikin (Kurmancî)	47
Tablo 48. Paşgirên Ji Navan Navan Çêdikin (Kurmancî)	47
Tablo 49. Paşgirên Ji Navan Rengdêran Çêdikin (Kurmancî)	48
Tablo 50. Paşgirên Ji Rengdêr û Lêkeran Navan Çêdikin (Kurmancî)	48
Tablo 51. Paşgira -î- (Kurmancî)	49
Tablo 52. Paşgira -î-, Mensûbiyata Cih û Zimanan (Kurmancî)	49
Tablo 53. Paşgira -în û -andin (Kurmancî)	50
Tablo 54. Yekjimar, Pirjimar û Komjimar (Hîtîti)	52
Tablo 55. Yekjimar, Pirjimar û Komjimar (Kurmancî)	53
Tablo 56. Navên Nêr, Mê û Nêtar (Hîtîti)	53
Tablo 57. Navên Nêr, Mê û Nêtar (Kurmancî)	54
Tablo 58. Qertafên Nediarkirî (Kurmancî)	55
Tablo 59. Qertafên Veqetandekê û Mînakên Wê (Kurmancî)	56
Tablo 60. Qertafên Tewangê (Kurmancî)	57
Tablo 61. Mînakên Qertafên Tewangê (Kurmancî)	58
Tablo 62. Nerêniya Navan (Hîtîti)	60
Tablo 63. Nerênî (Kurmancî)	62
Tablo 64. Nerêniya Navan (Kurmancî)	62
Tablo 65. Qertafên Halê (Hîtîti)	63
Tablo 66. Kêşana Navan (Hîtîti)	64
Tablo 67. Kêşana Navan (Hîtîti)	64
Tablo 68. Kêşana Navan (Hîtîti)	65
Tablo 69. Kêşana Navan (Hîtîti)	65
Tablo 70. Qertafên Halê (Kurmancî)	66
Tablo 71. Kêşana Navan (Kurmancî)	67
Tablo 72. Cihnavên Kesane yên Serbixwe (Hîtîti)	70
Tablo 73. Cihnavên Kesane- Enklîtîk-Datîf û Akkusatîf (Hîtîti)	72
Tablo 74. Cihnavên Kesane -Enklîtîk Kesê 3. -Nomînatîf û Akkusatîf (Hîtîti)	73
Tablo 75. Cihnavên Vegerok (Hîtîti)	74
Tablo 76. Cihnavên Xwedîtiyê yên Enklîtîk (Hîtîti)	75
Tablo 77. Kêşana Cihnavên Şanîdanê (Hîtîti)	77
Tablo 78. Cihnavên nediyar kuîskî, kuîtkî û kuîssa (Hîtîti)	79
Tablo 79. Cihnavên nediyar t/dama(î) û /dapî(ya)	79
Tablo 80. Cihnavên Pirsîyariyê kuî û kue (Hîtîti)	80
Tablo 81. Cihnavên Kesane (Kurmancî)	82
Tablo 82. Qertafên dema Niha (Hîtîti)	109
Tablo 83. Kişandina Dema Niha (Hîtîti)	109
Tablo 84. Qertafên Dema Borî (Hîtîti)	111
Tablo 85. Kişandina Dema Borî (Hîtîti)	111
Tablo 86. Qertafên Raweya Fermanî (Hîtîti)	112
Tablo 87. Kişandina Raweya Fermanî (Hîtîti)	113

TERMÎNOLOJÎ

Bi rastî di pêvajoya tezê de ji aliyê termînolojî ve me hinek zehmetî kişandin, lê heta ji me hat me termînolojî diyar û zelal kir. Di termînolojiya zimanê hîtî de hinek pirsgirêk û niqaş hebûn.

Kesê zimanê hîtî çareser kiribû bi eslê xwe ji Çêkê bû, li gorî alfabeya Çêkê tîpa /š/ tê hemberî tîpa /ş/yê, hattuşa (hattuşa). Lê di lêkolînên dawî de hate fêhmkirin di hîtî de tîpa ku wek /š=ş/yê dihatin xwendin, ev tîp wek /s/yê tê xwendin. Ji ber wê me jî di tezê de ne wek tîpa /š=ş/yê, wek tîpa /s/yê tercih kir. Termînolojiya pêşî *Haššu* (*Haşşu*), *Hattuša* (*Hattuşa*); termînolojiya niha *Hassu*, *Hattusa*.

Di termînolojiya hîtî de hinek tîp bi vî awahî tên bikaranîn. " ħ, š, ū, ī" ji bo alozî çênebe, me di şûna wan de " h, s, w, y" nivîsand.

Di termînolojiya zimanên kevn de peyvên hîtî li ku dera hevokê bîn nivîsandin biçûk û îtalîk, yên somerî li ku dera hevokê bîn nivîsandin mezin tên nivîsandin. Her wiha di navbera peyvên somerî yên hevedudanî de jî xal tên nivîsandin. Peyvên akadî jî di nav hevokan de mezin û îtalîk tên nivîsandin. Her wiha ji bo wan zimanan rêzikên rastnivîsînê jî nehatine bikaranîn. Ji bo mijar zelal bibe em ê mînakê ji pirtûka Elisabeth Rieken bi navê "Einführung in die hethitische sprache und schrift"(Destpêka Ziman û Nivîsandina Hîtî) bidin.

Mînak:

Rûpel 194.

nuza ABUYA kuwapî DINGIR ^{LIM}-*îs kîsat*

Hît. akd. hît. som. hît.

"dema ku bavê min b û yeزدan"ango (dema bavê min mir)

PÊŞGOTIN

Armanca vê xebatê, ji aliyê rêzimanî ve muqayesekirina zimanê hîtîfî û kurdî (kurmancî) ye. Mîna kurdî, zimanê hîtîfî jî ji malbata zimanê Hînd-Ewropî ye. Taybetbûna vê xebatê jî ew e ku heya roja me ti xebat li ser vê mijarê nehatine kirin.

Di serî de spasiyên xwe pêşkêşî şêwirmendê xwe cenabê Prof. Dr. Vechi Sönmez dikim. Di pêvajoya tezê de her tim bi sebir ez guhdarî dikirim û alîkarî û piştgiriya xwe jî ji min teksîr nedikir. Her wiha ji serokê beşa Îranîstîk Mamoste Prof. Dr. Ludwig Paul re jî spas dikim. Dema ku min teza xwe li Zanîngeha Hamburgê beşa Îranîstîkê dinivîsand, her tim deriyê xwe li min vedikir û fikr û ramanên xwe ên hêja bi min re parve dikir. Ji bilî van, ji bo alîkariya wî, ji hevalê xwe Mehmet Emin Aslan re jî spas dikim. Her wiha di pêvajoya teza min de kesên rasterast yan jî nerasterast alîkarî dane min, ez ji dil spasiya wan dikim.

Süleyman Yıldırım

8/8/2019 / Hamburg

DESTPÊK

Dîroka Hitîtiyan

Ji ber ku Anatolya di navbera du parzemînan de bû, taybetmendiyê wê hebû. Bi taybetî jî ji aliyê madenan ve bi derfet û dewlemend bû. Li Anatolya, ji destpêka qonaxên Rojhilata Navîn heya rojam me dîroka mirovahiyê bi pêş ketiye, ji vê jî çandeke berfireh derketiye holê.¹ Anatolya, mîna pireke di navbera Asya û Ewropayê de jî tê nasîn û bi hezar salan bûye cihê hevnasîna çandên cuda.² Li Anatolyayê, b.z. di sedsalên 19-18an de koloniyên bazirganiyê yê Asûran hebûn. Bazirganiyên Asûran di ferqa vê dewlemendbûna Anatolyayê de bûn, wan li wir firoşgehên bazirganiyê (karum) û şûbeyên (wabartum) wan vekirin.³

Bazirganiyên Asûra, ji bo karibin rihet bazirganiyê bikin pêdivî bû bi rayedarên Anatolyayê re peyman çêkiribana. Her du aliyan jî, di van peymanan de merc û daxwaziyan xwe derdixistine pêş û li hev dikirin. Ev peyman him bi saziyên fermî re û him jî bi yên nefermî re dihatine çêkirin. Peymanên dîplomatîk ên ku di nav saziyan de çêdibûn; bi tenê peymanên siyasî, zagonî û aborî bûn. Peymanên ku di nav gel û bazirganên de çêdibûn, danûstandin, zewac û tiştên cuda yên çandî bûn. Peymanên dîplomatîk ên di navbera bazirgan û rayedaran de çêdibûn ji ber ku bazirganên Asûran bi tena serê xwe nikaribûn van peymanan çêbikin; ev peyman bi rêya rayedarên Xaniyê Karuman û qasidekî ku ji dewleta wan dihat, ev peyman dihatin çêkirin.⁴ Karum û Wabartum li gelek cihan hebûn, ji wan ên herî girîng ev in: Kaneş, Hattusas, Purushattum, Kussara û Zalpa.⁵

Navenda van koloniyên Kaneş/Kûltepe bû.⁶ Li Kaneşê di arşivên Asûran de

¹Tahsin Özgüç, "Hititler'in Türkiye Kültür Mirası İçindeki Yeri" Hititler ve Hitit İmparatorluğu Bin Tanırlı Halk/Die Hethiter und Ihr Reich Das Volk Der 1000 Götter, amd. Wenzel Jacob (Bonn: Kunst und Ausstellungshalle der Bundesrepublik Deutschland, 2002), r. 386-7.

² Gernot Wilhem, "Bati ve Doğu Arasında Anadolu", h.g., r. 388-9.

³ Isabelle-Klock-Fontanille, *Hititler*, Wer. Nuriye Yiğitler, Dost Yayınevi, Ankara, 2005, r. 14.

⁴ Hatice Gül Küçükbezi, *M.Ö.2. Bin Yılın İlk Çeyreğinde (Assur Ticaret Kolonileri Çağı'nda) Orta Anadolu'nun Sosyoekonomik Yapısı*, Teza Doktorayê ya çapnebûyî, Selçuk Üniversitesi, Konya, 2010, r. 110-1.

⁵ Klock-Fontanille, b.n., r. 14.

⁶ Hüseyin Sever, "Kultepe Tabletlerinin Anadolu Tarihi ve Kültür Tarihi Bakımından Önemi", 1991, r. 248. dergiler.ankara.edu.tr/dergiler/26/1254/14402.pdf. (5.1.2016.)

navên bînkîyên kesan pîranî bi zîmanê hîtîtî bû, hin caran jî bi zîmanê luwî bû.⁷ Li Kaneş/Kûltepeyê, b.z. di hezarsalên IIan de agahiyên pêşî yên li ser Hîtîtiyan, cara yekem li Kaneş/Kûltepeyê di tabletên Asûran de têne xuyakirin.⁸

Li ser Hîtîtiyan hê jî niqaş hene; gelo ew bînkîyên Anatolyayê ne, an jî ji devereke din hatine Anatolyayê, ger ji devereke din hatibin ji kîjan rêyan ve hatine Anatolyayê? Li ser vê hinek hîpotez hene, yek ji wan ev e: Li ser Qefqasan ve riya ku tê rojhilat û rojava an jî riya ku ji ser Trakya û Çanakkaleyê ve tê.⁹

Li gorî Hîtîtolog Albrecht Götze, ew jî mîna gelên Hînd-Ewropayê ji rojava, di ser tengavan re derbasbûne Anatolyayê. Li gorî Hîtîtolog Ferdinand Sommer jî li ser Qefqasan ve hatine Anatolyayê, pêşî li Kizilirmakê (Çemê Sor) mayîne û pişt re çûne Yeşilirmakê (Çemê Kesk). Arkeolog Leonard Wolley jî dibêje, berî bêne Anatolyayê, pêşî li Mezopotamyayê jiyane. Li gorî Hîtîtolog Ali Dinçol jî, li ser Deryaya Reş a Navîn re hatine Kayseriyê.¹⁰ Berî qewmê Hîtîtiyan bêne Anatolyaya Navîn, evder di destê Hattîyan de bû. Zîmanê Hattîyan cuda bû, nedişibiha zîmanê Hînd-Ewropî û Samîyan jî. Hîtîtiyan axa wan dagir kirin. Ew kirin bin hikmê xwe de, demeke dirêj bi wan re jiyîyan û gelek Yezdan, ayîn û efsaneyên wan ji xwe re pejirandin.¹¹ Li gorî metnên nivîsên mixî, Hîtîtiyan ji welatê xwe re digotin welatê Hattî. Ev navlêkerina welatê Hattî, berî Hîtîtî bêne Anatolyayê jî bi vî awayî bû. Piştî Hîtîtî hatin Anatolyayê jî, navê vî welatî neguhartin. Di metnên mixî de Hîtîtiyan digotîne xwe zîlamê Hattî, gelên welatê Hattî, zarok û zêcên welatê Hattî. Qralên Hîtîtiyan jî xwe wek Qralê Mezin yê welatê Hattî binav dikirin.¹²

Qraliyata Hîtîtiyan b.z. destpêka sedsala 17an de, ango di serdema bronzê de, ji Anatolyayê heta Rojavayê Mezopotamyayê û Bakurê Sûriyê împaratoriyeke ava kirin. Paytexta wan a rêveberî û dînî hertim Hattutas bû. Ji aliyê xanedaneke bêqisûr ve hatibû birêvebirin.¹³ Kronolojiya Qralên Hîtîtiyan wiha ye:

⁷ Klock-Fontanille, b.n., r. 12-3.

⁸ Stefano De Martino, *Hititler*, Wer. Erendiz Özbayoğlu, Dost Yayınevi, Ankara, 2003, r. 32-3.

⁹ De Martino, h.b., r. 33.

¹⁰ M.Beste Yeşiltepe, *Hitit Çiviyazılı Metinlerin okunmasında Uzman Sistem Uygulama Örnekleri*, Teza Masterê ya çapnebûyî, Başkent Üniversitesi, Ankara, 2015, r. 6.

¹¹ Klock-Fontanille, b.n., r. 11.

¹² İlker Koç (ed.), *Hititler*, Odtü Geliştirme Vakfı Yayıncılık, Ankara, 2006, r. 6.

¹³ Trevor Bryce, *Hitit Dünyasında Yaşam ve Toplum*, Wer. Müfit Günay, Dost Yayınevi, Ankara, 2003, r. 24.

Tablo 1. Krolonojiya Qralên Hîtîtiyan¹⁴

SERDEMA DESTPÊKÊ			
Navên Qralan	Dîrok (b.z)	Malbatî	
Pîthana	di serê salên 1800î de qralê Kussara		
Anîtta	di nivê salên 1800î de qralê Kussara	lawê Pîthana	
SERDEMA QRALTIYA KEVN			
I. Labarna	1680-1650 (qralê Hîtîtiyan yê yekem)		
II. Labarna/ I. Hattusîlî	1680-1620	xwarziyê I. Labarna, zirkur	
I. Mursîlî	1620-1590 (dagirkiriya Babilê b.z. 1594)	neviyê I. Hattusîlî, zirkur	
I. Hantîlî	1590-1560	bûrayê I. Mursîlî	
I. Zîdanta	1560-1525	zavayê I. Hantîlî	
Ammuna		lawê I. Zîdanta	
I. Huzziya		birayê bûka Ammuna	
Telîpinu	1525-1500	bûrayê I. Huzziya	
Alluwamna	1500-1400	zavayê Telîpinu	
Tahurvaîlî		(nediyar)	
II. Hantîlî		lawê Alluwamna	
II. Zîdanta		lawê II. Hantîlî	
II. Huzziya		lawê II. Zîdanta	
I. Muwatallî		(nediyar)	
SERDEMA QRALTIYA NÛ/ÎMPARATORÎ			
I./II. Tuthaliya		1400-1360	neviyê II. Huzziya
I. Arnuwanda	zavayê I./II. Tuthaliya, zirkur		
II. Hattusîlî	lawê I. Arnuwanda		
III. Tuthaliya	1360-1344	lawê II. Hattusîlî	
I. Suppîlulûma	1344-1322	lawê III. Tuthaliya	
II. Arnuwanda	1322-1321	lawê I. suppîlulûma	
II. Mursîlî	1321-1295	birayê II. Arnuwanda	
II. Muwatallî	1295-1272 (Şerê Kadeş 1274)	lawê II. Mursîlî	
Urhî-Teşup/III. Mursîlî	1272-1267	lawê II. Muwatallî	
III. Hattusîlî	1267-1237 (Peymana Kadeş bi Misrê re)	lawê II. Mursîlî	
IV. Tuthaliya	1237-1228	lawê III. Hattusîlî	
Kurunta	1228-1227	kurapê IV. Tuthaliya	
IV. Tuthaliya (cara duyem)	1227-1209	kurapê Kurunta	
III. Arnuwanda	1209-1207	lawê IV. Tuthaliya	
II. Suppîlulûma	1207-?	birayê III. Arnuwanda	

¹⁴ Koç, b.n., r. 14-5.

Li gorî vê tabloyê, navên qralên Hîtîtiyan piranî bi paşqertafa *-îli* û *-a'yê* dawîbûne. Şêwaza rêveberiya Hîtîtiyan teokratik- monarşi bû. Qraltî ji bav derbasî kur dibû, lê dema ku em li tabloyê dinêrin hinek ji wan navan ne kurên qralan ne. Li gorî şêwaza rêveberiya hîtîtiyan nakokiyek heye. Belkî kurên hinek qralan nebûn ji ber wê bûra, zava û kuram bûne qral an jî wan kesan bi derbe bûne qral.

Hinek qralên Hîtîtiyan him navê Hîtîti him jî navê Hurri bi hev re bi kar anîne.
Mînak: Urhî-Teşup (navê hurri)- III. Mursîli (navê hîtîti)

Belkî du navlêkirin mode bû jî, navlêkirina navên hurri belkî siyasî bû jî, ji bo dewleta Hîtîtiyan bandoreke siyasî li ser dewleta Hurriyan bike. Hinek qralên Hîtîtiyan bi qraliçeyên Hurriyan re dizewicîn. Dibe, wan qraliçeyan ji bilî navên hîtîti navên hurri jî li zarokên xwe kiribin.

Di serdemên berê de, li gelek herêman, mirovan ne ji Yezdanekî bi tenê bawer kirine, ji gelek Yezdanan bawer kirine. Hîtîti ji aliyê dînî ve netewekî dîndar bû. Ji ber wê jî ji Yezdanên netewên din jî bawer kirine û wek Yezdanên xwe dîtine. Piranî jî din bin bandora dînê Hurriyan de mayine û dîn û Yezdanên wan pîroz dîtine. Yezdanên wan wek Yezdanên xwe dîtine. Belkî ji bo pîrozahiya dîn û Yezdanên wan, Hîtîtiyan navên hurri li zarokên xwe kirine.

Di metnên mixî yên Hîtîtiyan de peyvên ku qralan didin nasîn bi vî awayî ne: Bi hîtîti *hassu*, t/labarna " qral" somerî jî peyva qral bi vî awayî dihat bikaranîn. LUGAL, LUGAL.GAL, ^DUTU^{SI}, LUGAL"Qral" LUGAL.GAL" Qralê Mezin" cudabûna di navbera wan herdu peyvan de ev e: LUGAL ji bo qralê bajarên ne girîng, LUGAL GAL jî, ji bo bajarên girîng mîna qralê mezin yê serbajarê Hattutas di hate gotin.¹⁵ Herwiha di akadî de jî wateya qral *ŞARRU* ye, peyva ^DUTU^{SI} di akadî ^dŞAMŞÎ û di hîtîti de ^dÎstanu ye. Di her sê zimanan de wek " navnasê qral û qralê rojê" di hate zanîn.¹⁶ Qralên Hîtîtiyan ji aliye leşkeriyê ve hê di piçûkahiya xwe de perwerdehiyeke baş didîtin. Dema ku seferên leşkerî çêdibûn qral bi artêşê re diçû seferan¹⁷ Berpirsiyariyên qral ev in: Wekîlê Yezdanan, serekrahîp, serfermandar, serdadger û

¹⁵ Klock-Fontanille, b.n., r. 76-7.

¹⁶ Johannes Friedrich, Hethitisches Wörterbuch: *Kurzgefasste Kritische Sammlung der Deutungen Hethitisches Wörter*, Verlag Carl Winter, Heidelberg, 1952, r. 312-3.

¹⁷ Koç, b.n., r. 73.

rêveberê giştî bû.¹⁸Ji ber ku qralên Hîtîtiyan xwediyê ewqas peywîr û wezîfeyanbûn, xwe deyndarê Yezdanan didîtin û bi saya Yezdanan xwe bi hêz û şîyan didîtin. Ji ber wê, ew diparastin û ji wan re qurban serjê dikirin.¹⁹ Ew têkiliya di navbera wan de bi riya dînî çêdibû, qral wek serkeşayê mezin serokatiya hinek merasîman dikir.²⁰Di van merasîman de *tawananna* (qralîçê) jî bi qral re merasîm pêşkêş dikirin û carna jî bi tenê merasîm pêşkêş dikirin. Peywirên qralîçeyê ên din jî ev in: Dema qral diçû seferên şer bi qral re bû. Dema qralîçe wekîltiya qral dikir, hikimraniyên wî bikar dihanîn. Ji bilî mohra ku bi qral re bikar dihanî, mohra wê bixwe jî hebû. Ew mohr nîşana serbixwebûna wê bû. Dema qral wefat dikir, merasîmên jê re dihatin kirin; jî bo qralîçeyê jî dihatin kirin. Li vir jî diyar e, di hiyerarşîya polîtîk de çiqas girîngbûna wê heye.²¹

Ji bilî birêveberiya qral û qralîçeyê rêxistinek jî hebû *panku* (meclîs) tê wateya civat, grûp û komîte. Ev meclîs ji asîlzadeyan pêk dihat. Meclîs, pirsgirêkên welêt bi qral re mûzekere dikirin. Dema qral bixwesta tayînkirin û îdamkirina presekî bikira; ewilî diviya wî, ev yek pêşkêşî meclîsê bikira û meclîsê ev daxwaz tesdîq kiribûya. Ev rewş otorîteya qral sînordar dikir. Lê dema Hîtîtiyan dawî de qral hemû desthilatdarî û hikimranî xistin destê xwe de.²² Pişt re pirsgirêkên Qraliyeta Hîtîtiyan destpê kirine. Ev pirsgirêk him yê navxweyî û him jî yê dervayî bûn. Pirsgirêkên navxweyî ev bûn: krîza aboriyê, nexweşiyên şewbê, kêmbûna nifûsê,²³ bêbaranî û zuwayî, rola qralên herêmî, pirneteweyî; pirsgirêkên dervayî jî ev bûn: her tim êrîşkirina dijminan û êrîşkirina qewmên behrê.²⁴ Ji ber van sedeman împaratoriya Hîtîtiyan di sedsala 12an de hate hilweşandin.²⁵

Dîroka Kurdan

Di hezarsala b.z. 3an de Somer û Babîlan, hin agahiyên ku bi hevdu re nabin

¹⁸ Bryce, b.n., r. 44.

¹⁹ De Martino, b.n., r. 77.

²⁰ Klock-Fontanille, b.n., r. 56.

²¹ Klock-Fontanille, h.b., r. 81-2.

²² Tuğçem Tirfil, Hititler'in Devlet Yönetimi ve Dini, r.3. [www.academia.edu/33370112/HİTİTLERİN DEVLET YÖNETİMİ VE DİNİ\(5.2.2019\)](http://www.academia.edu/33370112/HİTİTLERİN DEVLET YÖNETİMİ VE DİNİ(5.2.2019))

²³ De Martino, b.n., r. 74.

²⁴ Berkay Necati Tanrısever, Hitit İmparatorluğu'nun Yıkılışı, 2017, r.2, [www.academia.edu/33180907/Hitit_İmparatorluğunun_Yıkılışı_\(5.2.2019\)](http://www.academia.edu/33180907/Hitit_İmparatorluğunun_Yıkılışı_(5.2.2019))

²⁵ De Martino, b.n., r. 74.

nakokî hiştine. Li gorî wan agahiyan li navend û bakurê Çiyayê Zaxrosê miletek bi navê Gutî an Qurtî dijiya. Ji bo navê dewleta wan jî Gutîum dihate gotin.²⁶ Li ser peyva Kutî/Kurtî û Qutî/Qurtî, ji aliyê qralê Asûr Tukulîtî ve du nivîs hatine dîtin. Ev herdu nivîs li ser heman meseleyê ne; di nivîsa yekem de navê " Kurtî" û di ya duyem de jî navê " Gutî" hatiye nivîsandin. Li gorî wan nivîsan " Kurtî û Gutî" navê miletekî nîşan dide. Kurtî an jî Gutî navê şaxeke mezin a Gutiya ye.²⁷ Rojhilatnas G.R. Driver di pirtûka xwe ya bi navê " Tarîxa Kurd û Kurdistanê" de dibêje " Gutî û Karda" bapîrên Kurdan e. Rojhilatnas Dr. Rays jî di wî fikrî de bû.²⁸ Driver, listeya ku ji metnan derxistibû; rastî navên Kurdan wek Kurtî, Karda, Karduk, Gord, Kardekes û Kyrtii hatibû. Her çiqas paşqertafên wan di zimanan de cuda hatibe nivîsandin jî koka wan hemûya krd/krt ye.²⁹

Dîroknasê Ermenî Arshak Safrastiyani dibêje peyvên " Kurtî, Gurtî, Kurtî" yek peyv in, sedama wê jî wisa îzah dike: Di zimanên Hînd-Ewropî de dema tîpa " r" piştî tîpa " u" yê tê, tîpa " r" tê avêtin.³⁰ Ereban jî navê Kurdan wek îro " Kurd/Kurdî" binav dikirin, lê piraniya wan ji Kurdan re " Ekrad" digotin.³¹

Kurd, miletekî herî kevnare yê herêma Mezopotamyayê ne. Ev herêma ji ber ku li ser rêyên bazirganiyê bû, cihekî girîng e. Li ser van riyên bazirganiyê şaristanî hatine avakirin.³²

Dîna Kurdan beriya îslamiyetê, zerdeştî bû. Ev dîn ji aliyê Zerdeşt pêxember ve b.z di navbera salên 660-583an de hatiye belavkirin.³³ Baweriyên Kurdan yê dîn îslamtî, êzidîtî, yaresantî, elewîtî, mûsewîtî û xiristiyantî ye.³⁴

Kurd, li Tirkî, Sûrî, Iraq û Îranê, Qefqasan (Ermenistan, Gurcistan û

²⁶ Egon von Eickstedt, İlk Çağlardan Günümüze: Türkler Kürtler İranlılar, Wer. Haydar Işık, Pêrî Yayınları, İstanbul, 2010. r. 57.

²⁷ Mihemed Emîn Zekî Beg, Dîroka Kurd û Kurdistanê, Weş. Avesta, Stenbol, 2012, r. 60.

²⁸ Cemşid Bender, Kürt Tarihi ve Uygarlığı, Weş. Kaynak, İstanbul, 2000, r. 45.

²⁹ Hasan Baraçkılıç, Kürdistan Uygarlığı: Tarihin Başlangıcı Uygarlığın Beşiği Medeniyetin Temelleri, Weş. Do, İstanbul, 2011, r. 200.

³⁰ Sozdar Midî (E. Xelîl), Tirêjên Çarşembê Xelek – 21: Peydabûna navê Kurd di kûraniya dîrokê da, Wer. Mustafa Reşîd, www.amidakurd.org/pel/Xelek-21-kurdi.pdf. (11.6.2019)

³¹ Kemal Burkay, Kürtler ve Kürdistan: Coğrafya-Tarih-Edebiyat, Weş. Deng, 2008/çapa 4' mîn, Diyarbakır, r. 47.

³² [https://ku.wikipedia.org/wiki/Dîroka_kurd_û_Kurdistanê\(24.6.2019\)](https://ku.wikipedia.org/wiki/Dîroka_kurd_û_Kurdistanê(24.6.2019))

³³ https://ku.wikipedia.org/wiki/Dînên_kurdan. (24.6.2019)

³⁴ www.bitlisname.com/2015/12/09/kurtlerin-inanclari-ve-kimlik/.(24.6.2019)

Azerbeycan), Rûsya, Tirkmenistan, Qazaxistan, Ozbekistan, Ewropa, Amerîka û li gelek dewletên din ên Rojhilata Navîn dewletên wek Îsraîl, Libnan û hwd. jî dijin.³⁵

Prof. Dr. Kadri Yıldırım di pirtûka a bi navê " Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Kurmanci Lehçesi" de li gorî welatan nifûsa Kurdan wiha nivîsandiye.

Kürdên Tirkî : 11.380.000

Kurdên Iraqê : 4.980.000

Kurdên Îranê : 8. 838.000

Kurdên Sûrî : 1.270.000

Kurdên Ermenistan : 600.00

Kurdên Libnan : 130.000

Kurdên Misrê : 20.000

Kurdên Gurcistan : 341.000

Kurdên Azerbeycan : 139.000

Kurdên Qirxizistan : 170.000

Kurdên Qazaxistan : 273.000

Kurdên Efxanistan : 267.000

Kurdên Pakistan : 35.000

³⁵ <https://ku.wikipedia.org/wiki/Kurd>. (24.6.2019)

1. ZIMAN, DENGZANÎ, PEYVSAZÎ


1.1. Ziman

Ziman, amûra ragihandina navbera mirova ye. Ev ragihandin bi alîkariya dergûş û nasnameya mirova ye. Ji ber vê di navbera ziman û nasnameyê de têkiliyek heye. Di encama vê de jî qewm û netewan ji hevdu cuda dike.³⁶ Ziman hebûneke zindî ye. Li gorî qaîdeyên xwe diçe û bi pêş ve diçe, neteweyekî li hev dicivîne, diparêze û hevpariyêke civakî ya wî netewî derdixîne holê. Ew saziyêke civakî ye ya bi pêşketina bi sedsalan ve derketiyê holê.³⁷

Ji aliyê SIL a Navneteweyî ve hatiye belgekirin, li dinyayê tevî zaravayan nêzî 7000 ziman, di bin 100 malbatê zimanî bêhtir de hatine tesnîf kirin.³⁸

1.1.1. Ji Aliyê Binyadê Ve Malbatên Zimanan

Tablo 2. Malbatên Zimanan



³⁶ Samî Tan, Rêzimana Kurmancî, Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê çapa berfirehkirî, Îstanbul, 2011, r. 21.

³⁷ <https://tr.wikipedia.org/wiki/Dil> (7. 01. 2016).

³⁸ Metin Alparslan, Hititolojiye Giriş, Weş. Türk Eskiçağ Bilimleri Enstitüsü, İstanbul, 2009, r. 43.

³⁹ Alparslan, h.b., r. 47.

⁴⁰ Tan, b.n., r. 17.

1.1.2. Zimanê Hîtîtî

Zimanê hîtîtî, zimanekî herî kevn ê Hînd-Ewropayî ye û di nav Koma Zimanên Anatolyayê de cih digire. Malbatên vê komê yê hevdem jî zimanên lûwî û palayî û yê din jî b.z. hezarsala I'ê de jî wek zimanê lîkya, lîdya û karya ye.⁴¹

Li ser koka Hîtîtiyan çavkaniyeke din jî morfolojiya navên şexsan e. Ji vir jî diyar e, zimanê hîtîtî ji malbata zimanê Hînd-Ewropî ye. Herwiha hinek peyv jî nêzî hev in, peyva avê di Hîtîtî de " *water* " di almanî de " *wasser* "; peyva heft di hîtîtî de " *siptam* " , di almanî de " *sieben*" hwd.

Malbata zimanê Hînd-Ewropî dibe ji bakurê Deryaya Reş belav bûbe, Rojavayê Ewropayê û heta bi herêma Hîndistanê jî. Dibe, bapîrên Hîtîtiyan di dewrên kevin de koç kiribine Anatolyayê. Di wan dewran de, zimanê hîtîtî, li bajarê Nesa û Hattusayê hatibe axaftin. Li bakurê rojavayê wê zimanê palayî, li başûrê wê zimanê lûwî dihate axaftin. Li rojavayê wê jî zimanê lîdyayî dihate axaftin, ew ziman b.z. di hezarsala I'ê de li rojhilatê Îzmîrê dewam kir. Zimanê hîtîtî, berî wan zimanan hatiye veqetandin û di demeke dirêj de jî îzolê maye. Ji Rojavayê Anatolyayê jî koknasiya luwiya kevin, zimanê lîdyayî û palayî hatiye hilberandin. Pişt re ev ziman di bin bandora hev de mane. Ji ber vê jî dara malbatîya van nayê dayîn. Di nav van zimanan de jî cara pêşî, zimanê lîkyayî ji luwiya kevin hatiye veqetandin. Zimanê likyayî li Rojavayê Antalyayê dihate axaftin, ji ber ku derdora wê bi çiyayan hatibû dorpeçkirin, zêde pêş neketibû. Di b.z. hezarsala IIan de luwiya mixî û ya hiyeroglîf, di b.z. hezarsala I'ê de jî di nav zimanê lûwî de zimanê sîdeyî, zimanê pîsîdî û zimanê karyayî dihate axaftin. Di b.z. hezarsala 18an de hîtîtî û lûwî ji hevdu hatine veqetandin. Ev veqetandin, bi rêya navên kesên taybetî yê di tabletên Asûran de derbas dibin jî diyar e. Dema yek cudahiya wan û pêşveçûyîna zimanên kevin yê din û muqayesekirina wan dinêre. Di navbera wan û zimanên din de yê ku b.z. hezarsala 18an de hatine axaftin, ewqas cudabûn nîn e û di navbera qonaxa zimanên Anatolyayê de herî kêr 500 sal heye. Naxwe li gorî vê rewşê dibe, zimanên Anatolyayê yê herî kevin di b.z. nêzî hezarsala 23an de hatibe axaftin.

⁴¹ Alparslan, b.n., r. 14-5.

Dema ku ew ziman bi zimanên Hînd-Ewropî re têne muqayesekirin, zimanên Anatolyayê bêhtir nêzî hev in. Li gorî vê yekê zimanên Anatolyayê cara pêşî li herêma Anatolyayê ji hev dûr ketine. Dibe, Hînd-Ewropayî di b.z. nêzî hezarsala 23an de koçberî Anatolyayê bûbin.⁴² Hinek taybetiyên zimanê hîtîtî jî wiha ne:

Taybetiyeke zimanê hîtîtî heye, lê ev taybetî di zimanên Hînd-Ewropî de nîn e. Di hîtîtî de du zayend mewcûd in. Bi gotineke din zayenda hevparî (genus commune) û bêzayend (genus neutrum). Jixwe di demên pêşî de zayendên mê û nêr, heta cihnav jî pirr dişibiyên hev, ji hevdu nedihatî kifşkirin. Piştî ev ferqa piçûk ji holê rabû, zayenda hevparî derkete holê. Bêzayendî jî di tabletên nivîskî de tê fêhmekirin ku ew jî wek pêşî pir nehatiye bikaranîn.⁴³ Her çiqasî jineke Hîtîtî ne xwedî zayendibane jî dîsa bi alîkariya hinek qertafên zayenda mê dihatî çêkirin. Ew qertaf jî ev in: /wiya/ û /sara/.

Mînak:

Tunnawiya → Navê mê


Hassu → Qral, *Hassusara* → Qraliçê

Îsha → Beg, *Îshasara* → Xatûn⁴⁴

Suppî → Paqij, *Suppîsara* → keçîka nezewicî/bakîre⁴⁵

Hîtîtiyan, ji bo zayendê diyar bikin; determînatîf (nîşan) jî bi kar dianîn. Determînatîf di hate pêşî û paşîya peyvê, derbarê peyvê de agahî dida.

Mînak:

Dema determînatîf bihatiba pêşîya navên mêran an jî yê jinan bi vî awayî çêdibû: Ev nîşana mixî a berwarî () navê şexsê mêran (maskulîn =m) diyar dike.



^m Ha - at - tu - sî - lî (^mHattusîlî)

⁴² Nobert Oettinger, " Hint Avrupa Dilleri Grubuna Ait Dilleri Konuşanlar Anadolu'da MÖ 3. Binyıldan Bu Yana Yaşıyorlardı : Anadolu dillerin Oluşumu " g.n. 407-9.

⁴³ Ali Dinçol, Eski Anadolu Dillerine Giriş, İstanbul Üniversitesi Edebiyat Fakültesi Yayınları, İstanbul, 1970, r. 65-6.

⁴⁴ Paola Cotticelli Kurras, Grammatica ittita, r. 23, <http://www.dfil.univr.it/documenti/OccorrenzaIns/matdid/matdid932431.pdf> (19.05.2018)

⁴⁵ Ahmet Ünal, Linguae Hethiticae Grammatica/Hititçe Dilbilgisi: Çivi Yazısı İşaret Listesi ve Çok Sayıda Okuma Parçalarıyla Birlikte, Weş.Bilgin Kültür Sanat Yayınları, Ankara, 2019, r. 119.

Eger ji du goşe çengel û berwariyekê (𐎠𐎢𐎡𐎹 = sal= jin) hatibe pêkhatin, ev determînatîf navê şexsê jinan (femînum= f) diyar dike.




^f Ís - ta - pa - rî - îa(ya) ^f îstaparîa/ya)⁴⁶

Ji bilî van, di metnên mixî de determînatîfa bajar, welat, pîşê, çem, kanî, yezdan, çiya, xanî, qap, çûk, rîwek û navên nebatî jî dihatin bikaranîn.

Mînak:

Determînatîfa bajar û çiya , BAJAR/URU (𐎠𐎢𐎡𐎹) û ya ÇIYA/HUR. SAG (𐎠𐎢𐎡𐎹)) dema bê pêşiya peyvekê tê fêhmkirin ku ev peyv, bajar û çiyayek e.

Mînak:



^{URU}Ha- at - tu - sa (Bajarê Hattusa) ^{HUR.SAG}Ha- az -zî (Çiyayê Hazzî)⁴⁷

Taybetmendiyeke hîtîti din jî bi dubarekirina kîteyan dariştina peyvan dihatin çêkirin.

Mînak:

mal " hêrandin," memal " ard "

tîtîta " pîpik, bîbika çav "

duddumî " kerr"

Herwiha di hîtîti de ji bo ku wate bê perçînkirin dubarekirina bêgihanek pir dihate bikaranîn.

Mînak:

*annas attas: dê bav, hassa hanzassa: nişên bên*⁴⁸

⁴⁶ Koç, b.n., r. 19-20.

⁴⁷ Koç, h.b., r. 21.

⁴⁸ Ünal, b.n., r. 127-8

Di hîtîti de him gihanekên serbixwe him jî gihanekên enklîtîk hebûn. *nu*, *ta*, *sa* û *su* yê serbixwe ne, a enklîtîk jî gihaneka *a/ya* ye, ev gihanek li gorî deman tèn guhertin di nav van de a ku pir dihate bikaranîn gihanekê *nu* 'yê ye, di hemû deman de hatiye bikaranîn. Angaşteke wisa heye; gihaneka *ta* ji bo dema niha, gihaneka *sa* dema borî, *nu* jî ji bo herdu deman hatiye bikaranîn. Dengdêra *u*'ya gihaneka *nu* û *su* 'yê asîmileyê dengdêra *a/e* yê dibin.

Mînak:

nu-an → *na-an*: û wî/ê (sg)

su-as → *sa-as*: û ew (sg)

nu-e → *ne-e*: û ew (pl) ⁴⁹

Çareserkirina Zimanê Hîtîti

Di sala 1913an de Saziya Zanisteyên Rojhilata Almanan a li Berlînê, Asûrolog Friedrich Bedrich Hronznyê Çekî, ji bo li ser tabletên Muzexaneyê Arkeolojiya Stenbolê bixebite, ew şandine Stenbolê.⁵⁰ Ji bo ev zimanên li ser tabletan bêne nasîn pêwîst bû. Heke Hronzny binyada vî zimanî bibîne û dê bi vê rêbazê, malbata zimanan bihata dîtin. Berî Hronzny, di sala 1902an de Knudtzon gotibû ev ziman zimanekî Hînd-Ewropî ye. Paşê Knudtzon ew fikr û ramanên xwe berdewam nekiribû. Li gorî vê nêrinê pêwîst bû, Hronzny ji nû ve dest pê kiribûya.⁵¹

Hronzny, hevoka *nu* NINDA-*an ezzateni watar-ma ekutteni* weke sermijar pêk anî. Jixwe berê hatibû zanîn, peyva NINDA tê wateya nan û îdeogrameke Somerî ye.⁵² Bi taybetî îdeogramên Somerî hevok hêsanî dikirin. Tiştê din a bala Hronzny kişandibû jî, guherîna dangan a di nava peyvan û dawîya peyvan de çêdibû. Ger ev guherînên rêzimanî rast bin, wê demê yek dikare bibêje hîtîti hevşibiyê zimanên Hînd-Ewropî. Hronzny ji xwe bawerbû ku vê hevokê berdewam bike. Pêwîst bû, peyva nan bi lêkara xwarinê re bihata gotin. Peyva piştî nan hatibû nivîsandin, peyva *ezzatenî* bala Hronzny kişandibû. Ev peyv tê wateya lêkera xwarinê; bi almanî *essen*, di îngîlîzî de *to eat*, di yunanî de *edein*, di latînî de *edere*, di almaniya kevin de jî *ezzan*; peyva *water* jî di


⁴⁹ Ünal h.b., r. 245.

⁵⁰ Koç, h.b., r. 3.

⁵¹ Alparslan, b.n., r. 75.

⁵² Koç, b.n., r. 3.

Zimanên Hînd-Ewropî de pir dişibiya wateya avê. Ev peyv di almanî de *wasser*, di îngîlîzî de *water*, di zimanê saksonî de *vatar*, bi swêdî *vatten*, bi îzlandî *vatna* ye. Mantiqa nan-xwarinê, divê lêkera av û vexwarinê re jî hatiba şopandin. Lêkara *ekutenî*, a ku di dawîya hevokê de derbas dibe, bi zimanê latînî *aqua* ye û ev jî tê wateya vexwarinê. Li gorî wan agahiyên diyar e ku hîtîtî jî zimanekî Hînd-Ewropî ye. Wergerandina hevoka hîtîtî ya ewilî bi şiklî derdikeve holê.⁵³



“nu NINDA-an ezzateni watar-ma ekutteni: û hûnê xwarinê bixwin, lê avê jî vexwin.”⁵⁴

Agahiyên di derbarê Hîtîtîyan de, cara pêşî di tabletên Asûran de li Kultepeyê derketine holê. Di dema kevn de navê Kultepeyê, Kanîs bû. Evder di çavkaniyên Hîtîtîyan de wek Nesa derbas dibû. Di roja me de, evder bi navê Kultepe tê binavkirin. Pişt re hate fêhmkirin, Hîtîtîyan ji xwe re digotin Nesîlî û ji zimanê xwe re jî digotin zimanê nesa.⁵⁵

Di serî de dema hîtîtî hate çaresekirin, peyva Hîtîtî û Nesa bi hev re dihat bikaranîn. Di Tewratê de peyva Hîtîtî derbas dibû. Hinek zanyaran xwestin peyva Hîtîtî a ku di Tewratê de derbas bûbû sererast bikin. Wan zanyaran ji şûna peyva Hîtîtî ve peyva Nesa tercîh kirin. Lêbelê ji ber ku peyva Hîtîtî cihê xwe girtibû, di roja me de wek peyva Hîtîtî tê zanîn û qebûl kirin.⁵⁶

1.1.3. Zimanê Kurdî

Zimanê kurdî di Malbata Hînd-Ewropî de ji Koma Îranî ye. Di vê komê de jî, di nav zimanên bakurê rojava de ye.⁵⁷ Zimanên weke medî, farisî, belûcî, tatî, talîşî û

⁵³ Alparslan, b.n., r. 75-6.

⁵⁴ arkeokur.tumblr.com/post/.../hititçenin-bir-hint-avrupa-dili-olduğunu-öne (24.10.2016).

⁵⁵ De Martino, b.n., r. 32-5.

⁵⁶ Alparslan, b.n., r. 12.

⁵⁷ Tan, b.n., r. 23.

gîlekî jî di vê komê de cih digirin.⁵⁸ Zimanê kurdî xwediyê çar zaravaya ye.

- 1) Kurmancî (kurmanciya jorin)
- 2) Soranî (kurmanciya jêrîn)
- 3) Kirmanckî (zazakî-dimilî)
- 4) Lorî (lekî-bextiyarî)⁵⁹

Din nav van zaravayan de zaravaya ku herî zêde pê tê axaftin kurmancî ye. Li Tirkî, Iraqê, Sûrî, Îranê, Efxanistan, Îsraîl, Libnan, Amerîka, dewletên Qefqasan û Ewropayê tê axaftin.⁶⁰ Devokên kurmancî ev in: botanî, silivî, mehmedî, badînanî, bayezîdî, hekarî, aşteyî, qafkasî û xorasanî ye.⁶¹ Di nav van devokan de devoka botanî mîna bingeha zaravaya kurmancî hatiye pejirandin. Rêziman û ferheng jî li gorî vê devokê hatine nivîsandin.⁶² Zaravaya kirmanckî jî li Tirkî tê axaftin û ji van devokên pêk tê : amedî, dêrsimî û siwregî, çewlîgî, xarpefî, gumgumî, xerzîkî.⁶³

Zaravaya soranî jî ji aliyê Kurdên Iraq û Îranê ve tê axaftin. Xwediyê van devokên bingehîn in: silêmanî-babanî, mukrî, sineyî-senendejî, germiyanî. Zaravaya lorî jî ji aliyê rojavayê Kurdên Îranê ve tê axaftin. Ev zarava ji van devokan pêk tê: xaneqînî, feylî, kirmanşanî, lekî, kelhurî, perewendî û qulgayeyî.⁶⁴

Di zimanê kurdî de zayend jî xwediyê xusûsiyetekê ye.⁶⁵ Zayend di zaravaya kurmancî de jî cihê girîng digire. Di kurmancî de zayend bi alîkariya qertafên tewang û veqetandekê tê diyarkirin.⁶⁶ Qertafên tewangê: -î (nêr), -ê (mê) (yekjimar)/ -an (pirjimar)⁶⁷; qertafên veqetandekê: -ê (nêr), -a (mê) (yekjimar)/ -ên (pirjimar).⁶⁸

Zimanê kurdî zimanekî pêvekî ye. Peyv qertafên pêşgir û paşgir û him jî

⁵⁸ Kadri Yıldırım, Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Kurmancî Lehçesi, Avesta yayınları, İstanbul, 2013, r. 22.

⁵⁹ Nezîr Ocek, Wanyên Rêzimana Kurmancî, Weş. Sîtav, Stenbol, 2014, r. 16.

⁶⁰ <https://tr.wikipedia.org/wiki/Kürtçe> (29.3.2019)

⁶¹ Aziz Samur, Kurdiya Reziman û Rastnivîsa Kurmancî, Weş. Nûbihar, çapa duyem /2014, b.n., r. 249.

⁶² <https://ku.wikipedia.org/wiki/Gotûbêj:Ziman...>(11.02.2016)

⁶³ Samur (2014), b.n., r. 184.

⁶⁴ www.zazaki.net/haber/kurtcenin-lehce-ve-siveleri-1562.htm(28.02.2016)

⁶⁵ Halil Aktuğ, Gramera Kurdî – Kürtçe Gramer (Kurdî-Tirkî, Kürtçe –Türkçe), Weş. Avesta, Stenbol, 2013, r. 178.

⁶⁶ Ocek, b.n., r. 96.

⁶⁷ Aktuğ, b.n., r. 194.

⁶⁸ Ocek, b.n., r. 81.

qertafên navgir distîne.⁶⁹ Dema peyv van qertafên pêşgir û paşgir distîne di koka wan de ti guhertin çênabe.⁷⁰

Mînak:

Tablo 3. Qertafên Pêşgir û Paşgir (Kurmancî)

Kurmancî			
Qertafa Pêşgir	Peyv	Qertafa Paşgir	Peyv
-ve	girtin	- ar	guh
vegirtin		guhar ⁷¹	

Peyva **girtin** lêker e pêşgira **-ve** sitandiye, peyva **guh** jî nav e pêşgira **-ar** sitandiye. Di koka wan peyvan de ti guhertin çênebûye.

Ji aliyê ziman ve nuqteyên hevbeş:



a) Herdu ziman jî ji Malbata Zimanên Hînd-Ewropayî ne.

Ji aliyê ziman ve nuqteyên cuda:

a) Di Malbata Zimanên Hînd-Ewropî de, hîtîti di Koma Zimanên Anatolyayê de cih digire. Kurdî jî Şaxekî ji Grûba Zimanên Îranî ye. Di vir de jî, di nav Zimanên Bakurê rojava de cih digire.

b) Di zimanê hîtîti de ne diyar e ku zarava û devok hebin. Di zimanê kurdî de çar zarava hene û her zarava jî xwediyê çend devokan e.

c) Di zimanê hîtîti de zayend nîn e. Di şûna wê de zayenda hevparî heye. Di kurdî de zayend di zaraveyên kurmancî û zazakî de cihekî girîng girtiye.

d) Zayend di hîtîti de bi alîkariya determînâtîfan tê çêkirin. Ji bo zayenda nêr nîşana  jî bo zayenda mê jî ev nîşan  tê bikaranîn.

Mînak:

⁶⁹Em Zimanê Kurdî Binasin, tirsik.net/.../enstituya%20kurdi%20-%20stenbol/kurdi%20bi.pdf. (14. 3. 2016).

⁷⁰ Adem Avcıkıran (ed). *Kürtçe Anamnez: Anamneza bi Kurmancî*, Weş. Diyarbakır Tabibler Odası, Diyarbakır, 2009, r. 13. (tirsik.net/danegheh/pirtuk/ismail%20bulbul/ anamneza%20bi%20kurmancî.pdf (14.03.2016).)

⁷¹ Mehmet Sait Çakar ûyd. (2010), Ortaöğretim Kürt Dili ve Edebiyatı Ders Kitabı, Tarih Vakfı Yurt Yayınları, Stenbol, 2010, r. 25. <https://gundekurd.webnode.c.tr/products/kurt-dili-ve-edebiyati-ders-kitabi/pdf> (14.03.2016).

† Berdan, ✂ Hêvî.

Di Kurmancî de zayend bi alîkariya paşqertafên tewang û veqetandekên çêdibe.

Mînak:

Hêvî destê bûkê digire (Qertafa tewanga- mê), Mihimid nanî dixwe (Qertafa tewanga -nêr), hevala min ji Wanê ye (Qertafa veqetandeka- mê), ji hevalê xwe re digot çîroka ' 'Mem û Zîn “ Ehmedê Xanî nivîsandiye (Qertafa veqetandeka -nêr).

1.2. Dengzanî

Ji lêkolîna ku li ser zanîstiya peyvan tê kirin re dengzanî tê gotin. Dengzanî, li ser van mijarên dangan disekine: guherîn, pevguherîn, ketin, lerizîn û veguhastin. Dengzanî, van mijaran di nava xwe de dihewîne û bi şiklekî zanistî jî îzah dike.⁷²

1.2.1. Nivîs û Alfabe

Nivîs, ji bilî axaftinê, ji bo mirov karibin hestên xwe, daxwaz û ramanên xwe bênin zimên, pêkhatina hinek îşaret û ji pergela wan, weke îfadeyeke mayînde tê terîfkirin.⁷³

Alfabe, ji bo her zimanekî ji rêzên tîpan pêk tê, ji van tîpên her yek li himberî dengêkî tê, jê re dibêjin alfabe.⁷⁴

1.2.1.1. Nivîs û Alfabe ya Hîttî

Anatolya, di navbera salên b.z. 1950-1700î de , nivîsa mixî a ku ji kêteyan pêk tê berî Hîttîyan di serdema koloniyên bazirganiyê Asûran de nas kiribû.⁷⁵ Halbûkî ev nivîs berî hezar salî li herêma Mezopotamyayê hatibû bikaranîn.⁷⁶ Ev nivîs ji aliyê van zimanan ve hatiye bikaranîn: somerî, akadî, babîlî, asûrî, elamî, eblayî, hurrî, hîttî, urartuyî, medî û persiya kevn.⁷⁷

⁷² Ocek, b.n., r. 21.

⁷³ Koç, b.n., r. 17.





⁷⁴ Roşan Lezgîn, Ji Bo Kurmancan Bi awayê Muqayeseyî Gramera Kirdkî (Zazakî), Weş. Roşna, Diyarbakır, 2013, r. 26.

⁷⁵ Koç, b.n., r. 18.

⁷⁶ Alparslan, b.n., r. 13.

⁷⁷ Fehmi Onur Çakmak, arkeopolis.com/civi-yazisi-doguyor (5.5.2017)

Hîtîtiyan, şêwaza nivîsa Asûran a ku nêzî dused salî li Anatolyayê hatibû bikaranîn ji xwe re nepejirandin; lê şêwaza nivîsa Babîlan ji xwe re pejirandin. Sedema vê jî nediyar e.⁷⁸ Hîtîtiyan ev şêwaz li gorî zimanê xwe adaptê kirin, hinek wateyên îşaretan jî guhartin.⁷⁹ Li gorî vê şêwazê hin îşaretên bingehîn yên ku di nivîsa mixî de tèn bikaranîn ev in:

			
mixa berwarî	mixa qinc	mixên xwar ên jor û jêr	mixa goşe çengeli

Nivîsa mixî, pêşveçûyîna xwe pêşî ji aliyê şêwaz û naverokê ve tamam kir. Piştî wê, bi îşaretên kîteyî, bi determînatîf û îdeograman (somerogram) jî hatin nivîsandin û êdî ji her alî ve xwe tamam kir.⁸⁰ Piştî vê tamamkirina îşaretên kîteyî, îdeogram(somerogram) û akadogram di nivîsên mixî de tam hatin bikaranîn.⁸¹ Bi alîkariya îdeograman, bi îşareteke peyvek dihat îfade kirin. Mînak: Peyva *hassu* tê wateya " qral "rewşa wê ya nomînatîf jî *hassus* e. Dema katibên Hîtîti ev peyv nivîsandibana, pêwîst bû, ev her çar îşaret jî nivîsandibana: *ha-as-su-us*. Katib, ev peyv bi îdeogrameke Somerî bi şiklê LUGAL dinivîsandin. Lêbelê dema Hîtîtiyan ev peyv dixwendin, ne weke LUGAL dixwendin. Ev jî, ji qertafên kêşanê yên ku dihatin dawîya îdeograman diyar in. Mînak: LUGAL-us, yanê *hassu-us*, Hîtîtiyan qertafa-us li dawîya îdeograma LUGAL dinivîsandin. Lê dema Hîtîtiyan ev îdeogram dixwendin, ne bi şiklê LUGAL-us dixwendin, bi şiklê *hassus* dixwendin.⁸² Nivîsa mixî, piştî ku dewleta Hîtîtiyan b.z. sala 1190î de hate hilweşandin û nivîsa wê jî bi dawî bû.⁸³ Hîtîtiyan, ji bilî nivîsa mixî, nivîsa hiyeroglîf (wênenivîs) jî bi kar anîbûn.⁸⁴ Ev hiyeroglîf, ji aliyê gelê Anatolyayê ve hatibû kişîkirin û pêşxistin.⁸⁵ Hîtîtiyan, li ser tablêten kîlê, nivîsa mixî dinivîsandin. Li ser mohr û abideyên zinara jî, nivîsa hiyeroglîf dinivîsandin. Nivîsa ku bi hiyeroglîfê dihat bikaranîn ji hîtîti bêhtir dişibiya

⁷⁸ Turgut Yiğit, Hitit Çivi Yazısının İlk Ortaya Çıkışı The First Appearance of the Hittite, r. 82. dergiler.ankara.edu.tr/dergiler/18/33/257.pdf (8.5.2017)

⁷⁹ Alparslan, b.n., r. 13.

⁸⁰ Selen Hirçin, Çivi Yazısı: Ortaya Çıkışı, Gelişmesi, Çözümü, Eskiçağ Bilimleri Enstitüsü Yayınları, İstanbul, 2000, r. 11.

⁸¹ Koç, b.n., r. 19.












⁸² Alparslan, b.n., r. 13-4.

⁸³ Koç, b.n., r. 22.

⁸⁴ De Martino, b.n., r. 17.

⁸⁵ Koç, b.n., r. 22.

a luwî. Ji ber vê wek hiyeroglîfa luwî tê zanîn. Ev nivîs, piştî ku împaratoriya Hîtîtiyan hate hilweşandin, heya serdema dewletên Hîtîtiya dawî yên ku li Bakurê Rojhilat û Bakurê Sûrî hatibûne bi cih kirin jî, ev nivîs hatibû bikaranîn.⁸⁶ Di pergala nivîsa hiyeroglîfê de, her wêneyek bi wateya gotinekê dihate nivîsandin.⁸⁷ Ev nivîs, cara yekem ji aliyê A.H. Sayce hatibû çaresekirin. A.H. Sayce, pêşî wateya Yezdan, qral û welat dîtibû.⁸⁸

	Yezdan
	Mezin
	Qral
	Qralê Mezin
	Qralîça Mezin
	Prens
	Bajar
	Welat
	Qahraman
	Keleh
	Çiya ⁸⁹

Hiyeroglîfa Anatolyayê, heya dawiya sedsala b.z 700î û di destpêka sedsala b.z 600î de li Kargameşê li ser hinek tiştan, şêwazê vê nivîsê dihate xuyakirin.⁹⁰ Alfabeya Hîtîtiyan ji wan tîpan pêk tê:

Tablo 4. Alfabeya Hîtîti

Alfabeya Hîtîti	
Tîpên Girdek	A, E, H, Î, G/Q/K, L, M, N, B/P, S, D/T, U, W, Y, Z
Tîpên Hûrdek	a, e, h, î, g/q/k, l, m, n, b/p, s, d/t, u, w, y, z
Tîpên Dengdar	h, g/q/k, l, m, n, b/p, s, d/t, w, y, z
Tîpên Dengdêr	a, e, î, u ⁹¹

Dema em li alfabeya hîtîti dinêrin hinek tîpên ku di kurdî de hene di hîtîti de nîn in. Wek van tîpên dengdêr : Tîpa **i, ê, o, û**

⁸⁶ Hırçın, b.n., r. 19.

⁸⁷ <https://ku.wiktionary.org/wiki/hiyeroglif> (11. 09. 2017.)

⁸⁸ Koç, b.n., r. 24.

⁸⁹ arkeofili.com/anadolu-hiyeroglif-yazisi-ile-tanisin (12.09.2017)

⁹⁰ Hasan Peker, "Anadolu hiyeroglifleri ve bunların Yakın Doğu çalışmalarına son katkıları", Akmend /Antalya, 2018, r. 16: www.academia.edu/.../SEMPOZYUM_Dünü_bugünü_ve_yarını_ile_Ana_dolunun_Epigr. (16.05.2018)

⁹¹ Theo Van Den Hout, The Elements of Hittite, Cambridge University Press, Cambridge, 2011, r. 14.

Dibe ku tîpa **i** û **î** 'yê yek bê jî, di hîtîti de tîpa **y** nîvdeng e. Nêzî tîpa **î** 'yê ye.

Mînak:

paî-pay: çûyîn

Di hîtîti de tîpa **ê** û **i** nîn e. Dibe ku hebe jî dema em li hovekên hîtîti dinêrin, peyv bi wî awayî derdikevin pêşiya me.

Mînak:

ne-e-pî-îs: asîman

Mur-si-i-lî: navê qralekî Hîtîtiya ye

Di peyva ne-e-pî-îs û Mur-si-i-lî de du tîpên dengdêr ji hev li pey hev hatine, dibe ku ev herdu tîpên li pey hev hatine nîşana tîpa **ê**- û **î** 'yê bin jî.

ne-e-pî-îs: nêpîs

Mur-si-i-lî: Mursîlî

Tîpa **-h-** dibe ku bi şiklê **-h-** û **-x-** 'yê hatibe xwendin.

Mînak: **happîra/ h**appîra/**x**appira: bajar

Di alfebeya hîtîti de tîpa **o** nîn e. Dibe ku, tîpa **o** û **u** hevdeng bin jî.

Mînak: Qral Hattusîlî: Qral Hattosîlî

⁹²Du tîpên nîvdeng bi navê /**ya**/ û /**wa**/ jî hene. ⁹³Herwiha **we-(ue)**, **we/wî-(uî)** dibin **u-**

Mînak: *huînut* → *hunut* " bila li pêş bimeşe, " *kuera* → *kura* " mera, malê xezîne, " *hatrawenî* → *hatraunî* " dinivîsin "

⁹⁴Peyvên ku bi tîpa **y** û **r**'yê jî destpêdikin nîn in. Hîtîtiyan, tîpa /**î**/ û /**e**/ pir caran wek hev qebûl kirine. Ev herdu dengdêr di şûna hev de jî bi kar anîne.

⁹² Van Den Hout, b.n., r. 14.

⁹³ Ünal, b.n., r. 253.

⁹⁴ Dinçol, b.n., r. 45.

Tablo 5. Tîpa î û e'yê (Hîtîti)

H î t î t î t î	î/e	
	<i>eshar / îshar</i>	xwîn
	<i>esha-îsha</i>	beg
	<i>ekuna/ îkuna</i>	sar
	<i>sî/ se</i>	jê re
	⁹⁵ <i>sîs/ses</i>	razan, raketin
	<i>îsna/esna</i>	hevîr
	<i>înara/enara</i>	birû,
	<i>îshahru/eshahru</i>	hêstir
	<i>hînkân/henkan</i>	weba

Di hîtîti de guhartina tîpa /î/ û /e/yê, dibe ku li gorî devokan hatibin bi kar anîn. Di navbera tîpa /a/ û /e/yê de jî guhertinek heye. Lê sedema vê guherîne ne jî diyar e.

Tablo 6. Tîpa a û e'yê (Hîtîti)

Hîtîti	
a/e	
⁹⁶ <i>ak/ ek</i>	mirin
<i>as/ es</i>	bûn
<i>aku/ eku</i>	vexwarin
⁹⁷ <i>sak/sek</i>	zanîn
<i>asas/ases</i>	rûniştin

Ev guherîna tîpa a û e'yê di pir zimanan de derdikeve pêşiya me. Di kurmancî de li hin deveran cuda tê bikaranîn. Li Mêrdînê devoka Torê nabêjin erê dibêjin arê. Di hîtîti de jî dibe ku ev guherîn li gorî devokê jî hatibe bikaranîn.

Guhertina navbera tîpa a û e'yê di dema kêşana lêker û navan de jî çêdibe.

Tablo 7. Kêşana a û e'yê (Hîtîti)

Kêşan	Hîtîti		
	a/e		
<i>Lêker</i>	<i>sak</i>	zanîn	Prs. 2. <i>sakti-sekti</i>
<i>Nav</i>	<i>watar</i>	av	Gn. Sg. <i>wetenas</i>
	<i>tekan</i>	erd, ax	Gn. Sg. <i>taknas</i> ⁹⁸

Li gorî tabloyê ev guherîn tiştêkî rêzimanî ye. Di kêşana lêkerê de bi şiklê a→e di kêşana nava de jî bi şiklê e →a guherîn çêbûye.

Di hîtîti de tîpa /z/ wek /ts/ tê telafûz kirin.⁹⁹ Ev telafûz, di peyvên ku li ba hevdu derbas dibin jî diyar e. Di zimanê almanî û îtalî de jî bi vî şiklî tê telafûzkirin.

⁹⁵ Ünal, b.n., r. 252.

⁹⁶ Dinçol, b.n., r. 46.

⁹⁷ Ünal, b.n., r. 252.

⁹⁸ Friedrich, b.n., r. 26.

⁹⁹ Van Den Hout, b.n., r. 13

Tablo 8. Tîpa z/ts (Hîtîti)

Hîtîti		
z/ts		
<i>aniyat(t)</i>	kar, xebat	<i>Nom. Sg. aniyaz / aniyatts</i> ¹⁰⁰

Di hîtîti de guhertina tîpa /z/ û ts yê di halê nomînatîf de tê pêşiya me. Nom. Sg. kartimmiyaz dibe kartimmiyats “xezeb, qehr”. Di almanî û îtalî de jî tîpa /z/ wek /ts/ tê telafûzkirin.

Mînak:

Almanî : Zimmer (tsimer): Oda

Îtalî: Pizza (pîtsa)

Di hîtîti de di navbera dengdarên hişk û nerm de ti cudabûn nîn e. Ji ber wê, zimanzanan, tîpan *b, d, g/q* di bin *p, t, kyê* de kom dikin.

Tablo 9. C+V û V+C (Hîtîti)

Hîtîti			
C+V	<i>ta, ti, tu / da, di, du</i>	<i>ga, gi, gu / qa, qi, qu; ka, ki, ku</i>	<i>ba/pa</i>
V+C	<i>at, it, ut / ad, id, ud</i>	<i>ag, ig, ug / aq, iq, uq; ak, ik, uk</i>	<i>ap/ab</i>
Mînak	<i>taî-dai</i> danîn	<i>karap-garap</i> xwarin	^{Lî} <i>patîlî-batîlî</i> cureyeke rahîban ¹⁰¹

Di metmên mixî de peyv bi şiklê hişk û nerm derdikevin pêşiya me.

Mînak:

zik/zig/ziq : tu

atta/adda: bav

babîlî/papîlî: zimanê babîlî

1.2.1.2. Nivîs û Alfabeya Kurdî

Kurdan jî wek neteweyên din, ji destpêka dîrokê heta roja me nivîs û alfabeyên cuda bi kar anîne an jî alfabeyên ku hatine bikaranîn, wan jî bi kar anîne. Di nav alfabeyan de yê ku hatine nivîsandin; nivîsa mixî, piştî sedsala 4an jî alfabeyên Aramî û Yewnanî, alfabeya Bîn û Şad, Masî Soratî, alfabeya Avesta, alfabeya Pehlewî bikar anîne.

¹⁰⁰ Diñçol, b.n., r. 52.

¹⁰¹ Diñçol, b.n., r. 49.

1. **Nivîsa Mixî (b.z. 3000-600):** Ev nivîs ji aliyê Someran ve hatiye îcatkirin, ji çepê ber bi rastê ve tê nivîsandin. Ji aliyê bapirên Kurdan , dewleta Medan ve hatiye bikaranîn. Ji 36 tîpan pêk tê. Medan, 6 tîpên din bi ser ve zêde kirine û bûye 42 tîp.¹⁰²
2. **Alfabeyên Aramî û Yewnanî:** Kurdan di b.z. sedsala 4an de, di şûna nivîsa mixî de, alfabe ya aramî û yewnanî bi kar anîne, belgeyên herî kevn ên bi vê alfabe yê hatine nivîsandin, nivîstekên Hewramî ne.
3. **Alfabeya Bîn û Şad û Masî Soratî:** Zanyar Îbn Wahşîye dibêje, ev alfabe ya Kurda ye û ji bilî Kurdan milletekî din bi kar neaniye. Ev alfabe ji 37 tîpan pêk tê.¹⁰³
4. **Alfabeya Avesta:** Ev alfabe ji aliyê bapirên Kurdan, dewleta Medan ve hatiye îcat kirin. Ji milê rastê ber bi milê çepê ve tê nivîsandin û ji 44 tîpan pêk tê.
5. **Alfabeya Pehlewî:** Bi vê alfabe yê, di navbera sedsalên 3 û 7an de, zaravaya Goranî şaxa wê Feylî, pirtûkên weke *Zend Avesta*, *Dînkêrd*, *Bondhişîn*, *Pendnamegî Zaradûşt û Mînokî Xîred* hatine nivîsandin. Ev alfabe jî, ji rastê ber bi çepê ve tê nivîsandin û ji 24 tîpan pêk tê.¹⁰⁴
6. **Alfabeya Kurdên Êzidî:** Bi vê alfabe yê, pirtûkên dîne Êzidiyan ên weke " *Mishafa Reş*, *Kitêba Celwe*" û yên din hatine nivîsandin. Ji rastê ber bi çepê ve tê nivîsandin û ji 31 tîpan pêk tê.
7. **Alfabeya Erebî:** Dema Kurdan mislimantî qebûl kirin, bi vê geşedanê re alfabe ya erebî bi kar anîne. Ji milê rastê ber bi milê çepê ve tê nivîsandin û ji 28 tîpan pêk tê. Ev alfabe di roja me de ji aliyê Kurdên Sûrî, Iraq û Îranê ve tê bikaranîn.¹⁰⁵
8. **Alfabeya Kîrîlî:** Ev alfabe ji aliyê Kurdên Komara Sovyeta kevn ve tê bikaranîn.¹⁰⁶

¹⁰² Kadri Yıldırım, " *Kürtlerin İslam Öncesi Alfabe Serüveni*", " Kürt Tarihi Dergisi, hjm: 5, İstanbul, 2013. r. 25.

¹⁰³ Yıldırım, h.g., r. 26-7.

¹⁰⁴ Yıldırım, h.g., r. 27-9.

¹⁰⁵ Nusrettin Bolelli, "Alfabe'nin İcadı ve Tarih Boyunca Kürtlerin Kullandığı Alfabeler": (The Invention of Alphabet and The Alphabets Used by Kurds Throughout The History), Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, hjm: 1, 2015, r. 22-4. [dergipark.gov.tr/ download/article-file/220218.pdf](http://dergipark.gov.tr/download/article-file/220218.pdf) (27.2.2018)

¹⁰⁶ web.telia.com/~u63802125/Xaneper/Hemsida/pirtuk/dilbilgisi/kurtalfabesi.html (27.2.2018)

9. **Alfabeya Latînî:** Ev alfabe, ji aliyê Kurdên Tirkî, Sûrî, Iraq û Îranê ve hatiye bikaranîn. Wek Alfabeya Kurmancî, Hawar û Bedîrxan jî tê binavkirin.¹⁰⁷ Cara pêşî li Ermenîstanê di sala 1928an de, ji aliyê Îsahak Marogûlov û Erebê Şemo ve hatiye damezrandin.¹⁰⁸ Van herduyan pirtûkek bi navê "*Xwe bi Xwe Fêrbûna Kurmancî*" nivîsandin û di sala 1929an de li Erîvanê weşandin. Ev sereke pirtûkeke kurdî ya bi tîpên latînî bû. Ev pirtûk, cara pêşî di sala 1930î di rojnameya *Riya Teze* de li Erîvanê hate weşandin.¹⁰⁹ Mîr Celadet Bedîrxan jî, ji sala 1919an ve dest bi xebata vê alfabeyê kiribû. Ji aliyê wî ve di 15ê Gulana sala 1932an de, hejmara Kovara Hawarê ya pêşî bi vê alfabeyê hate weşandin.¹¹⁰ Ji ber wilo ji sala 2006an û vir de her sal 15 Gulanê wek cejna zimanê kurdî tê pîroz kirin.¹¹¹

Alfabeya Kurmancî ya bi tîpên Latînî, ji 31 tîp û pevdengê pêk tê. Ji van tîpan 23 heb dengdar in û 8 heb dengdêr in. Ji van dengdêran 5 tîp dirêj, 3 jî kurt in.

Tablo 10. Alfabeya Kurmancî

Alfabeya Kurmancî	
Tîpên Girdek	A B C Ç D E Ê F G H Î Î J K L M N O P Q R S Ş T U û V W X Y Z
Tîpên Hûrdek	a b c ç d e ê f g h î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z
Tîpên Dengdar	b c ç d f g h j k l m n p q r s ş t v w x y z
Tîpên Dengdêr	a e ê î î o û
Tîpên Dirêj	a ê î o û
Tîpên Kurt	e i u
Pevdeng	xw ¹¹²

Tablo 11. Tîpên Di Alfabeya Kurmancî De

K	Li gorî cîderkê dengdêr	Li gorî awayê vebûna devê mirov
u	Pêşderkî e, ê, î	Gilover o, u, û
r	Navderkî i, u	Nîvgirtî ê, î, î
m	Paşderkî a, o, û	Vekirî a, e
a	Li gorî asta derketinê dengdêr dengdêr	Li gorî awayê derxistina dengan dengdar
n	Bilind i, î, u, û	Girtiya hişk k, p, q, t
c	Navincî ê, o	Girtiya nerm b, d, g
î	Nizm a, e	Girtiya difinî m, n

¹⁰⁷ https://tr.wikipedia.org/wiki/Kürt_alfabesi (17.2.2018)

¹⁰⁸ https://ku.wikipedia.org/wiki/Alfabeya_Şemo-Marogûlov (27.2.2018)

¹⁰⁹ Têmûrê Xelîl, Elfabeya pêşin, romana pêşin û romannivîsê pêşin, [www.nefel.com /kolumnists/kolumnist_detail.asp?...30](http://www.nefel.com/kolumnists/kolumnist_detail.asp?...30). (27.2.2018)

¹¹⁰ https://ku.wikipedia.org/wiki/Alfabeya_kurdî_ya_latînî (27.2.2018)

¹¹¹ Nasîr Kemaloglu, Cejna Zimanê Kurdî, candname.com/tag/nasir-kemaloglu (27.2.2018)

¹¹² Çetin Taş, Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî, Dîwan, Stenbol, çapa duyem /2013, r. 18.

	Li gorî cîderkê dengdar	Fîzeka hişk	f, s, ş
	Lêvkî	b, m, p, w	Fîzeka nerm
	Diranlêvkî	f, v	J, v, z
	Diranî	d, n, s, t, z	Herikiya lertzokî
	Pêşezmandevî	c, ç, j, l, r, ş, y	Herikiya rexkî
	Ezmandevî û qirikî	g, h, k, q, x	Nîvdengdêr
		Domdara hişk	h, w, y
			x ¹¹³

Di alfabeya kurmancî de ev tîp nîn in: **ı, ö, ü, ğ**. Di kurmancî de hinek tîp tam wateya xwe nadin. Di wir de pêwîste hinek tîp zêde bibin. Dema em mînakeke li ser tîpa /x/yê bidin:

Axa Mêrdînê sor e.

Axa li gund e.

Li gorî van mînakan de **Axa Mêrdînê sor e** wateya xwe dide, lê **Axa li gund e** wateyeke din dide. Ji tîpa /x/yê bêhtir dengê tîpa /ğ/yê derdikeve.

Di alfabeya kurmancî de taybetmendiyên hinek tîpan hene.

Cudatiya /Ê/ û /E/yê

Tîpa /ê/yê dengdêreke dirêj e. Di navbera dengê /e/ û /î/ de ye. Cudatiya navbera /ê/ û /e/yê pir eşkere ye.

Mînak:

Êzing, têr, şêr peyvên wek " ez, ter, şer". ¹¹⁴

Di hinek devokan de ji ber ku tîpa /ê/yê nêzî tîpa /î/yê ye. Dema tîpa /ê/yê berî tîpa /y/yê tê, şûna tîpa /ê/yê de ne tîpa /e/ tê, tîpa /i/yê tê. Hinek alozî li ser vê rewşê heye. Dema em mînakeke ji bo peyva " **rê/rî** "yê bidin. Dema ku tîpa /ê/ û /î/yê berî tîpa /y/yê tên dibin tîpa /i/.

Tablo 12. Tîpguhertin: ê/î: i (Kurmancî)

Kurmancî	
ê /î: i	
pê, pî	piyên min
rê, rî	riya min

¹¹³Abdullah Karabax, Rêzimana Kurdî ya Kurmancî, Lozan, 2013, r. 22-3: <https://gomanweb.org/G/OMANWEB2/Sonradan/Eklenenler/kurdi-yeni/Reziman.pdf> (05.03. 2018).

¹¹⁴ Ocek, b.n., r. 28.

dê	diya wî ¹¹⁵
----	------------------------

Dema em li tabloyê dinêrin, tîpa /e/î/yê dibin /i/. Sedema vê guherîne ji nîvdenga /y/yê ye. Her çiqas li gorî rêzimanê ev guhertin hebe jî, lê carinan yek li gorî rêzimanê naçe.

Dema ku yek guherîna tîpa /î/ û /i/yê dinêre, di peyvan de dengê kîjan tîpê bêhtir derdikeve pêşiya me. Wek peyva çîya û çiya ? Dema ku yek wan peyvan dixwîne dengê peyva çîya bêhtir derdikeve, lê dema ku yek guherîna tîpa /ê/ û /i/yê dinêre, yek li gorî nîvdenga /y/yê diçe. Ji tîpa /ê/yê bêhtir yek wek tîpa /i/yê yek dixwîne. Wek peyva diya min û dêya min yek bêhtir dibêjê diya min. Lê di hinek devokan de li gorî nîvdenga /y/yê naçin. Dibêjin dêya min, pêyen min, rêya min.

Guherîna di navbera tîpa /ê/ û /i/yê de, di navbera /e/ û /î/yê de jî heye.

Tablo 13. Tîpguhertin: e/î û e/î (Kurmancî)

Kurmancî			
e/î		e/î	
tejî	tijî	deyne	danîn
çel	çil	dane	danî ¹¹⁶

Li gorî tabloyê guherîna tîpa e/î û e/î ne rêzimanî ye. Diyar e ku ev guherîn li gorî devokan çêbûye.

Mînak:

Pirsgirêk an pirsgerêk

Bîne an bêne

Cudatiya /Û/ û /U/yê

Tîpa “û”yê pîranî wek /u/ya tirkî tê telafûz kirin.

Mînak: Bûk, bûn, şûn, şûr, kûr.

Dengê /u/ya kurmancî dengdêreke kurt e.

Mînak: Guh, gund, xurt, kul, du. ¹¹⁷

Peyveke ku bi tîpa /u/yê destpêkirî hebe, mirov wê bizanibe ev peyv ji zimanekî

¹¹⁵ Celadet Alî Bedîrxan, Roger Lescot, Kürtçe Gramer, Weş. Avesta, Stenbol, 2009, r. 13-14.

¹¹⁶ Aktuğ, b.n., r. 26.

¹¹⁷ Samî Tan, Rêziman û Rastnivîsa Zaravayê Kurmancî, Weş. Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê, Stenbol, 2005, r. 41.

din hatiye nav kurmancî.¹¹⁸

Tîpa /î/ya kurmancî ji /i/ya tirkî dirêjtir tê xwendin.¹¹⁹ Mînak: Dîk, mîr, tîr, şîr.¹²⁰

Dema tîpa /î/yê berî tîpa /y/yê tê kurt dibe.¹²¹

Tablo 14. Tîpguhertin: î/i (Kurmancî)

Kurmancî			
î / i			
zevî	zeviya me	kefî	kefiya sor
kevî	keviya berfê	xwelî	xweliya agirî ¹²²
sofî	sofiyê serhedê	bestenî	besteniya şîr ¹²³

Dema em li tabloyê dinêrin ku tîpa /î/yê hatiye pêşiya nîvdenga tîpa /y/yê tîpa /î/yê bûye tîpa /i/. Herçiqas tîpa /y/yê nîvdeng bê jî tîpa /î/yê kurt bike jî dema ku yek dixwîne yek carinan li gorî kurtkirine naçe yek lî gorî xwendina peyvê diçe. Mînak deriye wê an deriyê wê? Dema ku yek peyvê dixwîne yek wek deriyê wê dixwîne.

Di kurmancî de tîpên kelijandine /h/, /w/ û /y/ ne.

Mînak: Avahî, tûwên, gundiyan.¹²⁴

Ev tîpên nîvdeng, dema ku têne pêşiya dengdêrên dirêj wan kurt dikin. Tîpa /y/yê van herdu dengdêrên dirêj kurt dike. /î/ û /ê/yê dike /i/.

Tablo 15. Tîpguhertin: î/i û ê/i (Kurmancî)

Kurmancî			
î / i		ê / i	
zevî	zeviyê me	dê	diya min

Tîpa /h/yê jî dengdêrên dirêj kurt dike. Tîpa /a/yê dike /e/, tîpa /î/yê dike /i/, tîpa /o/ û /û/yê dike /u/.

Tablo 16. Tîpguhertin: a/e, î/i û o/u (Kurmancî)

Kurmancî					
a / e		î / i		o / u	
çav	çehv	rî	rih	botan	buhtan ¹²⁵

¹¹⁸ Ocek, b. n., r. 19.

¹¹⁹ Lezgîn, b.n., r. 29.

¹²⁰ Aktuğ, b.n., r. 19.

¹²¹ Tan, Rêziman û Rastnivîsa ..., r. 35

¹²² Taş, b.n., r. 22.

¹²³ Ocek, b.n., r. 26.

¹²⁴ Aktuğ, b.n., r. 44.

¹²⁵ Ocek, b.n., r. 26-7.

Tîpa /w/yê wek /و/ a erebî tê bilêvkirin. Mînak: Wargeh, awarte, war.¹²⁶
 Cudatiya wê û tîpa /v/yê pir diyar e. Tîpa /v/yê tîpeke diranlêvî ye û nêzî tîpa /f/yê ye.¹²⁷

Tîpa /w/yê dema ku tê pêşiya tîpa /û/yê wê dike /u/. Ev tîp wezîfa kelijandinê jî dibîne.¹²⁸

Tablo 17. Tîpguhertin: û/u (Kurmancî)

K u r m a n c î	û/u	
	tû	tuwa reş
	rû	ruwê rojê
	hesû	hesuwa çiyayê jorî
	xwesû	xwesuwa Beybûnê
	pêşû	pêşuwa xwînxwar ¹²⁹

Di hinek devokên kurmancî de di şûna kelijandina /w/yê de kelijandina /y/'yê tê bikaranîn.

Mînak : Tuwa reş: tuya reş

Tîpa /q/yê wek /ق/ a erebî tê bilêvkirin.

Mînak: Qirik, baq, qermiçî.

Tîpa /x/yê wek /خ/ ya erebî tê bilêvkirin.

Mînak: Xelat, ax, xew.¹³⁰

Di zaraveyên zimanê kurdî yê kirmanckî û kurmancî de bi tîpên "ê, i, j, o, u, û, y" yê peyv kêma dest pê dikin.¹³¹ Tîpa /î/yê ji bilî hinek daçekên wek " ji, bi, li, di, çî" bi vê tîpê peyv dest pê nakin û ne jî pê dawî dibin. Ger peyvek bi vê tîpê dest pê kiribe an jî pê dawî bibe, yek dê zanibe ev peyv ne bi kurmancî ye, ji zimanekî din hatiye nava kurmancî.¹³²

¹²⁶ Aziz Samur (2012), Kurdiya Rêziman KURMANCÎ, Weş. Nûbihar, Stenbol, 2012, r. 6.

¹²⁷ Tan, b.n., r. 53.

¹²⁸ Taş, b.n., r. 22.

¹²⁹ Ocek, b.n., r. 26.

¹³⁰ Samur (2012), b.n., r. 6.

¹³¹ M. Malmîsanij, Kurmanca ile Karşılaştırmalı Kirmanca (Zazaca) Dilbilgisi, Weş. Wate, Stenbol, 2015. r. 27.

¹³² Ocek, b.n., r. 19.

Mînak: Izin, îşaret, insan, imza.¹³³

Tîpa /i/yê kurt tê bilêvkirin. Dema tîpa /i/yê hûrdek bê nivîsandin, xal li ser tê nivîsandin; lê dema /I/ girdek bê nivîsandin xal li ser nayê nivîsandin.

Mînak: Bivir, zivirandin, zivistan/ BIVIR, ZIVIRANDIN, ZIVISTAN.¹³⁴

Tîpa /a/ya kurmancî ji /a/ya tirkî dirêjtir tê xwendin.

Mînak: Bav, sar, mal, av, sal.¹³⁵

Di hinek peyv û lêkeran de tîpa /a/yê diguherê tîpa /î/yê.

Tablo 18. Tîpguhertin: a/î (Kurmancî)

Kurmancî			
a/î			
anî	bîne	mayin/man	bimîne

Emê li gorî lêkerên jor hinek mînakên di nav hevokan de bidin. lêkera **anî** û **bîne**, **mayîn/man** û **bimîne**, ev lêker li gorî deman jî tên bikar anîn.

Mînak:

Wî pirtûka " Mem û Zîn" ji min re **anî** .

" Dîwana Malayê Cizirî" ewê sibê ji min re **bîne**.

Ez ê sibê romana Mehmet Uzun a bi navê " Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê " ji te re **bînim**.

Ez anha berhema helbestvan Şêrko Bêkes a bi navê " Kawayê Hesinkar" ji te re **tînim**.

Dema em li van mînakan dinêrin dema borî de tîpa /a/ ye. Lê ku formên deman tên guhertin tîpa /a/dibe tîpa /î/.

Di hinek peyvên de jî tîpa /a/yê diguherê tîpê /e/ û /ê/yê.

Tablo 19. Tîpguhertin: a/e û a/ê (Kurmancî)

Kurmancî	
a/e	a/ê
Berfinê teşî bada Berfin rêsiyan bade	min nan çêkir ez nên çêdikim ¹³⁶

¹³³ Bedîrxan û Lescot, b.n., r. 9.

¹³⁴ Samur (2012), b.n., r. 6

¹³⁵ Bedîrxan û Lescot, b.n., r. 4.

¹³⁶ Aktuğ, b.n., r. 24.

Li gorî mînakên tabloyê dema ku kirde ji rewşa tewandî dikeve rewşa xwerû de tîpa /a/ diguherê tîpa /e/ û /ê/.

Mînak

Zeynebê pirtûk danî ser mase (kirde tewandî)

Zeynep pirtûkan deyne ser mase (kirde xwerû)

Min dew çêkir. (kirde tewandî)

Ez dêw çêdikim (kirde xwerû)

Dengdêra /o/yê jî dirêj tê bilêvkirin. Dengdara kelijandinê ya ku piştî /o/yê tê /w/ye. Lê hinek caran /y/ jî tê.

Tablo 20. Tîpguhertin: o/w û o/y (Kurmancî)

Kurmancî			
o/w		o/y	
ro	ava rowê zêwê ziwa bû.	co	coya avê ¹³⁷

Dema ku tîpa /o/yê dema berî dengdara /h/yê tê kurt dibe û tîpa /o/dibe tîpa /u/.

Tablo 21. Tîpguhertin: o/h (Kurmancî)

Kurmancî	
o/h	
do	duh
co	cuh
nok	nuhk ¹³⁸

Tîpa " J-j "yê hûrdek be, xal li ser tê nivîsandin. Ger girdek be, xal li ser nayên nivîsandin.

Mînak: jîyan, jêhatî, jin/ JIYAN, JÊHATÎ, JIN. ¹³⁹

Di kurmancî de du tîpên dengdar wek hev û nêzî hev, nayên ba hev. Gava bîna ba hev, ji wan tîpan yek dikeve û peyv bi tîpekê tê nivîsandin.

Tablo 22. Tîpên jihev û nêzî hev (Kurmancî)

¹³⁷ Aktuğ, b.n., r. 30.

¹³⁸ Taş, b.n., r. 23.

¹³⁹ Ocek, b.n., r. 17.

K u r m a n c î	Tîpên Jihev		Tîpên Nêzî Hev			
	xurt	xurt-tîr	xurtir	rind	rind-tîr	rintir
rast	rast-tîr	rastir	bilind	bilind-tîr	bilintir	
sist	sist-tîr	sistir	dewlemend	dewlemend-tîr	dewlementir	
kurt	kurt-tîr	kurtir. ¹⁴⁰				

Herçiqaş li gorî qaîdeye du dengarên ji hev an jî nêzi hev neyên ba hev jî, lê dema ku em mînakên jor dinêrin, xwendin û nivîs ji hevdu cuda ne. Nivîs ne wek xwendine hatiye nivîsandin. Mînak ji bo peyva devlemend dema dengadara /t/yê tê cem dengdara /d/'yê yek weke devlemendtir dixwîne. Ji ber ku di xwendinê de dengdara /d/'yê jî tê telafûzkirin.

Di kurmancî de guherîna hinek dengdaran bi awahî çêdibe.

Tablo 23. Guherîna Dengdaran (Kurmancî)

K u r m a n c î	Guhertina Hinek Dengdaran		
	g/k	pûng	pûnk
zarong		zarok ¹⁴¹	
d/t	dihêm	têm	
s/z	destgeh	dezgeh	
f/v	axaftin	diaxive ¹⁴²	
b/v	kebanî	kevanî	
b/p	biçûk	piçûk ¹⁴³	
m/v	dims	divs	
s/ç	birsî	birçî ¹⁴⁴	
ş/j	kuştin	bikuje ¹⁴⁵	

Ev guherîna dengdaran li gorî zarava û devokên kurdî carna tên guhertin.

Mînak:

Kurmancî Soranî

birçî birsî

kebanî kevanî

Ji aliyê dengzaniyê ve nuqtayên hevbeş

a) Herdu gelan ji alfabeyekê bêhtir alfabe bikaranîne.

¹⁴⁰ Taş, b.n., r. 21.

¹⁴¹ Bedîrxan-Lescot, b.n., r. 28.

¹⁴² Aktuğ, b.n., r. 44.

¹⁴³ Bedîrxan-Lescot, b.n., r. 18-9.

¹⁴⁴ Aktuğ, b.n., r. 46.

¹⁴⁵ https://ku.wikipedia.org/wiki/Lêkerên_kurdî (11.03.2018)

b) Hîtîtiyan alfabeya mixî bikaranîne, ev nivîs dewlata Medan (bapîrên kurdan) jî bikar anîne.

c) Di hîtîtî û kurmancî de tîpên hevpar: *a, e, h, î, g/q/k, l, m, n, b/p, s, d/t, u, w, y, z.*

d) Di hîtîtî û kurmancî de ev nîvdeng hevpar in: */w/ û /y/.*

e) Di hîtîtî û kurmancî de di navbera dengdêra */a/ û /e/yê* de guhertinek çêdibe.

Hîtîtî	a/e	Kurmancî
--------	-----	----------

<i>ak-ek:</i> mirin		arê-erê
---------------------	--	---------

<i>aku-eku:</i> vexwarin		bada-bade
--------------------------	--	-----------

f) Di hîtîtî û kurmancî de di navbera dengdêra */e/ û /î/yê* de guhertinek çêdibe.

Hîtîtî	e/î	Kurmancî
--------	-----	----------

<i>esha -îsha:</i> beg		deyne-danîn
------------------------	--	-------------

<i>ekuna-îkuna:</i> sar		dane- danî
-------------------------	--	------------

g) Di hîtîtî û kurmancî de guhertina di navbera */d/ û /t/yê:*

Hîtîtî	d/t	Kurmancî
--------	-----	----------

<i>tai-dai:</i> danîn		dihêm-têm
-----------------------	--	-----------

<i>tariyasha-dariyasha:</i> westabûn		diêşe-têşe
--------------------------------------	--	------------

h) Di hîtîtî û kurmancî de guhertina di navbera */k/ û /g/yê:*

Hîtîtî	k/g	Kurmancî
--------	-----	----------

<i>karap-garap:</i> xwarin		zarong-zarok
----------------------------	--	--------------

<i>karît-garît:</i> lehî		pûng-pûnk
--------------------------	--	-----------

i) Di Hîtîtî û kurmancî de guhertina di navbera */b/ û /p/yê:*

Hîtîtî	b/p	Kurmancî
--------	-----	----------

^{Lû} <i>patîlî-batîlî:</i> cureyeke rahîban		biçûk-piçûk
--	--	-------------

Ji aliyê dengzaniyê ve nuqtayên cuda

a) Kurdan ji Hîtîtiyan bêhtir alfabe bikar anîne.

b) Ev tîp di kurmancî de hene, lê di hîtîtî de nîn in: *c ç d ê f i j o ş û v x.*

c) Di kurmancî de pevdenga */xw/yê* heye, lê di hîtîtî de nîn e.

d) Tîpa/ *h/yê* di kurmancî de nîvdeng e, lê di hîtîtî de ne nîvdeng e.

e) Di hîtîtî de bi tîpa */y/ û /r/yê* peyv dest pê nakin lê, di kurmancî de destpê dikan.

1.3. Peyvsazî

Bi saya peyvسازیê mirov reng û şıklê peyvan, cureyê peyvan, rêz û rêzikên peyvan nas dike. Peyv ji kiteyekê an jî ji çend kîteyan pêk tê. Ji aliyê sazûnê ve cureyên peyvan ev in: peyvên xwerû, peyvên pêkhatî, peyvên hevedudanî.¹⁴⁶

Peyvên xwerû: Peyvên ji hêmanekê tenê pêk hatine.¹⁴⁷ An jî peyvên qertafên bêjesaz nastînin. Peyvên xwerû qertafên kêşanê bigrin jî dîsa xwerû ne.¹⁴⁸

Tablo 24. Peyvên Xwerû (Hîtî û Kurmancî)

Peyvên Xwerû	
Hîtî	Kurmancî
<i>nepîs</i>	asîman
<i>neku</i>	şev
<i>pahs</i>	parastin ¹⁴⁹
<i>kuîs</i>	kî
<i>anda</i>	hundur
<i>min</i>	a/ê min
<i>pata</i>	pî ¹⁵⁰
<i>kuen</i>	kuştin
<i>kuwapî</i>	gava ku
<i>kard</i>	qelb ¹⁵¹

Di hîtî de her çiqas peyvek qertafa nomînatîf sitandibe jî dîsa peyv xwerû ye. Mînak:

antuhsa: mirov (xwerû)

antuhsas: mirov (nomînatîf- xwerû)

Peyvên pêkhatî: Peyveke qertafên bêjesaz sitandibe. Ger ji vê peyvê wateyek û peyveke nû çêbibe.¹⁵²

Tablo 25. Qertafa Bêjesaz (Hîtî û Kurmancî)

Qertafa Bêjesaz			
Hîtî	-at(t)	<i>karuîlî</i>	<i>karuîliyat</i> ¹⁵³
Kurmancî	(a)tî/-(î)tî/ ¹⁵⁴	kal	kalîf

¹⁴⁶ Tan, Rêziman û Rastnivîsa ..., r. 45.

¹⁴⁷ Ocek, b.n., r. 45.

¹⁴⁸ Aktuğ, b.n., r. 108

¹⁴⁹ Zeilfelder, b.n., r. 242-3.

¹⁵⁰ Ünal, b.n., r. 102-3.

¹⁵¹ Riken, b.n., r. 233.

¹⁵² Aktuğ, b.n., r. 108.

¹⁵³ Dinçol, b.n., r. 59.

¹⁵⁴ Abdurrahman Bakır, Rêziman û Peyvsaziya Kurmancî, Weş. Aram, Stenbol, 2015, r. 48.

Di hîtîfî de qertafa **-at(t)** û di kurmancî de qertafa **-(î)tî/- (a)tî** nêzî hev in û hatine peyveke rengdêr e ji peyveke peyveke nû hatiye dariştin. Dema em li gorî qertafên bêjesaz yên di tabloyê de hinek mînakên din bidin yê bi awahî çêbibin.

Mînak:

Hîtîfî: *antuhsa, antuhsat*

Kurmancî: mirov, mirovatî

Hîtîfî: *hassu, hassuyat*

Kurmancî: qral, qralti

Peyvên hevedudanî: Ji çend peyvan pêk tên. Dema ev peyv tên ba hev peyveke nû tê damezrandin. Ger mirov wan ji hev veqetîne, her peyvek ji wan xwediyê wateyeke serbixwe ye.¹⁵⁵

Tablo 26. Peyvên Hevedudanî (Hîtîfî û Kurmancî)

Hîtîfî	Kurmancî
<i>appa-sîwat</i>	pêşe-roj ¹⁵⁶

Peyva *appa* tê wateya pêş û peyva *siwat* jî tê wateya rojê.

1.3.1. Kok

Bi pirranî kok, di peyvê de parçeya hêrî piçûk a watedar û bêqertaf e. Mînak: Nan, gur, pez, kuç, dûr, nerm, av.¹⁵⁷

1.3.1.1. Di Hîtîfî de Koka Nav, Rengdêr û Lêkeran

Di hîtîfî de koka hinek nav û rengdêran bi van dengdêr û dengdaran dawî dibin. Kokên bi dengdêran dawî dibin, /a/, /î/ û /u/ ne. Yê bi pevdengan dawî dibin, /aî/ û /au/ ne. Kokên bi dengdaran dawî dibin jî, /l/, /n/, /r/, /r/n/, /t/, /nt/ û /s/ ne.¹⁵⁸ Di lêkeran de kok bi sê şikla çêdibe: guherîn, ketin û neketina dengan.

Mînak: Guherîna **a/e:** *es-/as* "bûn", ketina **/e/:** *samen-/samn* "winda bûn",

¹⁵⁵ Taş, b.n., r. 28.

¹⁵⁶ Olivier Lauffenburger, Hittite Grammar, 2008, r. 2: www.assyrianlanguages.org/hittite/hittite_grammar.pdf (18. 03. 2018)

¹⁵⁷ Aktuğ, b.n., r. 76.

¹⁵⁸ Van Den Hout, b.n., r. 17.

kuen-/kun " kuştin" ¹⁵⁹

Tablo 27. Koka Nav, Rengdêr û Lêkeran (Hîtîti)

Nav			Rengdêr		
H î t î t î t î	-a	<i>antuhsa</i>	mirov, zilam	<i>alwanzena</i>	tamxweş
	-î	<i>halkî</i>	dexl, zad	<i>karuîlî</i>	pîr, kal, kevn ¹⁶⁰
	-u	<i>taru</i>	dar	<i>assu</i>	baş, qenc ¹⁶¹
	-ai	<i>linkaî</i>	sond	<i>saklaî</i>	biîmtiyaz ¹⁶²
	-au	<i>harnau</i>	kursiyê zayîne ¹⁶³	-	-
	-l	<i>wastul</i>	guneh ¹⁶⁴	-	-
	-n	<i>laman</i>	nav	-	-
	-r	<i>kîssar</i>	dest ¹⁶⁵	<i>sakuwassar</i>	rast, jidil, samîmî ¹⁶⁶
	-r/n	<i>mehur/n</i>	dem ¹⁶⁷	-	-
	-t	<i>neku</i>	êvar ¹⁶⁸	-	-
	-nt	<i>îspant</i>	şev	<i>humant</i>	hemû ¹⁶⁹
	-s	<i>nepis</i>	asîman ¹⁷⁰	-	-
	Lêker				
-a/e	<i>ep/ap</i>	girtin ¹⁷¹	-aî	<i>paî</i>	çûyîn ¹⁷²
-îya	<i>îya</i>	gav avêtin ¹⁷³	-u/ue	<i>kur/kuer</i>	birrîn ¹⁷⁴

Dema em li tabloyê dinêrin. Di hîtîti de koka hinek nav , rengdêr û lêkeran wek hev in. Peyvên ku **-au**, **-l**, **-n**, **-t**, **-rn** dawîbûne nav in. Peyvên ku **-a**, **-î**, **-u**, **-ai**, **-r**, **-nt** jî dawîbûne him nav in him jî rengdêr in. Peyvên ku **-a/e**, **-aî**, **-u/ue**, **-îya** jî dawîbûne lêker in. Peyvên ku **-aî** dawîbûne dibe nav, rengdêr û lêker.

Mînak:

Nav	Rengdêr	Lêker
linkaî	saklaî	paî

¹⁵⁹ P. Streck, b.n., r. 99.

¹⁶⁰ Hittite: Glossing of common Hittite forms-Glossing Ancient Languages: [https://wikis.huberlin.de/...glossing Hittite: Glossing of co.. / \(7.4.2018\).](https://wikis.huberlin.de/...glossing Hittite: Glossing of co.. / (7.4.2018).)

¹⁶¹ P. Streck, b.n., r. 91.

¹⁶² H. A. Hoffner Jr. & H. C. Melchert, A Grammar of the Hittite Language. Part I: Reference Grammar, Eisenbrauns press, Winona Lake (Indiana), 2008, r. 54.

¹⁶³ Susanne Zeilfelder, Hittite Exercise Book. English Version by Esther-Miriam Wagner, Verlag Wiesbaden: Harrassowitz im Kommission, Dresden, 2005, r. 218.

¹⁶⁴ Hoffner & Melchert, b.n., r. 108.

¹⁶⁵ Elisabeth Rieken, Einführung in die hethitische Sprache und Schrift. 2., verbesserte Auflage (Lehrbücher orientalischer Sprachen) Verlag Ugarit, Münster, 2015, r. 233.

¹⁶⁶ Zeilfelder, b.n., r. 249.

¹⁶⁷ Rieken, b.n., r. 233.

¹⁶⁸ Zeilfelder, b.n., r. 242.

¹⁶⁹ Van Den Hout, b.n., r. 72.

¹⁷⁰ Hoffner & Melchert, b.n., r. 118.

¹⁷¹ P. Streck, b.n., r. 99.

¹⁷² Rieken, b.n., r. 103.

¹⁷³ Hoffner & Melchert, b.n., r. 203.

¹⁷⁴ Rieken, b.n., r. 95.

sond biîmtiyaz çûyîn

Ji bilî kokên ku di tabloya jor de derbas dibin hinek kokên din jî hene.

Mînak: **-k, -e, -h, -m, -k, -au(s)**,

Nav: *kard*: qelb,¹⁷⁵ *utne*: welat, *îşqaruh*: gemiyek, *gîem*: zivistan¹⁷⁶

Lêker: *har(k)*: hebûn, rawestîn, *au(s)/-u(wa)*: dîtin¹⁷⁷

1.3.1.2. Di Kurmancî De Koka Nav, Rengdêr û Lêkeran

Di kurmancî de resen û bingeha peyvan kok e û piranî jî peyv ji kêteyekê pêk tê û wateyeke wan heye. Mînak: *Gur, pez, av*. Yên bêwate jî hene wek *bi, li, di, ku, û*. Didu cureyên kokê hene: koka navan û koka lêkeran. Di kurmancî de koka cihnav, rengdêr, hoker, gihanek û daçekan jî wek koka navan tê hesibandin.¹⁷⁸ Lêker jî xwediyê du koka ye, koka dema borî û koka dema niha.¹⁷⁹

Koka dema borî bi vî şiklî çêdibe; dema ji lêkeran qertafên raderîn /n/ û /in/ têne avêtin, koka dema borî derdikeve holê.¹⁸⁰ Piştî rakerina qertafên raderê dawiya lêkeran bi tîpên /a/, /î/, /û/, /d/, /t/ û /r/yê tên qedandin.¹⁸¹ Ev kok dema boriya têdeyî, kesê sisêyan û yekjimar nîşan dide.¹⁸² Rayeka dema niha jî bi wî şiklî çêdibe; dema qertafên dem û kesan jê tên avêtin, piştî vê rakirine koka dema niha derdikeve holê.¹⁸³

Tablo 28. Koka Nav û Lêkeran (Kurmancî)

	Koka Navan
--	-------------------

¹⁷⁵ Dinçol, b.n., r. 71.

¹⁷⁶ Hoffner & Melchert, b.n., r. 104-5.

¹⁷⁷ Michele Cammarosano, Arbeitsblätter zur hethitischen Grammatik (OHNE GEWÄHR!! :P) / Christmas edition mit Rudolf-Kuruntiya!, www.academia.edu/.../Arbeitsblätter_zur_hethitischen_Gra. (10.5.2018)

¹⁷⁸ Aktuğ, b.n., r. 77-8.

¹⁷⁹ Tan, b.n., r. 209.

¹⁸⁰ Ocek, b.n., r. 212.

¹⁸¹ Qanatê Kurdo, Rêzîmana Kurdî Kurmancî Soranî, Wer. Zülküf Ergün, Weş. Nûbihar, Stenbol, 2013, r. 142.

¹⁸² Tan, b.n., r. 209

¹⁸³ Ocek, b.n., r. 213.

K u r m a n c î	Ba, nan, av, peyv, deşt ¹⁸⁴ pênûs, pirtûk, derî, evin, xewn, ¹⁸⁵ ez, tu, ew, min, te, ¹⁸⁶ sor, reş, kin, dirêj, rast, ¹⁸⁷ mezin, hêja, zirav, pîrr, hindik, ¹⁸⁸ betirpêr, pêr, îro, sibe, dusibe, ¹⁸⁹ ewqas, lê, û, jî, ¹⁹⁰ li, ji, bi, di, bê. ¹⁹¹		
	Koka Lêkeran		
	<i>Rader</i>	<i>Koka dema Borî</i>	<i>Koka dema niha</i>
	birîqîn	birîqî	birîq
	derizîn	derizî	deriz
	jiyan	jiya	jî
	kolan	kola	kol ¹⁹²
	ajaotin	ajot	ajo
	dirûtin	dirût	dirû ¹⁹³
	çûn	çû	ç
	xwarin	xwar	xw ¹⁹⁴
	rijandin	rijand	rijîn
	gerandin	gerand	gerîn
	çêrandin	çêrand	çêrîn
revandin	revand	revîn ¹⁹⁵	

1.3.2. Qertaf

Ti wateyê wan tiştan nîn e; ¹⁹⁶ lê dema tê peyvê ji peyvê peyveke nû pêk tîne re dibêjin qertaf. ¹⁹⁷

1.3.2.1. Di Hîtîfî de Qertafên Pêşgir, Navgir û Paşgir

Qertafên hîtîfî, pîranî ji paşgiran pêk tînin, ji aliyê navgir û pêşgiran ve bi pêş neketiye, bi tenê qertafeke navgîr heye û çend heb jî pêşgir hene. ¹⁹⁸

Qertafên pêşgir

¹⁸⁴ Yıldırım, b.n., r. 188.

¹⁸⁵ Taş, b.n., r. 84.

¹⁸⁶ Tan, b.n., r. 125.

¹⁸⁷ Ocek, b.n., r. 143.

¹⁸⁸ Mûrad Ciwan, Türkçe açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi: Kurmanc Lehçesi, Weş. Jîna Nû, Örebro, 1992, r. 59: bnk.institutkurde.org/images/pdf/48ZLGSQ9XT.pdf (12.05.2018).

¹⁸⁹ Aktuğ, b.n., r. 440.

¹⁹⁰ Ocek, b.n., r. 185.

¹⁹¹ Taş, b.n., r. 156.

¹⁹² Yıldırım, b.n., r. 48.

¹⁹³ Kurdo, b.n., r. 145.

¹⁹⁴ Yıldırım, b.n., r. 50.

¹⁹⁵ Kurdo, b.n., r. 148.

¹⁹⁶ Ocek, b.n., r. 34.

¹⁹⁷ Lezgîn, b.n., r. 94.

¹⁹⁸ H. Craig Melchert, "Hittite Morphology", Morphologies of Asia and Africa, cld. 2, Alan S. Kaye(ed.), Press Eisenbrauns, Winona Lake (Indiana), 2007, r. 755: <https://books.google.de/books?isbn=1575061090> (18.05.2018)

Pêşgirên *u-* û *pe-*'yê dema tên lêkeran nêzîkahî û dûrahiya cihekî nîşanî me didin.¹⁹⁹Pêşgira nêzîkayî *u-* "vir" û pêşgira dûrayî ya *pe-*'yê jî "wir" ²⁰⁰ Ev pêşgir carna ji lêkara *da* "sitandin" û *naî* "wergerîn" re dibin pêşgir.

Tablo 29. Qertafên Pêşgiran (Hîtîti)

<i>H</i>		<i>Pêşgir</i>	<i>û</i>	<i>lêker</i>	<i>pevghîştin</i>	<i>wate</i>
<i>î</i>	vir	<i>u-</i>	+	<i>da</i>	<i>uda</i>	anîn (vir)
<i>t</i>	wir	<i>pe-</i>			<i>peda</i>	şandin (wir)
<i>î</i>	vir	<i>u-</i>	+	<i>naî</i>	<i>unnaî</i>	der kirin (vir)
<i>t</i>	wir	<i>pe-</i>			<i>pennaî</i>	der kirin (wir) ²⁰¹

Dema em Qertafa dûrahiyê *pe-* "wir" dinêrin nêzî koka cihna *apa* "ew" ye. Jixwe cihna *apa* cihên dîr nîşanî me dide.

Mînak:

Qertafa *-pe: peda:* şandin (**wir**)

Cihna *-apa: apas happiras:* ew bajar

Qertafa navgir

Di hîtîti de bi tenê qertafeke navgir heye, ew jî qertafa *-nîn-*'ê ye. Dema tê hinek lêkeran wek paşgira */nu/'yê*, lêkeran dike rewşa kausatîf (sedemîtî) e.

Tablo 30. Qertafa Navgir -nîn (Hîtîti)

<i>H</i>	Qertafa Navgir				
	<i>Lêker</i>	<i>Wate</i>	<i>Qertaf</i>	<i>Pevghîştin</i>	<i>Wate</i>
<i>î</i>	<i>hark</i>	<i>mehf bûn</i>	-nîn-	<i>harnînk</i>	<i>mehf kirin</i>
<i>t</i>	<i>îstark</i>	<i>nexweş ketin</i>		<i>îstarnînk</i>	<i>nexweş kirin</i> ²⁰²
<i>î</i>	<i>nîk</i>	<i>aciz bûn</i>		<i>nînnînk</i>	<i>aciz kirin</i>
<i>t</i>	<i>sark</i>	<i>kefaret bûn</i>		<i>sarnînk</i>	<i>kefaret dan</i> ²⁰³
<i>î</i>					

Li gorî tabloyê qertafa navgir *-nîn-* dema tê hinek lêkeran wek paşgira */nu/'yê*, lêkeran dike rewşa gerguhêzî de jî.

Qertafa paşgir

¹⁹⁹ Van Den Hout, b.n., r. 115.

²⁰⁰ Cotticelli Kurras, b.n., r. 23.

²⁰¹ Edgar H. Sturtevant, Hittite Etymologies. Language, Press Linguistic Society of America, 1931, r. 1 <https://www.jstor.org/stable/409663> (20.05.2018).

²⁰² Dinçol, b.n., r. 88.

²⁰³ Ünal, b.n., r. 174.

Di hîtîti de navên razber bi alikariya van paşgiran çêdibin.

Tablo 31. Paşgirên Navên Razber Çêdikin (Hîtîti)

Paşgirên Navên Razber Çêdikin					
		<i>Qertafên paşgira</i>			
H î t î t î	<i>hînk</i>	tayinkirin	-an	<i>henkan</i>	qeder, şob, mirin
	<i>nah</i>	tirsin		<i>nahhan</i>	tirs
	<i>îdalû</i>	xirab	-atar	<i>îdalawatar</i>	xirabî
	<i>palhî</i>	fireh		<i>palhatar</i>	firehî ²⁰⁴
	<i>hullaî</i>	şer kirin, li hev dan		<i>hullatar</i>	şer
	<i>sullaî</i>	şer kirin, li hev dan		<i>sullatar</i>	şer
	<i>antuhsa</i>	mirov		<i>antuhsatar</i>	mirovayefî
	<i>lahhiya</i>	derketin sefera		<i>lahhiyatar</i>	rêwîfî, ger, sefera leşkerî ²⁰⁵
	<i>es-/as</i>	rûniştin		-essar	<i>assesar</i>
	<i>hanna</i>	mafwestin, dozlêvekirin	<i>hannesar</i>		doz ²⁰⁶
	<i>uppa</i>	şandin, bir rê kirin	<i>uppessar</i>		şandî, hinartî ²⁰⁷
	<i>palhî</i>	fireh	-astî	<i>palhasî</i>	firehî
	<i>dalukî</i>	dirêj		<i>dalugasî</i>	dirêjî ²⁰⁸
	<i>parku</i>	bilind		<i>pargasî</i>	bilindahî ²⁰⁹
	<i>aniya</i>	bicihanîn, karkirin	-att	<i>aniyatt</i>	kar, xebat
	<i>kartimmiya</i>	xezibîn, qehirîn		<i>kartimmiyatt</i>	xezeb, qehr ²¹⁰
	<i>nahsariya</i>	tirsîn, bizdîn, hurmet girtin		<i>nahsaratt</i>	tirs, xof, hurmet
	<i>tethaî</i>	guregurkirin	-îma	<i>tethîma</i>	guregure esman
	<i>ekuna</i>	sar		<i>ekunîma</i>	sarî
	<i>hahh</i>	ziwa bûn, hişk bûn		<i>hahhîma</i>	ziwayî (riwek), felçkirina tebiyetê
	<i>katkatta</i>	çok danîn		<i>katkattîma</i>	rihelîn, lerizîn, tirs
	<i>kurkuraî</i>	tirsin, veceniqîn		<i>kurkurîma</i>	tirs, veceniqîn
	<i>luk</i>	(agir)pê xistin		<i>lalukkîma</i>	ronî, rewnaqî
	<i>taskupaî</i>	qêrîn		<i>taskupîma</i>	qarîn, qîrîn, hawar
	<i>tuhhaî</i>	fetişin, bêhnçikîn		<i>tuhhîma</i>	tengasiya nefese ²¹¹
	<i>werîte</i>	endîşekirin		<i>weritema</i>	endişe
	<i>assu</i>	baş, qenc		-ul	<i>assul</i>
	<i>asandulaî</i>	dagir kirin	<i>asandul</i>		dagirî
<i>îmmiya</i>	li hev xistin	<i>îmmîul</i>	tevdanî		
<i>îshiya</i>	girêdan, berhev kirin	<i>îshîul</i>	peyman		
<i>pars</i>	şikandin, parçe kirin	<i>parsul</i>	hewrik, kurtêl		
<i>sessariya</i>	hêjandin, seridandin	<i>sesarul</i>	safok, parzûn ²¹³		

²⁰⁴ Lauffenburger, b.n., r. 20.

²⁰⁵ Ünal, b.n., r. 114.

²⁰⁶ Friedrich, b.n., r. 38.

²⁰⁷ Ünal, b.n., r. 114.

²⁰⁸ Dinçol, b.n., r. 59.

²⁰⁹ Ünal, b.n., r. 114.

²¹⁰ Friedrich, b.n., r. 38.

²¹¹ Ünal, b.n., r. 115.

²¹² Lauffenburger, b.n., r. 20.

²¹³ Ünal, b.n., r. 115.

	<i>aniya</i>	bi cih anîn, serketin	-ur	<i>aniur</i>	kare dînî ²¹⁴
--	--------------	-----------------------	------------	--------------	--------------------------

Tablo 32. Bi Qertafên Paşgiran Çêkirina Nomîna Actîons û Aktorîs (Hîtîtî)

Bi Qertafên Paşgiran Çêkirina nomîna actions						
		<i>Qertafên paşgira</i>				
H î t î t î	<i>lînk</i>	sond xwarin	-aî	<i>lîngaî</i>	sond	
	<i>hurta</i>	lanet kirin		<i>hurtaî</i>	lanet, nifir	
	<i>wasta</i>	ketin guneha		<i>wastaî</i>	guneh	
	<i>zah</i>	muxaberekirin		<i>zahhai</i>	şer, muxabere ²¹⁵	
	<i>wasta</i>	gunehkirin	-ul	<i>wastul</i>	guneh	
	<i>unuwai</i>	xeml kirin	-sha	<i>unuwasha</i>	xeml	
	<i>sarnink</i>	ziyan jibartin	-zel	<i>sarninkzel</i>	cirm, xeramet ²¹⁶	
	Bi Qertafên Paşgiran Çêkirina nomîna aktorîs					
			<i>Qertafên paşgira</i>			
		<i>aurî</i>	nobeta sînor	-ala	<i>auriyala</i>	leşkerê sînor ²¹⁷
	<i>uskîsk</i>	temaşekirin	-talla	<i>uskîskatalla</i>	temaşevan ²¹⁸	
	<i>wesiya</i>	çêrîn	-tara	<i>westara</i>	şivan ²¹⁹	
	<i>îspanza</i>	şev ²²⁰	-sepa	<i>îspanzasepa</i>	periya şevê	

Tablo 33. Paşgirên Navên Hacetan Çêdikin (Hîtîtî)

Paşgirên Navên Hacetan Çêdikin					
		<i>Qertafên paşgira</i>			
H î t î t î	<i>kuttar</i>	stu, gerden	-allî	<i>kuttanallî</i>	gerdenî
	<i>harsan</i>	serî		<i>harsanallî</i>	çelenga serî ²²¹
	<i>sesariya</i>	bêjandin	-ul	<i>sesarul</i>	serad ²²²
	<i>kuer</i>	birrîn, jêkirin	-uzzî	<i>kuruzzî</i>	haceta birrîne
	<i>îshiya</i>	girêdan		<i>îshuzzî</i>	qayîş, piştên ²²³

Tablo 34. Paşgirên Piçûker (Hîtîtî)

Paşgirên Piçûker (Dîmînutîve)					
H	<i>Paşgir</i>	-(a)nnî	^d LUGAL-mannî (^d Sarrumannî)	Sarrumayê biçûk/ciwan	
î t î			^d Nînattannî	Peykeroka Xwedawenda Nînattayê	

²¹⁴ Lauffenburger, b.n., r. 20.

²¹⁵ Nomîna actions (navên ku tevgerê îfade dikin). Ünal, b.n., r. 116.

²¹⁶ Dinçol, b.n., r. 60.

²¹⁷ Hoffner & Melchert, b.n., r. 55.

²¹⁸ Friedrich, b.n., r. 39.

²¹⁹ Lauffenburger, b.n., r. 20.

²²⁰ Paul Mirecki and Marvin Meyer (ed.), Magic and Ritual in the Ancient World, Press Brill, Leiden/ Boston/, Köln, 2002, r. 201: <https://books.google.de/books?isbn=9004116761> (27.05.2018)

²²¹ Paşgira **-allî** ev tiştên ku mirov bi devereke wicûdê xwe ve dike an jî ev tiştên ku têkiliyeke wan bi Organên mirov re hene çêdike.. Dinçol, b.n. r. 61.

²²² Lauffenburger, b.n., r. 21.

²²³ Hoffner & Melchert, b.n., r. 61.

t			<i>armannî</i>	heyvik ²²⁴
î		<i>-la</i>	<i>armala</i>	heyvik ²²⁵

Di hîtîti de du paşgirên piçûker hene: paşgira **-(a)nnî û -la**, qertafa **-annî** ji bilî wateya piçûker wateya domdar jî dide. Dema em hinek mînak li gorî wan qertafa bidin yên bi wî awayî çêbibin

happira: bajar, happirannî: bajarok

happirala: bajarok

Paşgira -ant

Piranî peywira vê paşgirê ergatîfê çêdike; lê hinek bi bêjeyan re navê kollektîv û demsalan jî çêdike. Carinan jî navên ku bi paşgira **-ant**'ê hatine dariştin ji aliyê wateyê ve di navbera wan de ti cudabûn çênebûye.²²⁶Jî bilî vê di navbera hinek navên lebatên wicûd û di navbera hinek rengdêrên xwerû û yên ku hatine dariştin de jî ti cudabûn çênabe. Wekî din jî bi paşgira **-ant**'ê ji rengdêrên xwerû û ji navan rengdêrên dariştin.²²⁷

Tablo 35. Paşgira -ant (Hîtîti)

H î t î t î t î			<i>Paşgir</i>			<i>Fonksiyon</i>	<i>Cudabûna wateyê</i>
		<i>tuzzi</i>	artêş	-ant	<i>tuzziyant</i>	temamê artêşê	kollektîva
	<i>hamesh(a)</i>	bihar	<i>hameshant</i>		bihar	demsal	tine ²²⁸
	<i>hastai</i>	hestî	<i>hastiyant</i>		hestî	lebat	tine
	<i>peruna</i>	zinar	<i>perunant</i>		qelaç	rengdêr	heye
	<i>suppi</i>	paqij, zelal	<i>suppiyant</i>		pakij, zelal		tine ²²⁹

Tablo 36. Paşgirên Rengdêran Çêdikin (Hîtîti)

H î t î t î t î	Paşgirên Rengdêran Çêdikin				
			<i>Qerafên paşigira</i>		
	<i>genzu</i>	sempatî	-ala	<i>genuwala</i>	dostanî
	<i>karû</i>	berê	-îli	<i>karuîli</i>	kevn ²³⁰
	<i>îstarn</i>	navîn, ya/yê/yên navê	-îya	<i>îstarnîya</i>	-/ya/yê/yên nivî
	<i>îspant</i>	şev		<i>îspanîya</i>	aîde şevê ²³¹
	<i>zamankur</i>	rî, rih	-want	<i>samankurwant</i>	birî, birih

²²⁴ Friedrich, b.n., r. 41.

²²⁵ Ünal, b.n., r. 122.

²²⁶ Cotticelli-Kurras, b.n., r. 11.

²²⁷ Dinçol, b.n., r. 62-3.

²²⁸ Cotticelli-Kurras, b.n., r. 11.

²²⁹ Dinçol, b.n., r. 62-3.

²³⁰ Friedrich, b.n., r. 41.

²³¹ Paşgira **-îya** ji rengdêr û hokeran, rengdêran çêdike, dibe ku rengdêrên hejmartinê jî çêdike, Hoffner & Melchert, b.n., r. 58, carinan ji bo rengdêrên ku aîdiyêtiyê diyar dikin tê bikaranîn., Dinçol, b.n., r. 63.

	<i>eshar</i>	xwîn		<i>esharwant</i>	bixwîn ²³²
	<i>hant</i>	pêşgeh ²³³	<i>-zî/zzî(ya)</i>	<i>hantezzî(ya)</i>	yekem, pêşîn ²³⁴
	<i>appa</i>	paş ²³⁵		<i>appezzî(ya)</i>	herî paş/dawî ²³⁶
	<i>sara</i>	joi ²³⁷		<i>sarazzî(ya)</i>	herî joi ²³⁸

Paşgira etnîsîte -umna/-uma-

Di paşgira *-umna* de dengê *mn*'yê asîmileyî dengê *m*'yê bûye, paşgir bûye *uma*.²³⁹ Ev paşgir ,li ser koka etnîsîte hatiye sazkerin. Digel vê piranî navên cihê ku yek jê dide nîşan.²⁴⁰

Tablo 37. Bi paşgira -uma/umna Etnîsîte Navên Cihan (Hîtîti)

H î t î t î	<i>Cih</i>		<i>Paşgir</i>	<i>Etnîsîte navên cih</i>	
	URU <i>Hattusa</i>	Bajarê Hattusa	<i>-uma /-umna</i>	URU <i>Hattusumna</i>	Kesê/a/ ji Hattusa/ Hattusayî
	URU <i>Pala</i>	Bajarê Pala		URU <i>Palaumna</i>	Kesê/a ji Pala/Palayî ²⁴¹
	URU <i>Nesa</i>	Bajarê Nesa ²⁴²		LU ^{MEŠ} URU <i>Nesumenes</i>	Xelkê/a /Mirovê/a Nesa ²⁴³

Dema em mînakên tabloyê dinêrin paşgira etnîsîte wateya kesê bajarê lê çêbûya dide. Em ê hinek mînakan li gorî bajarên dema xwe bidin.

Edenuma : Kesê/a/ ji Edene/Edeneyî

Mêrdînuma : Kesê/a/ ji Mêrdînê

Wanuma : Kesê/a/ ji Wanê/Wanî

Bedlîsuma : Kesê/a/ ji Bedlîsê/Bedlîsî

Paşgira -îlî

²³² Paşgira *-want* carinan ji bo *rengdêrên xwedîtiyê diyar bikin tê bikaranîn*, Friedrich, b.n., r. 41. *Ji bo rengdêrên xwedîtiyê mînak: duskarawant "kêfxweş, dillxweş"* Hoffner & Melchert, b.n., r. 61., *dema ku paşgira -want piştî tîpa "u"yê tê dibe -mant. Mînak: nekumant" tazî, rût"*. Friedrich, b.n., r. 41.

²³³ Dinçol, b.n., r. 64.

²³⁴ Hoffner & Melchert, b.n., r. 61.

²³⁵ Dinçol, b.n., r. 64.

²³⁶ Hoffner & Melchert, b.n., r. 61.

²³⁷ Dinçol, b.n., r. 64.

²³⁸ Hoffner & Melchert, b.n., r. 61.

²³⁹ Dinçol, b.n., r. 64.

²⁴⁰ Hoffner & Melchert, b.n., r. 60.

²⁴¹ Friedrich, b.n., r. 41.

²⁴² Cyril Brosch, *Untersuchungen Zur Hethitischen Raumgrammatik (Topoi. Berlin Studies of the Ancient World)*, Verlag De Gruyter, Berlin/Boston, 2014. r. 78.

²⁴³ Lauffenburger, b.n., r. 22.

Ev paşgir ji bo rengdêran²⁴⁴ û bi taybetî ji bo hokeran tê bikaranîn.²⁴⁵ Her wiha ji bo terîfkirina zimanan jî dihat bikaranîn,²⁴⁶ dema ku bi paşgira **-îlî** bi paşgira etnîsîta **-umna** re tê bikaranîn dibe **-umnîlî** û zimanê cihê ku jê nîşanî me dide.²⁴⁷

Minak: ^{URU}*Nisîlî/nasîlî* û *nesumnîlî* " zimanê bajarê Nesa, li Hîtîtê, ^{URU}*palaumnîlî* "zimanê pala" li Pala.²⁴⁸

Tablo 38. Bi Paşgira -îlî Çêkirina Navên Zimanan (Hîtîtî)

H î t î t î	<i>Dewlet</i>	<i>Paşgir</i>	<i>Ziman</i>	
	Hattî	-îlî	<i>hattîlî</i>	zimanê hattî
	Hurrî		<i>hurîlî</i>	zimanê hurrî
	Lûwî		<i>lûwîlî</i>	zimanê lûwî ²⁴⁹

Di hîtîtî de paşgira ku zimanan terîfdike paşgira **-îlî**, nêzî paşgira **-î**ya kurmancî ye.

Mînak:

kurdîlî	kurdî
tirkîlî	tirkî
farisîlî	farisî

Paşgirên lêkeran çêdikin

Lêkerên hîtîtî, an ji koka lêkerê an jî koka nav û rengdêrê pêk tên. Bi wî awayî tên çêkirin:²⁵⁰

Tablo 39. Paşgirên Lêkeran Çêdikin (Hîtîtî)

H î t î	Paşgirên Lêkeran Çêdikin		
	<i>Paşgir</i>	<i>Kok</i>	<i>Fonksiyon</i>
	-ahh	rengdêr	factîf (aktîf) " kirin" ²⁵¹
	-annaî	lêker	duratîf (bênavber/domdar) ²⁵²
-ess	rengdêr	fientîf (dînamîk) " bûn "	

²⁴⁴ Coticelli-Kurras, b.n., r. 11.

²⁴⁵ Lauffenburger, b.n., r. 89.

²⁴⁶ Van Den Hout, b.n., r. 142.

²⁴⁷ Lauffenburger, b.n., r. 89.

²⁴⁸ Hoffner & Melchert, b.n., r. 292.

²⁴⁹ Lauffenburger, b.n., r. 89.

²⁵⁰ Yigal Bloch, Verbs in Hittite: *Verb-forming auxiliary suffixes*, The Hebrew University of Jerusalem, 2010, r. 1: limudbchevruta.wiki.huji.ac.il/images/Verbal_inflection.doc (3.6.2018).

²⁵¹ Hoffner & Melchert, b.n., r. 175.

²⁵² Dinçol, b.n., r. 88.

t î	-nu	lêker- rengdêr	kausatîf " sedemîtî/dançêker" (lêker), factîf (aktîf) " kirin" (rengdêr) ²⁵³
	-ssa	lêker	îteratîf (bênavber/domdar) ²⁵⁴
	-sk/e		

Li gorî vê tabloyê hinek paşgir him tèn koka rengdêran him jî tèn koka lêkeran, hinek jî tèn koka herduyan. Dema ev paşgir tèn koka rengdêr û lêkeran wateya **kirin**, **bûn**, **sedemîtî**, **bênavber** didin.

Tablo 40. Mînakên Paşgirên lêkeran çêdikin (Hitîfî)

	<i>Paşgir</i>	<i>Mînak</i>	
H î t î t î t î	-ahh	<i>îdalû</i> xirab <i>îdalawahh</i> xerab kirin	3-ya, (teriya) sêcar 3- <i>yahh</i> sêcar kirin ²⁵⁵
	-annaî	<i>îya</i> çûn <i>îyannaî</i> bênavber çûn	<i>walh</i> lêxistin <i>walhannaî</i> bênavber lêxistin
	-es	<i>sallî</i> mezin <i>salles</i> mezin bûn	<i>mekki</i> pîrr/zêde <i>makes</i> pîrr/zêde bûn ²⁵⁶
	-nu	<i>lînk</i> sond xwarin, <i>lînganu</i> peyman çê kirin	<i>hark</i> mehf bûn <i>harganu</i> mehf kirin ²⁵⁷
	-ssa	<i>îya</i> çêkirin <i>essa</i> bênavber çêkirin ²⁵⁸	<i>halzaî</i> ban kirin <i>halzessa</i> bênavber ban kirin ²⁵⁹
	-sk/e	<i>hatraî</i> nivîsandin <i>hatresk</i> bênavber nivîsandin	<i>punus</i> pîrsîn <i>punusk</i> bênavber pîrsîn

Dema em li tabloyê dinêrin paşgira **-ahh**'ê tê wateya " kirine" rengdêran ji rewşa pasîf dixê rewşa lêkerên aktîf û gerguhêz de. Mînak: *assu*: baş/qenc , *assuwahh*: baş kirin. Paşgirên **-annaî**, **-ssa** û **-ske** tèn lêkeran û wateya bênavber û domdarî didin lêkeran. Paşgira **-nu** wateya " sedemîtî " dide lêkeran û wan ji rewşa negerguhêzî dixê rewşa gerguhêzî de. Mînak: *îstark*: nexweş ketin, *îstarnu*: nexweş kirin. Herwiha paşgira **-ess** tê wateya " bûne " ji koka rengdêran lêkeran çêdike û lêkerên wê jî dînamîk in, yanê di lêkerê de geşdanek çêdibe. Mînak: *îdalû*: xirab, *îdalawes*: xirab bûn, *sallî*: mezin , *salles*: mezin bûn.

²⁵³ Hoffner & Melchert, b.n., r. 175.

²⁵⁴ Dinçol, b.n., r. 89.

²⁵⁵ Hoffner & Melchert, b.n., r. 176.

²⁵⁶ Lauffenburger, b.n., r. 46.

²⁵⁷ Paşgira **-nu**'yê lêkeran dike avaniya dançêker. Mînak: *lêkara -ar* "gihastin" -*arnu* "gihandin" û tê wateya "bar kirin, teslim kirin" jî, Şafak Bozgun, Tiliura Kenti ve III. Hattusîli'nin Tiliura Halkına Buyruğu, Ankara Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Teza Masterê ya çapnebûyî, Ankara, 2013. r. 67-8. hw. Paşgira **-nu**'yê hincaran wek paşgira "ahh"ê ji kokên rengdêran, lêkerên ku tèn wateya "kirine" çêdike. Mînak: *malîsku*: zeîf, *malîskunu*: zeîf kirin, *dassu*: biqewet, *dassanu*: biqewet kirin, Dinçol, b.n., r. 89.

²⁵⁸ Di peyva "îya"yê de tengbûn çêbûye, "îya" bûye "e", Bloch, b.n., r. 1.

²⁵⁹ Dinçol, b.n., r. 90.

1.3.2.2. Di Kurmancî De Qertafên Pêşgir, Navgir û Paşgir

Di kurmancî de hinek qertaf tên nava peyvan , hinek jî tên pêşî û paşîya peyvan, qertafên ku tên pêşîya peyvan jê re pêşgir dibêjin, qertafên ku tên nava peyvan jê re navgir dibêjin, qertafên tê paşîya peyvan jî jê re paşgir dibêjin.²⁶⁰

Qertafên Pêşgir

Qertafên pêşgir bi piranî lêkeran çêdikin; lê pêşgirên ji navan navan û ji lêkeran navan jî çêdikin hene.²⁶¹ Hinek pêşgirên ku lêkeran çêdikin ev in:

Tablo 41. Pêşgirên Lêkeran Çêdikin (Kurmancî)

	Pêşgirên Lêkeran Çêdikin				
	<i>Pêşgir</i>	<i>Yên ji lêkeran-lêkeran çêdikin</i>			
K u r m a n c î	ba-	kirin	bakirin	dayin	badan
	çê-	kirin	çêkirin	bûyîn	çêbûn
	da-	kirin	ðakirin	ketin	ðaketin ²⁶²
	der-	ketin	derketin	xistin	derxistin
	hil-	anîn	hilanîn	dan	hildan ²⁶³
	ra-	ketin	raketin	xistin	raxistin
	ro-	kirin	rokirin	bûn	robûn
	rû-	kirin	rûkirin	niştin	rûniştin
	ve-	kirin	vekirin	dan	vedan
	wer-	girtin	wergirtin	bûn	werbûn ²⁶⁴
	pêş-	ketin	pêşketin	xistin	pêşxistin ²⁶⁵

Di tabloyê de tê xuyakirin ev pêşgir ji lêkeran lêkeran darişîn û piranî ji lêkera kirin û ketine lêkeran darişîn. Ew pêşgir berî qertafên deman tên pêşîya lêkeran.

Mînak:

Ezê sibê mehîre çê-bi-k-im.

çê- pêşgira lêkera ye.

bi- qerafa dema bê ye.

k- koka lêkera kirine ye.

im- qertafa cihnavên kesîn e.

²⁶⁰ Samî Tan, Waneyên Rêzimana Kurmancî: Weş. Welat, Stenbol, 2000, r. 25.

²⁶¹ Avcıkıran (ed). , b.n., r. 22.

²⁶² Aktuğ, b.n., r. 86.

²⁶³ Baran Rizgar, Uygulamalı Kürtçe Dersleri /Dersen Kurdî, Doz yayınlari çapa duyem, İstanbul, 2012. r. 325-6.

²⁶⁴ Taş, b.n., r. 183.

²⁶⁵ Kurdo, b.n., r. 166.

Tablo 42. Pêşgirên Rengdêran Çêdikin (Kurmancî)

Pêşgirên Rengdêran Çêdikin				
K u r m a n c î	<i>Pêşgir</i>	<i>Yên ji navan-rengdêran çêdikin</i>		
	bi-	av	biav	deng bideng
	bê-	nav	bênav	war bêwar
	<i>Pêşgir</i>	<i>Yên ku ji rengdêran-rengdêran çêdikin</i>		
	ne-	xweş nexweş	baş	nebaş ²⁶⁶

Pêşgira **bê-** û **ne-** ji bilî dariştina rengdêran, wateya nerênî jî dide peyvan.

Qertafên Navgir

Di kurmancî de navgir dikeve navbera du peyvan û wan peyvan digihînin hev, ji wan peyveke nû diafirîne.²⁶⁷ Navgirên Kurmancî ji **-a-**,²⁶⁸ **-e-**, **-o-**, **-an-**²⁶⁹ û ji navgira **-û-** 'yê pêk tê.²⁷⁰

Tablo 43. Qertafên Navgiran (Kurmancî)

Kurmancî		
	Qertafên Navgira	
şewitîn şewat	-a	xebitîn xebat ²⁷¹
darebî	-e	kurtenivîs ²⁷²
seranser	-an	beranber
serobino ²⁷³	-o	girodarî ²⁷⁴
gotûbêj	-û	darûbest ²⁷⁵

Qartafên Paşgir

Di kurmancî de paşgir zêde ne, paşgirên ku nav û rengdêran çêdikin ji yê ku lêkeran çêdikin zêdetir in,²⁷⁶ Hinek mînakên paşgiran ev in:

²⁶⁶ Ocek, b.n., r. 39-40.

²⁶⁷ Ocek, h.b., r. 43.

²⁶⁸ Tan, Waneyên Rêzimana..... r. 41.

²⁶⁹ Abdullah Karabax, Rêzimana Kurdî ya Kurmancî, Lozan, 2013, r. 22-3: [https://gomanweb.org/GOMANWEB2/Sonradan Eklenerler/kurdi-yeni/ Reziman.pdf](https://gomanweb.org/GOMANWEB2/Sonradan%20Eklenerler/kurdi-yeni/Reziman.pdf) (05.03. 2018).

²⁷⁰ Bakır, b.n., , r. 62.

²⁷¹ Navgira "a"yê ji lêkeran navan çêdike, Tan, b.n., r. 74.

²⁷² Tan, Waneyên Rêzimana..... r. 41.

²⁷³ Ocek, b.n., r. 44.

²⁷⁴ Karabax, b.n., r. 39.

²⁷⁵ Bakır, b.n., r. 62.

²⁷⁶ Tan, b.n., r. 69.

Tablo 44. Paşgirên Navên Hacêtan Çêdikin (Kurmancî)

K u r m a n c î	Paşgirên Navên HacetaN Çêdikin			
	<i>Paşgir</i>	<i>Mînak</i>		
	-ar	xerar	guhar	<i>Ji navan- navan çêdike</i>
	-dan(k)	çaydan(k)	guldan(k)	
	-ek	badek ²⁷⁷	pêçek	<i>Ji lêkeran- navan çêdike</i> ²⁷⁸
	-ing	bêjing	parzing	
-ok/şok	gazok	amanşok	<i>Ji navan- navan çêdike</i> ²⁷⁹	

Bi Rengdêr û Paşgiran Piçûker (dimînutive)

Dema tiştek bi biçûkirinê bê terîfkirin, an bi rengdêrên wek **biçûk**, **hûr**, an jî paşgirên wek **-ik**, **-ng/ing**,²⁸⁰ **-ek**, **-kok**, **-kole**,²⁸¹ **-o**, **-ok**, **-or**, **-oke**, **-ole**, **-oyî**, **-înok**, **-îtik**,²⁸² **-ê**, **-çe**, **-uk**'ê tên çêkirin.²⁸³

Tablo 45. Bi Rengdêran Piçûker (Kurmancî)

K u r m a n c î	Bi Rengdêran Piçûker	
	<i>Rengdêr</i>	<i>Mînak</i>
	biçûk	gundê piçûk
	hûr	gire hûr ²⁸⁴

Dema em hinek peyvan li gorî rengdêrên biçûker û li gorî paşgirên biçûker bidin yên bi awahî çêbin.

Mînak:

Bajarê **piçûk** (Bi rengdêrê biçûker)

Bajarok (bi paşgirê biçûker)

²⁷⁷ Yıldırım, b.n., r. 208.

²⁷⁸ Tan, Waneyên Rêzimana... r. 42.

²⁷⁹ Yıldırım, b.n., r. 208.

²⁸⁰ Kemal Badilli, Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri (Kurmançça Lehçesi), weş Ankara Basım ve Ciltevi, Ankara, 1965, r. 43: <https://www.kurdipedia.org/docvieWer.aspx?id=85254&document=0001.PDF> (7.6.2018)

²⁸¹ Zagrosê Haco, Rêzimana Kurdî, r. 100: buyerpess.com/kurdi/.../Rêzimana-Kurdî-_-Zagros-Haco.p... (7.6.2018).

²⁸² Yıldırım, b.n., r. 211.

²⁸³ Karabax, b.n., r. 43.

²⁸⁴ Badilli, b.n., r. 44.

Tablo 46. Bi Paşgiran Biçûker (Kurmancî)

K u r m a n c î	Bi Paşgiran biçûker	
	<i>Paşgir</i>	<i>Mînak</i>
	-ek	mîrek
	-kok	xweşkok
	-kole	reşkole ²⁸⁵
	-ik	keçik, mêrik, darik
	-ng/ing	xwenga/xweyinga min ²⁸⁶
	-o	xwaro, xapo, zero
	-ok	axayok, mirovok, seyok,
	-oke	şiloke
	-ole	zirtole
	-or	gulor
	-oyî	pesnoyî, şeroyî
	-înok	xapînok
	-îtik	bangerîtik ²⁸⁷
	-ê	hirçikê, karike, pirîkê
	-çê	baxçê, navçê, nivçê
	-ko	cîranko, hevalko, memko
	-uk	kuruk ²⁸⁸

Tablo 47. Paşgirên Navên Razber Çêdikin (Kurmancî)

K u r m a n c î	Paşgirên Navên Razber Çêdikin			
	<i>Paşgir</i>	<i>Mînak</i>		
	-ahî/ayî/awî	dirêj dirêjahî/ dirêjayî	dûr dûrahî	ewr ewrayî/ewrawî ²⁸⁹
-anî	mêr mêranî	mêh mehanî	roj rojanî ²⁹⁰	

Tablo 48. Paşgirên Ji Navan Navan Çêdikin (Kurmancî)

K u	Paşgirên Ji Navan Navan Çêdikin	
	<i>Paşgir</i>	<i>Mînak</i>

²⁸⁵ Haco, b.n., r. 100.

²⁸⁶ Badilli, b.n., r. 44.

²⁸⁷ Yıldırım, b.n., r. 211.

²⁸⁸ Karabax, b.n., r. 43-4.

²⁸⁹ Paşgira **-ahî/ayî/awî** di vir de /h/, /y/ û /w/ dengdarên alîkar in, ketine navbera dengdêrên /a/ û /î/'yê peywira kelijandinê kirine, li vir qertafa paşgir a bingehî dengdêra /î/'yê ye, Tan, b.n., r. 69.

²⁹⁰ Rizgar, b.n., r. 330.

r m a n c î	-e	xan	xane	dest	deste
	-çe	nav	navçê	xalî	xalîçê ²⁹¹
	-ik	kêr	kêrik	dar	darik
	-il	zeng	zengil	çep	çepil ²⁹²
	-istan	gul	gulistan	dar	daristan ²⁹³
	-xane	derman	dermanxane	xwarin	xwarinxane
	-tî	bira	biratî	axa	axatî
	-van	aş	aşvan	ga	gavan ²⁹⁴

Tablo 49. Paşgirên Ji Navan Rengdêran Çêdikin (Kurmancî)

K u r m a n c î	Paşgirên Ji Navan Rengdêran Çêdikin				
	<i>Paşgir</i>	<i>Mînak</i>			
	-a	bez	beza	rew	rewa ²⁹⁵
-ek	vir	virek ²⁹⁶	tir	tirek ²⁹⁷	
-kî	dev	devkî	nivîs	nivîskî ²⁹⁸	
-nak	derd	derdnak	xem	xemnak	
-wer	bext	bextewer	bîr	bîrewer ²⁹⁹	
-wî	ba	bawî	ta	tawî ³⁰⁰	

Tablo 50. Paşgirên Ji Rengdêr û Lêkeran Navan Çêdikin (Kurmancî)

K u r m a n c î	Paşgirên Ji Rengdêran Navan Çêdikin				
	<i>Paşgir</i>	<i>Mînak</i>			
	-çe		nû		nûçe
-ayî		germ		germayî	
-înc		sar		sarînc	
Paşgirên Ji Lêkeran Navan Çêdikin					
<i>Paşgir</i>	<i>Mînak</i>				
-a		hatin		hatina mêvanan	
-ar		kirin		kirar	
-ek		badan		badek	
-ok		zarîn		zarok ³⁰¹	

Paşgira -î

Di kurmancî de pirr peywirê paşgira -î'yê hene, wateya mensubiyet û aîdatê

²⁹¹ Aktuğ, b.n., r. 80.

²⁹² Tan, b.n., r. 71-72.

²⁹³ Aktuğ, b.n., r. 82.

²⁹⁴ Rizgar, b.n., r. 336.

²⁹⁵ Ocek, b.n., r. 40.

²⁹⁶ Aktuğ, b.n., r. 84.

²⁹⁷ Taş, b.n., r. 28.

²⁹⁸ Tan, b.n., r. 71.

²⁹⁹ Rizgar, b.n., r. 334-6.

³⁰⁰ Aktuğ, b.n., r. 84.

³⁰¹ Aktuğ, h.b., r. 89-90.

dide³⁰² û ji navan navan, ji lêkeran rengdêran, ji hokeran navan, ji rengdêran navan çêdike. Taybetiyeke wê ya din jî zimanan pêk tîne.³⁰³ Di zaravayên kurdî yê din û farisî û hinek Zimanên Koma Îranî de jî bi vî şiklî dihat bikaranîn: Di zimanê pehlewî û partî de bi şiklê /ih/, di avestayî û akamenî de jî bi şiklê /ye/- /vehye/ dihat bikaranîn.³⁰⁴

Tablo 51. Paşgira -î- (Kurmancî)

K u r m a n c î	Paşgira -î-				
	<i>Ji navan-çêkirina navan</i>	ser	serî	nêr	nêrî ³⁰⁵
	<i>Ji rengdêran-çêkirina navan</i>	tehl	tehlî	tûj	tûjî ³⁰⁶
	<i>Ji lêkeran-çêkirina rengdêran</i>	ket	ketî	hat	hatî ³⁰⁷

Tablo 52. Paşgira -î-, Mensûbiyata Cih û Zimanan (Kurmancî)

K u r m a n c î	Cih	Paşgir	Mensûbiyeta cih
	Mêrdîn	î	Mêrdînî
	Semsûr		Semsûrî
	Sêrt		Sêrtî
	Serhed		Serhedî
	Qafqas		Qafqasî
	Gel	Paşgir	Ziman
	Kurd	-î	kurdî
	Tirk		tirkî
	Îngiliz		îngilizî
Alman	almanî		
Faris	farisî		
Ereb	erebî ³⁰⁸		

Paşgira -î- ji bilî peywirên wê yê ku di tabloyê de hatine diyar kirin, hinek peywirên wê din jî hene. Yek ji wan navên eşira dide nîşan.

Mînak:

³⁰² Rizgar, b.n., r. 333.

³⁰³ Tan, b.n., r. 71.

³⁰⁴ Muhammed Husein, Peyvsazî di zimanê kurdî de, 2016, <https://zimannas.files.wordpress.com/2016/08/peyvsazi-kiteb1.pdf> (9.6.2018).

³⁰⁵ Ocek, b.n., r. 41.

³⁰⁶ Tan, b.n., r. 71.

³⁰⁷ Mînak: "ket -ketî" min Casimê ketî dît, "mir-mirî" Qasmê mirî hate bîra min, Aktuğ, b.n, r. 84.

³⁰⁸ Tan, h.b., r. 71.

Mihimid zaxuranî bû.
Hisenkê omerî .
Diya Silêman heştrekî bû.

Paşgira -în û -andin

Di kurmacî de bi paşgira *-in* û *-andin* nav, rengdêr, lêker û peyvên ku ne bi kurdî tên çêkirin. Lêkerên negerguhêz bi paşgira *-în* lêkerên gerguhêz jî bi paşgira *-andin* tene çêkirin. Wek paşgirên *-ijîn/ijandin*, *-isîn/isandin*, ji binyada xwe ve têkildarî *-în* û *-andin* 'ê ne.³⁰⁹

Tablo 53. Paşgira -în û -andin (Kurmacî)

K u r m a n c î		Paşgira -în		Paşgira -andin	
		<i>Ji navan- çêkirina lêkeran</i>	fir	firîn	fir
	<i>Ji rengdêran- çêkirina lêkeran</i>	xemil	xemilîn	xemil	xemilandin
	<i>Ji lêkeran- çêkirina lêkeran</i>	ponij	ponijîn	ponij	ponijandin
	<i>Ji kokên peyvên biyanî-çêkirina lêkeran</i>	fikir	fikirîn	fikir	fikirandin

Dema em li tabloyê dinêrin paşgira **-andin** ji bilî dariştina peyvan peywireke wê din jî heye. Dema tê lêkerên negerguhêz wan dixê halê gerguhêzî de. paşgira **-în** jî tê lêkerên negerguhêz.

Mînak:

Lêkera gerguhêz	Lêkera negerguhêz
Keçikên gund bûk xemil andin .	Ji kêfa fir în .

Ji aliyê peyvsaziyê ve nuqtayên hevbeş:

- Di hîtîti û kurmacî de cureyên peyvan bi sê şiklan pêk tê: Peyvên xwerû, pêkhatî û hevedudanî.
- Di hîtîti û kurmacî de koka hinek peyvan bi van tîpan bidawî dibin: /a/, /î/, /û/, /t/, /r/.

Hîtîti

Kurmacî

³⁰⁹ Ocek, b.n., r. 43.

	KDB
<i>antuhsa</i> (mirov, zilam)	kola
<i>halkî</i> (dexl, zad)	derizî
<i>assu</i> (baş, qenc)	çû
<i>neku</i> (êvar)	dirût
<i>kîssar</i> (dest)	xwar

- c) Hîfîtî û kurmancî de peyv bi vî şiklî qertafan digirin: Qertafên pêşgir, navgir û paşgir.

Hîfîtî	Kurmancî
Pêşgir: <i>uda</i> (anîn vir)	daketin
Navgir: <i>harnînk</i> (mehf kirin)	kurtenivîs
Paşgir: <i>genuwala</i> (dostanî)	navçe

- a) Qertafên hîfîtî û kurmancî bi piranî ji paşgiran pêk tên, ji aliyê navgiran ve pêş neketine.

- b) Di hîfîtî û kurmancî de qertafa navên zimanan pêk tîne heye. Di hîfîtî de bi paşgira /**îlî**/, di kurmancî de bi paşgira /**î**/.

Hîfîtî	Kurmancî
<i>hurîlî</i> (zimanê hurrî)	kurdî (zimanê kurdî)

- c) Di hîfîtî û kurmancî de qertafa ku mensûbiyeta cih nîşan dide heye. Di hîfîtî de bi paşgira /**umna-uma**/, di kurmancî de bi paşgira /**î**/.

Hîfîtî: ^{URU} *Hattusumna* (kesê Hattusayî/ kesê ji Hattusa)

Kurmancî: Mêrdînî (kesê Mêrdînî/kesê ji Mêrdînê)

- d) Qertafên bêjesaz di hîfîtî de qertafa **at(t)**ê û di kurmancî de qertafa - **(a)tî/(î)tî** nêzî hevin.

Hîfîtî	Kurmancî
<i>karuîlîyat</i>	kalîfî

Ji aliyê peyvsaziyê ve nuqtayên cuda

- e) Kumancî ji aliyê pêşgiran ve ji hîfîtî pêşketîre: Pêşgîrên hîfîtî ji du pêşgiran pêk tên. Yê kurmancî ji duduyan bêhtir pêk tên.

2. NAV, CÎHNAV, RENG DÊR

2.1. Nav

Nav, ew tiştên bi mirovan dide nasîn, ew tişt dixwazê giyanwer û ne giyanwer be, an jî razber û şênber be û ew tişt dixwazê serenav be an jî navê komekê be.³¹⁰ Bi kurtasî nav: Her tişteki naveki xwe heye, bi riya nav em wan tiştan nas dikin.³¹¹ Mînak: jin, zozan, bawerî, welat.³¹²

2.1.1. Li Gorî Hejmarê Nav

Nav li gorî hejmarê ji navên yekjimar, pirjimar û komjimar pêk tê.³¹³

2.1.1.1. Di Hîtîfî De Navên Yekjimar, Pirjimar û Komjimar

Di hîtîfî de du hejmar hene: Yekjimar û pirjimar.³¹⁴ Her wiha, pirjimarî di halê nomînatîf û akkusâtîf commune de pirjimareke belavkar e.³¹⁵ Nom. Pl. c. *es-*, Akk. Pl. c. *us* Mînak: Peyva " *alpa* " Nom. Pl. c. *alpes* " ewran " Akk. Pl. c. *alpus* " ewran ".³¹⁶

Herwiha, di hîtîfî de navên komjimar jî di halê nomînatîf û akkusâtîf neutrum pirjimar de tê bikaranîn. Nom. -Akk. n. *-a, -î, -Ø* û bi paşgiran *-ant* hwd. Mînak: Peyva *alpa* Nom.-Akk. Pl. n. *alpa* " koma ewra "

Tablo 54. Yekjimar, Pirjimar û Komjimar (Hîtîfî)

H î t î t î	<i>Yekjimar</i>	<i>anna</i> (dayik), <i>îsha</i> (mîr) <i>halhaltumarî</i> (kevirê goşe)
	<i>Pirjimar</i>	<i>annis</i> (dayikan), <i>îshes</i> (mîran) <i>halhaltumares</i> (kevirên goşe) ³¹⁷
	<i>Komjimar</i>	<i>utne</i> (welat), <i>utneyant</i> (koma welatan) <i>antuhsatar</i> (mirovahî) <i>antuhsamant</i> (nifûs). ³¹⁸

³¹⁰ Tan, Waneyên Rêzimana.... r. 39.

³¹¹ Taş, b.n., r. 84.

³¹² Yıldırım, b.n., r. 187.

³¹³ Aktuğ, b.n., r. 208.

³¹⁴ Brosch, b.n., r. 19.

³¹⁵ P. Streck, b.n., r. 88.

³¹⁶ Rieken, b.n., r. 44.

³¹⁷ Lauffenburger, b.n., r. 25-6.

³¹⁸ Friedrich, b.n., r.40.

2.1.1.2. Di Kurmancî De Navên Yekjimar, Pirjimar û Komjimar

Di kurmancî de hejmar bi alîkariya van qertafan diyar dibe: qertafên lêkerê, qertafên tewang û veqetandekê.³¹⁹

Tablo 55. Yekjimar, Pirjimar û Komjimar (Kurmancî)

K u r m a n c î	<i>Yekjimar</i>		pênûs, mase, mih, hesp, mehîn, jin, mêr
	<i>Pirjimar</i>	Bi qertafa tewangê -an	pênûsan, maseyan, jinan, mêran ³²⁰
	<i>Yekjimar</i>		dar, çiya, heval
	<i>Pirjimar</i>	Bi qertafa veqetandekê -en	darên behîvê, çiyayên bilind, hevalên baş ³²¹
	<i>Yekjimar</i>		min sêv xwar, heval hat
	<i>Pirjimar</i>	Bi qertafa lêkerê -in	min sêv xwarin, heval hatin ³²²
	<i>Komjimar</i>	-	artêş, gel, malbat, garan, pez ³²³

2.1.2. Ji Aliyê Zayendê Ve Nav

Nav ji aliyê zayendê ve ji sê cureyan pêk tê: Navên nêtar, nêr û mê.³²⁴ Di hin zimanan de him zayenda rêzîmanî him jî ya siruştî (biyolojik) heye. Ji van zayendan ya siruştî di hemû zimanan de heye, zayenda siruştî ji mirov û ajalan pêk te, ji van hin nêr in û hin jî mê ne. Zayenda rêzîmanî (zayenda derewîn) di hinek zimanan de heye, di hinekan de jî nîn e.³²⁵

2.1.2.1. Di Hîtîti De Zayenda Siruştî û Nêtar

Tablo 56. Navên Nêr, Mê û Nêtar (Hîtîti)

H î t î t î	Navên nêr		Navên mê		Navê Nêtar	
	<i>atta</i>	bav	<i>anna</i>	dayik	<i>kallar</i>	felaket/tofan
	<i>îsha</i>	beg	<i>îshasara</i>	xatûn	<i>kard</i>	qelb ³²⁶

Navên siruştî ji ber ku tiştekî siruştî ye zayenda wan diyar e. Dema em bêjin

³¹⁹ Ocek, b.n., r. 90.

³²⁰ Aktuğ, b.n., r. 209-10.

³²¹ Samur (2012), b.n., r. 55.

³²² Ocek, b.n., r. 91.

³²³ Taş, b.n., r. 86.

³²⁴ Yıldırım, b.n., r. 29.

³²⁵ Taş, b.n., r. 86.

³²⁶ Rieken, b.n., r. 231-3.

hassu (qral) em zanîn zayenda wê nêr e an jî em bêjin *hassusara* (qralîçê) em zanîn zayenda wê mê ye.

2.1.2.2. Di Hîtîtî de Zayenda Rêzîmanî

Zimanê hîtîtî,³²⁷ xwediyê du zayendan bû: zayenda hevparî (mê û nêr) û ya bêzayendî.³²⁸ Hîtîtiyan bi determînatîfa mêr û jinê, zayend diyar dikirin, determînatîf didanîn pêşî û paşîya navên şexsa, bi vî şiklî zayenda navan dihat diyarkirin.³²⁹

2.1.2.3. Di Kurmancî De Zayenda Siruştî û Nêtar

Tablo 57. Navên Nêr, Mê û Nêtar (Kurmancî)

Kurmancî							
<i>Navên Nêr</i>	mêr	kur	bira	ap	xal	beran	ga
<i>Navên Mê</i>	jin	keç	xwişk	met	xaltîk	mih	çelek ³³⁰
<i>Navên Nêtar</i>	mamoste	heval	nivîskar	dengbêj ³³¹	hirç	kew	pisîng ³³²

Di navên siruştî de zayenda navê mê û nêr diyar in. Dema yek bêje kuram, bav, bira, bapîr yek zane zayenda wan nêr e û dema yek bêje dotmam, keçxal, dapîr yek zane zayenda wan mê ye. Zayenda navên nêtar ne diyar e . Yek kare navên nêtar bi alîkariya peyvên nêr û mê zayenda wan diyar bike.

Mînak:

Kerê nêr/kerê mê

Hinek navên nêtar jî bi alîkariya veqetandek û tewangê zayenda wan tê diyar kirin.

Mînak:

Bijîşkê min/bijîşka min

³²⁷ *Ev mijar, di beşa yekemîn de mijara ziman de berfirehî hatiye rave kirin, bnr.*

³²⁸ Lauffenburger, b.n., r. 23.

³²⁹ Koç, b.n., r. 19.

³³⁰ Tan, b.n., r. 104.

³³¹ Taş, b.n., r. 87.

³³² Tan, Waneyên Rêzimana...r. 43.

2.1.2.4. Di Kurmancî de Zayenda Rêzîmanî

Di zayenda kurmancî de nav di bingeha xwe de ne xwediyê ti zayendê ye, zayenda navan bi alîkariya qertafên veqetandek û tewangê tê diyarkirin.³³³ Nedyariya navan jî bi alîkariya van qertafên nediyar çêdibin: **-ek** (yekjimar) û **-in** (pirjimar).³³⁴ Dema qertafên nediyariyê **/ek/ û /in/** tîn pêşiya qertafên veqetandek û tewangên yên diyarkirî, qertafên veqetandekê yên diyarkirî (yekjimar) **/a/ û /ê/**, (pirjimar) **/ên/** dibin **/eke/ û /ekî/**, **/ine/**, bi vî awayî veqetandekên nediyarkirî çêdibin, qertafên tewangê yên diyarkirî (yekjimar) **/ê/ û /î/**, (pirjimar) **/an/** dibin **/ekê/ û /ekî/**, **/inan/** bi vî awayî jî tewangên nediyarkirî çêdibin.³³⁵ Û bi alîkariya qertafên wan yên yekjimar jî zayenda peyvan diyar dibin. Zayend bi tenê di peyvên yekjimar de heye, lê di peyvên pirjimar de nîn e.³³⁶

Tablo 58. Qertafên Nediyarkirî (Kurmancî)

Kurmancî				
Qertafên Nediyarkirî				
<i>Qertaf</i>	<i>Mêjer</i>	<i>Zayend</i>	<i>Diyarî</i>	<i>Nediyarî</i>
-ek	yekjimar	-	dar, pirtûk, av, gul	darek, pirtûkek, avek, gulek
-in	pirjimar	-		darin, pirtûkin, avin, gulin ³³⁷

Bingeha qartefên nediyarkirî peyva *yek* û *hin* e. Dema peyva *yek* û *hin* tîn dawiya peyvan bi şiklê çêdibe.

Mînak:

Yek dar : dar-yek : darek (tîpa **y** ketiye)

Hin dar: dar-hin: darin (tîpa **n** ketiye)

Bi alîkariya veqetandekê

Veqetandek ev tiştê ku zayend û mêjera peyvan ji hevdu vediqetîne, di kurmancî de ravek bi riya veqetandekê tê çêkirin. Veqetandek dibin du kom: Qertafên Veqetandekê yên diyarkirî û yên nediyarkirî.³³⁸

³³³ Ocek, b.n., r. 96.

³³⁴ Yıldırım, b.n., r. 55.

³³⁵ Tan, b.n., r. 95.

³³⁶ Ocek, b.n., r. 95.

³³⁷ Samur (2012), b.n., r. 29.

³³⁸ Taş, b.n., r. 34.

Tablo 59. Qertafên Veqetandekê û Mînakên Wê (Kurmancî)

K u r m a n c î	Qertafên Veqetandekê yên Diyar kirî			
	<i>Qertaf</i>	<i>Mêjer</i>	<i>Zayend</i>	<i>Mînak</i>
	-a	yekjimar	mê	dara gûzê, sêva sor, hevala baş
	-ê	yekjimar	nêr	çiyayê bilind, aşê avê, gundê me
	-ên	pirjimar	-	darên behîvê, çiyayên bilind, hevalên baş
	Qertafên Veqetandekê yên Nediya kirî			
	<i>Qertaf</i>	<i>Mêjer</i>	<i>Zayend</i>	<i>Mînak</i>
	-eke	yekjimar	mê	hevaleke baş, maleke mezin, rojeke xweş
	-ekî	yekjimar	nêr	hevalekî baş, gundiyeke me, destekî min
	-ine	pirjimar	-	hevaline baş, maline mezin, rojine reş ³³⁹

Wekeku di tabloyê de jî diyar e di kurmancî de zayen bi tenê di peyvên yekjimar de heye, lê di yên pirjimar de nîn e. Dema ku yek bixwazê zayenda pirjimarî diyar bike pêdiviya yekî peyvên zayenda siruştî heye.

Mînak:

Hevalên jin/mêr

Bijîşkên jin/mêr

Zarokên keçik/kurik

Bi alîkariya tewangê

Tewang tê wateya tewandin û xwarkirinê. Bi îngilîzî wek *oblique* tê binavkirin. Wateya wê gelemperî bi mebesta nîşandana dem, kes, rawe, zayend û rewşê, guherîna teşe û dirûvê bêjeyan e. Bi îngilîzî ji vê rewşê re *inflection/ inflexion* tê gotin, ji bo kêşana lêkaran *conjugation*, ji bo tewanga nav, cihnav û rengdêran jî *declension* tê gotin.³⁴⁰

Di kurmancî de cihê tewangê pirr girîng e. Her wiha di lêkerên gerguhêz de, kirde û bireserê ji hevdu cuda dike.³⁴¹ Di lêkerên gerguhêz de, di demên borî de kirde tewandî û bireser xwerû ye, di dema niha û bê de kirde xwerû û bireser tewandî ye.³⁴²

Di kurmancî de tewang bi alîkariya qertafên tewangê zayend û mêjera peyvan diyar dike. Ev qertaf dibine du cure: Qertafên tewangê yên diyarkirî û yên

³³⁹ Tan, b.n., r. 109-10.

³⁴⁰ Tan, h.b., r. 89.

³⁴¹ Taş, b.n., r. 46.

³⁴² Ocek, b.n., r. 59.

nediyarkirî.³⁴³

Tablo 60. Qertafên Tewangê (Kurmancî)

Qertafên Tewangê yên Diyar kirî					
	<i>Qertaf</i>	<i>Mêjer</i>	<i>Zayend</i>	<i>Minak</i>	
K u r m a n c î	-ê	yekjimar	mê	nav	darê nebire, Zînê porê xwe şeh kir
				cihnav	wê ez dîtîm, ez wê dibînim
	-î	yekjimar	nêr	nav	Hesenî gûz anîn, ez nanî dixwim
				cihnav	ez wî dibînim, wî kare xwe nekiriye ³⁴⁴
	-an	pirjimar	-	nav	karkaran çalaki li dar xistin
				cihnav	wan çalaki li dar xistin ³⁴⁵
	Qertafên Tewangê yên Nedyarkirî				
		<i>Qertaf</i>	<i>Mêjer</i>	<i>Zayend</i>	<i>Minak</i>
		-ekê	yekjimar	mê	nameyekê ji hevala xwe re binivîse
		-ekî	yekjimar	nêr	hevalekî name dinivîsand
	-înan, -inan	pirjimar	-	hevalinan bibe mêvandariya xwe ³⁴⁶	

Dema li tabloyan dinêrin. Qertafa tewangê û veqetandekê ya nediyarkirî yekjimar-nêr yek in: **-ekî**; lê qertafên wan yekjimar mê ne yek in. Lê nêzî hev in. Qertafa veqetandekê ya nediyar yekjimar me **-eke** ye ya tewange nediyar yekjimar me **-ekê** ye. Pîrr caran di navbera wan de alozî çêdibe, dibe, qertafa veqetandekê ya nediyarkirî ne **-eke** be, dibe, qertafa veqetandekê ya nediyarkirî **-eka** be jî . Sedema wê jî ew e.

Mînak

Qertafa nediyar yekjimar: **ek**

Qertafên Veqetandekê ya diyarkirî yekjimar -mê: **-a**

Heval-**ek-a**: hevaleka

Hevaleka dirêj, hevaleka hêja, heveleka dilnêrm

Dema em hin mînakan li gorî tewangê bidin. Jixwe yê rewş diyar bibe.

Qertafa nediyar yekjimar: **ek**

Qertafa tewangê ya nediyarkirî-mê: **-ê**

Heval-**ek-ê**: Pênûseyekê bide mamosteya xwe, pênûseyekê diyarî evîndarê bike.

Pênûseyekê ji min re bişîne.

³⁴³ Samur (2012), b.n., r. 31.

³⁴⁴ Tan, b.n., r. 90-1.

³⁴⁵ Bakır, b.n., r. 86.

³⁴⁶ Taş, b.n., r. 47-8.

Tablo 61. Mînakên Qertafên Tewangê (Kurmancî)

Di dema borî de kirdeyên tewandî û bireserên xwerû					
<i>Qertaf</i>	<i>Mêjer</i>	<i>Zayend</i>	<i>Lêkerên Gerhuhêz</i>	<i>Mînak</i>	
-ê	yekjimar	mê	şuştin	Mizgînê firaq şuştin	
-î	yekjimar	nêr	birin	Rustemî bizin birin	
-an	pirjimar	-	xapandin	Hevalan ez xapandim	
Di dema niha û dema bê de kirdeyên xwerû û bireserên tewandî					
<i>Qertaf</i>	<i>Mêjer</i>	<i>Zayend</i>	<i>Lêkera Gerhuhêz</i>	<i>Dem</i>	<i>Mînak</i>
-ê	Yekjimar	Mê	birin	Dema niha	Rustem Mizgînê dibe gund
				Dema Bê	Rustem dê Mizgînê bibe gund
-î	Yekjimar	Nêr		Dema Niha	Mizgîn Rustemî dibe gund
				Dema Bê	Mizgîn dê Rustemî bibe gund
-an	Pirjimar	-		Dema Niha	Rustem hevalan dibe gund
				Dema bê	Mizgîn hevalan bibe gund ³⁴⁷

2.1.3. Nerênî û Nerênîya Navan

Li gorî qaîdeyê, nerênandin berî peyva ku bê nerênîkirin tê.³⁴⁸ Nerênîya navan jî bi alîkariya qertafa nerênîyê ya ku tê pêşîya navan çêdibe ev qertaf wateya nerênîyê dide û cuda jî tê nivîsandin.³⁴⁹

2.1.3.1. Di Hîtîfî De Nerênî û Nerênîya Navan

Di hîtîfî de heya dema împaratoriyê, pênc peyvên dihatin nerênîkirin ev in: 1) hît. *natta* (akd. *Ú-UL/UL*, som. NU), 2) hît. *nawî*, 3) hît. *le*, 4) hît. *numan /nuwan*, 5) hît. *nekku*.³⁵⁰

1) Nerênî- *natta*: Ne, na, tune, nîne, dema tê pêşîya nav, rengdêr, pareng, hoker û lêkernavan wan nerênî dike.

- Nerênî-*natta namma*: Êdî ne, ji niha pê ve³⁵¹
- Nerênî- *natta memamî*: Na, naxêr, red kirin.
- Nerênî- *man natta*: Eger na, nexwe, wekî din.³⁵²

³⁴⁷ Yıldırım, b.n., r. 70-1.

³⁴⁸ Zeilfelder, b.n., r. 131.

³⁴⁹ Aktuğ, b.n., r. 224-6.

³⁵⁰ Hoffner & Melchert, b.n., r. 341.

³⁵¹ Rieken, b.n., r. 151-2.

³⁵² Zeilfelder, b.n. r. 131.

- 2) Nerênî- *nawî*: Hê ne, hîn ne, niha na, vê gavê na,
- 3) Nerênî- *le*: Ne, na, me,³⁵³ nerênî-*le* qedexeker bi raweya daxuyaniya dema niha ve, carnan jî bi raweya fermanî ve tê xuya kirin.³⁵⁴
- Nerênî- *le-man*: xwestekeke divê neyê kirin îfade dike.³⁵⁵
- 4) Nerênî- *numan /nuwan*: Qet, tu car, ti car ne, bi ti awayî.³⁵⁶
- 5) Nerênî- *nekku*: Dema pirsê nerênî bi " nekku" tê çêkirin. Pirs: Ma ne wisa ye? Ma ne welê ye? Qey ne wilo ye?
- Dema bersîv erênî bê bersivkirin: Belê (wisa/welê/wilo ye).³⁵⁷ Hinek mînak
- luzzi natta* karpiyezzî
- " ew karê kotekî nake"
- nu namma arha UL tarnai*
- " û carekê din destûr nedaye (ku) here"
- paîmî nawî uhhî nawî*
- " hê ez neçûme, hê min nedîtiye"³⁵⁸
- le usniyattenî*
- " nefiroşin"
- le nahtî*
- " netirse"³⁵⁹
- le-man-se* LUGAL-us *kîssan tezzî*
- " bila qral derheqê wî de wisa nebêje"
- LUGAL-us *numan uezzî*
- " qral qet naxwaze were"³⁶⁰
- kurur nuwan esdu*
- " qet bê nîqaş çênebe"³⁶¹
- KUR-e-wa *nekku kuwapîkkî harkan?*

³⁵³ P. Streck, b.n., r. 114.

³⁵⁴ Aygül Süel, "Hitit Gramerinden Bazı Konular," Ankara Üniversitesi DTCF Dergisi, cld. XXXIII, hjm. 1-2, Ankara, [dtcfdergisi.ankara.edu.tr/index.php/dtcf/article/view/3640\(11.10.2018\)](http://dtcfdergisi.ankara.edu.tr/index.php/dtcf/article/view/3640(11.10.2018))

³⁵⁵ Rieken, b.n., r. 152.

³⁵⁶ Süel, b.n., r. 453.

³⁵⁷ Rieken, b.n., r. 152.

³⁵⁸ Hoffner & Melchert, b.n., r. 341-2.

³⁵⁹ Süel, b.n., r. 453.

³⁶⁰ Hoffner & Melchert, b.n., r. 344-5.

³⁶¹ Zeilfelder, b.n., r. 134.

" li deverekê erd nehatine talan kirin, (ma) ne wisa ye? " ³⁶²

Tablo 62. Nerêniya Navan (Hîtîfî)

H	Nerêniya Navan	
î	LU. MES TE ₄ MI UL SA BELI =NI	Ne qasîdên mirê me ne? ³⁶³
t	<i>natta apun GESTIN-an piyer</i>	Ew ne şeraba wan dayiye? ³⁶⁴
î		

Peyva GESTIN îdeogrameke Somerî ye û di hîtîfî de navê peyva şarabe " wîyana" ye. Ev peyv di almanî de " wein" û di îngilîzî de " wine" ye.

Di hîtîfî de qertafa nerênîyê **natta** nêzî qertafa kurmanci **ne** û **na**'yê ye.

Mînak: **natta** apas antuhsas" ew **ne** mirov/zilam e"

2.1.3.2. Di Kurmancî de Nerênî û Nerêniya Navan

Di kurmancî de qertafên nerênîkirinê *na-*, *ni-*, *ne-* ³⁶⁵ û *me-* ye. ³⁶⁶ Ew qertaf bi lêkeran ve tîn nivîsandin û di hevokên navî de bi tenê nerêniya *ne-* 'yê tê bikaranîn û cuda tê nivîsandin. ³⁶⁷ Ji van qertafan hinek li gorî deman tîn guhartin. Lê di hin lêkerên awarte de qertafên wan nerênî li gorî deman nayên guhartin. Wek lêkerên *karîn*, *kanîn*, *zanîn*, *şîyan û wêrîn*. ³⁶⁸

1) Nerênî *na-*: Ev qertaf di şûna qertafa dema niha *di-* 'yê de tê bikaranîn. ³⁶⁹ Di lêkerên pêkhatî de qertafa dema niha erênîyê *di-* û ya qertafa nerênîyê *-na* dikeve navbera pêşgir û lêkerê de. ³⁷⁰ Wek wan pêşgirên lêkerê *da-*, *hil-*, *ve-*, *wer-*, ³⁷¹ *çê-*, *der-*

³⁶² Hoffner & Melchert, b.n., r. 346.

³⁶³ Maria Molina, Negaion in Middle Hittite: corpus study, r. t, Institute of Linguistics of the Russian Academy of Sciences Moscow, www.academia.edu/.../Negation_in_Middle_Hittite_corpus .(16 .10. 2018).

³⁶⁴ Hoffner & Melchert, b.n., r. 341.

³⁶⁵ Avcıkıran (ed). , b.n., r. 18.

³⁶⁶ Kurdo, b.n., r. 179.

³⁶⁷ Avcıkıran (ed). , b.n., r. 18.

³⁶⁸ Tan, b.n., r. 273.

³⁶⁹ Kurmanji Kurdish For The Beginners PDF | بدر عبدالرحمن – Academia r. t, ...[https:// www.academia.edu/.../Kurmanji_Kurdish_For_The](https://www.academia.edu/.../Kurmanji_Kurdish_For_The) .. (21. 10.2018)

³⁷⁰ Ocek, b.n., r. 225.

³⁷¹ W. M. Thackston, Kurmanji Kurdish A Reference Grammar with Selected Readings, Harvard University, 2006, r. 4, https://sites.fas.harvard.edu/~iranian/Kurmanji/kurmanji_complete.pdf.(27.10. 2018)

, ra-³⁷²

Mînak:

Reşo dewî vedixwe, Memo avê venaxwe, Hespê pîr bare giran hilnagire, Rostem gurza giran radike, lê xema giran ranake.³⁷³

2) Nerênî *ni*-: Nerênîya *ni*- 'yê di dema niha de ji bo lêkerên *karin* û *zanînê* tê bikaranîn.³⁷⁴

3) Nerênî *ne*-: Ev qertafa nerênîkirinê di hemû demên borî³⁷⁵ û dema bê de tê bikaranîn.³⁷⁶ Di demên borî de qertafa *di*- bi tenê di dema boriya domdar de tê bikaranîn.³⁷⁷ Qertafa dema bê *bi*- nakeve navbera pêşgir û lêkerê de, lê nerênîya wê - *ne* dikeve navbera pêşgir û lêkerê de.³⁷⁸ Ji ber wê di kurdî de bikaranîna dema niha zêde ye, hevokekê dema bê bi nerênî ya dema niha jî karê were sazkirin. Mînak:

Ma ew ê bi me re were? Na ew ê bi me re neyê (ew bi me re nayê).³⁷⁹ Merwan salekê dî dibe mamoste (Merwan wê salekê dî bibe mamoste).³⁸⁰

4) Nerênî *me*-: Ev qertaf dikeve şûna qertafa fermanî *-bi*'yê³⁸¹ û qertafa *-bi*'yê di lêkerên pêkhatî de dikeve, nayê nivîsandin. Wek lêkera pêkhatî " vekirin " ê nabe *vebike* dibe *veke*,³⁸² lê lêker dîsa fermanî dimîne.³⁸³

Mînak:

Hilgire, çêke, rake, wergerîne.³⁸⁴

Lêkerên *hatin*, *çûyîn* û *badan*, qertefa fermanî *bi*-yê nastînin.

³⁷² Taş, b.n., r. 27.

³⁷³ Ocek, b.n., r. 226.

³⁷⁴ Taş, b.n., r. 189.

³⁷⁵ Ocek, b.n., r. 223.

³⁷⁶ Lezgîn, b.n., r. 171.

³⁷⁷ Samur (2012), b.n., r. 17.

³⁷⁸ <http://mamosteye-zimane-kurdi.blogspot.com/p/niseyen-qursa-asta-yekemin.html.pdf> (28.10.2018)

³⁷⁹ Rizgar, b.n., r. 172.

³⁸⁰ Aktuğ, b.n., r. 302.

³⁸¹ Ocek, b.n., r. 234.

³⁸² Tan, b.n., r. 277-8.

³⁸³ Taş, b.n., r. 198.

³⁸⁴ Tan, b.n., r. 278.

Mînak:

Hatin –were Zû were vê derê/vir.
 Çûyîn-here Here dibistanê
 Badan-bade Wî tayî bade ³⁸⁵

Nerêniya *me-* di Soranî û kurmancî de tê bikaranîn. Di kurmancî de ji bilî nerêniya *me-* 'yê, nerêniya *ne-* 'yê jî tê bikaranîn. ³⁸⁶

Mînak:

Karên xirab **meke/neke!**³⁸⁷

Tablo 63. Nerênî (Kurmancî)

	Nerênî			
	<i>Dem û rawe</i>	<i>Erênî</i>	<i>Nerênî</i>	<i>Mînak</i>
K u r m a n c î	Dema niha	di-	na-	ez dimînîm ez namînîm
				tu dimînî tu namînî ³⁸⁸
			ni-	ez (di)karim bimeşim ez nikarim bimeşim
				ez (di)zanim bimeşim ez nizanim bimeşim ³⁸⁹
	Demên borî	-	ne-	min anî/aniye min neanî/neaniye
	Dema boriya domdar	di-		min anîbû/anîbûya min neanîbû/ neanîbûya ³⁹⁰
				ez diçûm ez nediçûm
	Dema bê	bi-		ez radizam ranedizam ³⁹¹
				ez dê bixebitim ez dê nexebitim
	Raweya fermanî	bi-		tu dê kar bikî tu dê kar nekî ³⁹²
				bişo! neşo! ³⁹³
				me-

Tablo 64. Nerêniya Navan (Kurmancî)

K u	Nerêniya Navan	
	<i>Qertaf</i>	<i>Mînak</i>

³⁸⁵ Aktuğ, b.n., r. 340.

³⁸⁶ Kurdo, b.n., r. 179

³⁸⁷ Lezgîn, b.n., r. 149.

³⁸⁸ Ludwig Paul, Kauderwelsch Band 94: Kurdisch-Wort für Wort, Weş. Reise Know-How, Bielefeld, çapa çarem/20016, r. 57.

³⁸⁹ Avcıkıran (ed.), b.n., r. 40.

³⁹⁰ Baran Rizgar, Helwesta Netewî Pîrs û Mijarên Zimanê Kurdî, 2013, r. 131, <https://zanistvan.files.wordpress.com/2018/06/helwesta-netewi.pdf> (3.11.2018)

³⁹¹ Yıldırım, b.n., r. 120.

³⁹² Umîd Demîrhan, Hînkê zimanê kurdî Perwerdehiya Destpêkî 2, <https://www.scribd.com/.../hin-kere-zimane-kurdi-2-umid-de>(3.11.2018)

³⁹³ Rizgar, b.n., r. 78.

³⁹⁴ Yıldırım, b.n., r. 137.

r m a n c î	ne-	ez ne baş im.	Ew ne bijîşk e. ³⁹⁵
		ne mal e.	Ne can e.
		ne werîs e.	Ne kilçûv e. ³⁹⁶
		Azad ne xort e.	Xwarin ne germ e.
		Rojda ne dirêj e.	Şîlan ne mamoste ye. ³⁹⁷

2.1.4. Halê Navan

Halê navan, têkiliya navan bi peyvên din re çêdike û bi wan re tê bikaranîn. Di encama vê yekê de hal dikeve rewşeke din, qertafên navan bi şiklên cuda dixê hal û rewşên cuda, qertafên halê ne.³⁹⁸

2.1.4.1. Di Hîtîfî De Halê Navan

Di hîtîfî de heşt halên cuda hene:

Nomînatîf (Halê Xwerû)

Akkusatîf (Halê Tewardî)

Nomînatîf-Akkusatîf Neutrum (Halê Nêtar)

Genîfîf (Halê Ravekî)

Datîf-Lokatîf (Halê Berpêyî-Têdeyî)

Ablatîf (Halê jêderketî)

Instrumental (Halê Pevreyî)

Vokatîf (Halê Gazîkirî).³⁹⁹

Tablo 65. Qertafên Halê (Hîtîfî)

H î t î f	Qertafên Halê				
		Sg.		Pl.	
		HK	HN	HK	HN
Nom. c.		-s, Ø	-es	-us, -es, -as	
Akk. c.		-(a)n	-us		
Nom.-akk. n.		-Ø, -n	-Ø, -a	-Ø, -a, -î ⁴⁰⁰	

³⁹⁵ Avcıkıran (ed), b.n., r. 18.

³⁹⁶ Aktuğ, b.n., r. 226.

³⁹⁷ Abdurrahman Adak ûyd., Fêrker Kurdî Asta Destpêkê, Weş. Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê, çapa yekem 2016, r. 33, mamosteye-zimane-kurdi.blogspot.com/.../ferker-asta-destp...pdf (5.11.2018).

³⁹⁸ Yasemin Yılmaz Atagül û Özlem Yaşlı Cevher, "Türkçenin Yabancı Dil olarak Öğretiminde Hâl Eki Sorunsalı (Sakarya Üniversitesi Örneği)", TÜRK Uluslararası Dil, Edebiyat ve Halkbilimi Araştırmaları Dergisi, sal: 3, hjm: 5, 2015, r. 296, [Doi Number :http:// dx.doi.org/ 10.12992 /TURUK 172 pdf](http://dx.doi.org/10.12992/TURUK172.pdf) (6.11.2018).

³⁹⁹ Lauffenburger, b.n., r. 21.

⁴⁰⁰ Brosch, b.n., r. 20.

î	Gen.	-s, -as		-an	-as ⁴⁰¹
	Dat.-Lok.	-î, -ya, -∅	-î, -ya, -∅, -aî	-as ⁴⁰²	
	Abl.	-az(a), -za		-az(a)	
	Instr.	-ît, -d/ta		-ît, -d/ ta	
	Vok.	-∅, -î, -e, ⁴⁰³ -a ⁴⁰⁴	-∅	=nom	

Dema em qertafên halê yên hîtîti dinêrin, di halên pirjimariyê de pirjimariya belavkar heye. Herwiha halê nomînatîf jî qertafê distîne.

Tablo 66. Keşana Navan (Hîtîti)

H î t î t î	Kêşana Navan		
	lala (idgr. som. EME) c.: ziman		
		Sg.	Pl.
	Nom. c.	<i>lalas</i> (EME-as)	<i>lales, lalus</i>
	Akk. c.	<i>lalan</i> (EME-an)	<i>lalus</i> (EME-us)
	Nom.-akk. n.	-	
	Gen.	<i>lalas</i>	<i>nehatine belgekirin</i>
	Dat.-Lok.	<i>lalî</i> (EME-î)	
	Abl.	<i>lalaz</i> (EME-az/za)	
	Instr.	<i>lalît</i>	
Vok.	<i>lalî !</i>	=nom ⁴⁰⁵	

Dema em li tabloyê dinêrin peyva **lala** peyveke communê ye, ji ber wê kişandina wê halê nêtar nîn e. Halê Dat-Lok./Abl./Instr./ Pl. Di tabletên mixî de nehatine belgekirin. Ji ber wê me wek nehatine belgekirin nivîsandin. Ger em halê ku nehatine belgekirin em li gorî qertafên halê kişandina wan bikin, yên bi wî awahî çêbibin. Dat.-Lok . Pl. **lalas**, Abl. Pl. **lalaz(a)**, Instr. Pl. **lalata**

Tablo 67. Kêşana Navan (Hîtîti)

H î t î t î	Kêşana Navan		
	⁴⁰⁶ <i>halkî</i> c.: zad, genim		
		Sg.	Pl.
	Nom. c.	<i>halkîs</i>	<i>halkîs</i>
	Akk. c.	<i>halkîn</i>	<i>halkîus</i> (<i>halkes</i>)
	Nom.-akk. n.	-	
	Gen.	<i>halkiyas</i>	<i>nehatine belgekirin</i>
	Dat.-Lok.	<i>nehatiye belgekirin</i>	
	Abl.	<i>halkiyaza</i>	
	Instr.	<i>halkît</i>	
Vok.	<i>nehatiye belgekirin</i>		

⁴⁰¹ Rieken, b.n., r. 45.

⁴⁰² Brosch, b.n., r. 20.

⁴⁰³ Hoffner & Melchert, b.n., r. 70.

⁴⁰⁴ Brosch, b.n., r. 20.

⁴⁰⁵ Van Den Hout, b.n., r. 18.

⁴⁰⁶ Friedrich, b.n., r. 41.

Dema ku em tabloyê dinêrin, peyva **halkî** communê ye. Ji ber wilo kêşana wê Nom.-Akk. n. nîn e, ger em wan halên ku nehatine belgekirin bikşînin yên bi awahî bên kişandin. Dat.-Sg. Halkî pl. Halkiyas, Abl. Pl. Halkiyaz(a), Instr. Pl. Halkît, Vok.Pl. Halkîs

Tablo 68. Kêşana Navan (Hitîti)

Kêşana Navan			
<i>peda n. : cîh</i>			
		Sg.	Pl.
H î t î t î	Nom. c.	-	
	Akk. c.		
	Nom.-akk. n.	<i>pedan</i>	<i>nehatiye belgekirin</i>
	Gen.	<i>pedas</i>	<i>pedas</i>
	Dat.-Lok.	<i>pedî</i>	<i>pedas</i>
	Abl.	<i>edaz(a)</i>	<i>nehatiye belgekirin</i>
	Instr.	<i>nehatine belgekirin</i> ⁴⁰⁷	
	Vok.		

Ji ber ku peyva **peda** nêtar e, kêşana wê nomînativ û akkusatif nîn e. Ger em kêşana halên pirjimar yên ku nehatine belgekirin bikşînin yên bi awahî bên kişandin. Nom.-akk. n. Pl. *peda*, *pedî*, Abl. Pl. *pedaz(a)*, Instr. Pl. *pedît*, Vok. Pl. *pedas*

Tablo 69. Kêşana Navan (Hitîti)

Kêşana Navan			
⁴⁰⁸ <i>huppar c./n.: sênik</i>			
		Sg.	Pl.
H î t î t î	Nom. c.	<i>hupparas</i>	<i>nehatine belgekirin</i>
	Akk. c.	<i>hupparan</i>	
	Nom.-Akk. n.	<i>huppar</i>	<i>hupparî</i>
	Gen.	<i>hupparas</i>	<i>nehatine belgekirin</i>
	Dat.-Lok.	<i>hupparî</i>	
	Abl.	<i>hupparaza</i>	
	Instr.	<i>hupparît</i>	
	Vok.	<i>nehatiye belgekirin</i>	

Dema ku em li tabloya kêşana navan dinêrin peyva **huppar** him communê ye him jî neutrum/nêtar e, ger em wan halên ku nehatine belgekirin bikşînin yên bi awahî bên kişandin. Nom. Pl. *hupparas*, *hupparus*, Akk.Pl. *hupparus*, Dat.-Lok. Pl. *hupparas*, Abl. Pl. *hupparaz(a)*, Instr.Pl. *hupparît*, Vok.Pl. *hupparas*

⁴⁰⁷ Hoffner & Melchert, b.n., r. 82.

⁴⁰⁸ Friedrich, b.n., r. 54

2.1.4.2. Di Kurmancî De Halê Navan

Di kurmancî de heşt halên cuda hene.⁴⁰⁹ Halê xwerû ti qertafan nastîne. Zayend jî bi tenê di navên yekjimar de heye, di yên pirjimar de nîn e.⁴¹⁰ Halê navan carinan bi alîkariya daçek,⁴¹¹ qertaf û guherina cihê lêkerê çêdibe.⁴¹²

Tablo 70. Qertafên Halê (Kurmancî)

Qertafên Halê		
Sg.		
Nom.		-
Akk.	<i>m.</i>	-î
	<i>f.</i>	-ê ⁴¹³
Gen.	<i>f.</i>	-a/ya
	<i>m.</i>	-ê/yê ⁴¹⁴
Dat.		-li...ê, ⁴¹⁵ -bi...de, -bi...ve, -ji...re ⁴¹⁶
Lok.		-li, -di...de ⁴¹⁷
Abl.		-ji, ⁴¹⁸ -ji...e, ⁴¹⁹ -ji...ve, -di...ve, -di...re ⁴²⁰
Instr.		-bi ⁴²¹ , -bi...re, ⁴²² -bi...ve ⁴²³
Vok.	<i>m.</i>	-o
	<i>f.</i>	-ê ⁴²⁴
Pl.		
Nom.		-
Akk.		-an ⁴²⁵
Gen.		-an ⁴²⁶
Dat.		-ji...an...re, ⁴²⁷ -li...an ⁴²⁸
Lok.		-li...an ⁴²⁹

⁴⁰⁹ Fêrgîn Melik Aykoç, "tewang", Kanîzar: *Kovara Zimanê Kurdî*, hjm: 6, 2016, r. 92, [https://zimannas.files.wordpress.com/2016/05/hejmar-6.pdf\(8.11.2018\)](https://zimannas.files.wordpress.com/2016/05/hejmar-6.pdf(8.11.2018))

⁴¹⁰ Thackston, b.n., r. 8.

⁴¹¹ Aktuğ, b.n., r. 54.

⁴¹² Badilli, b.n., r. 36-7.

⁴¹³ Aykoç, g.n., r. 93-4.

⁴¹⁴ Badilli, b.n., r. 42.

⁴¹⁵ Serkan Oğur, *Farsça-Zazaca-Kurmanca Mukayeseli Gramer ve Temel Sözlük*, Weş. Yazılama, İstanbul, 2014, r. 71.

⁴¹⁶ Aktuğ, b.n., r. 221-2.

⁴¹⁷ Malmîsanij, b.n., r. 84.

⁴¹⁸ Aktuğ, b.n., r. 222.

⁴¹⁹ Oğur, b.n., r. 71.

⁴²⁰ Badilli, b.n., r. 41.

⁴²¹ Oğur, h.b., r. 71.

⁴²² Aktuğ, b.n., r. 220.

⁴²³ Aykoç, b.n., r. 113.

⁴²⁴ Malmîsanij, b.n., r. 81.

⁴²⁵ Aykoç, g.n., r. 93-4.

⁴²⁶ Oğur, b.n., r. 118.

⁴²⁷ Aktuğ, b.n., r. 222.

⁴²⁸ Oğur, b.n., r. 118.

⁴²⁹ Tan, b.n., r. 193.

	Abl.	-ji...an, ⁴³⁰ -di...an...re ⁴³¹
	Instr.	-bi...an, ⁴³² -bi...an...re ⁴³³
	Vok.	-no, -ino, -îno ⁴³⁴

Dema em tabloya qertafên halê yên kurmancî dinêrin, halê nomînatîf ti qertaf nesitandine. Halê akkusatif û genetîf jî qertafên tewang û veqetandekê sitandine.

Tablo 71. Kêşana Navan (Kurmancî)

Kêşana Navan					
Sg.					
K u r m a n c î	Nom.	dar hişk bûye.			
	Akk.	<i>m</i>	Rengê hespî	<i>f</i> Rengê mehîne ⁴³⁵	
	Gen.	<i>m</i>	Hespê min	<i>f</i> a/ya gund ⁴³⁶	
	Dat.	li kitebê, xwe bi min ve zeliqand, min av bi êgir de kir, wan ji min re got ⁴³⁷			
	Lok.	li gundan dehan heywan nemabûn, min di trenê de pê girt ⁴³⁸			
	Abl.	ji bajêr, ji Iraqê, ji jêr ve dihat, di dîwêr ve , di rê re bi meş			
	Instr.	bi çov lê xist, bi hespê re , ⁴³⁹ hesp bi zîn ve çû. ⁴⁴⁰			
	Vok.	<i>m.</i>	Heso! bavo!	<i>f.</i>	Fatê! dayê! ⁴⁴¹
	Pl.				
	Nom. c.	heval çûn. ⁴⁴²			
	Akk. com	rengên hespan, rengên mehînan			
	Gen.	welatê biyaniyan ⁴⁴³			
	Dat.	mamoste ji zarokan re got, ⁴⁴⁴ li teyran binêre. ⁴⁴⁵			
Lok.	li gundan jiyan xweş e.				
Abl.	min agahî ji zarokan girt. ⁴⁴⁶ Di nav malan re bihurî. ⁴⁴⁷				
Instr.	min bi keviran xaniyek ji xwe re çêkir. ⁴⁴⁸ Ez bi zarokan re zarok im. ⁴⁴⁹				
Vok.	lawikno! xortino! kurîno! ⁴⁵⁰				

⁴³⁰ Yıldırım, b.n., r. 68.

⁴³¹ Tan, b.n., r. 194.

⁴³² Tan, h.b., r. 191.

⁴³³ Yıldırım, b.n., r. 68.

⁴³⁴ Malmîsanij, b.n., r. 82.

⁴³⁵ Aykoç, g.n., r. 93-4.

⁴³⁶ Badilli, b.n., r. 42.

⁴³⁷ Aktuğ, b.n., r. 221-2.

⁴³⁸ Malmîsanij, b.n., r. 84.

⁴³⁹ Badilli, b.n., r. 41-2.

⁴⁴⁰ Aykoç, g.n., r. 113.

⁴⁴¹ Malmîsanij, b.n., r. 81.

⁴⁴² Aykoç, g.n., r. 24.

⁴⁴³ Oğur, b.n., r. 118.

⁴⁴⁴ Aktuğ, b.n., r. 222.

⁴⁴⁵ Oğur, b.n., r. 118.

⁴⁴⁶ Yıldırım, b.n., r. 68.

⁴⁴⁷ Tan, b.n., r. 194.

⁴⁴⁸ Tan, h.b., r. 191.

⁴⁴⁹ Yıldırım, b.n., r. 68.

⁴⁵⁰ Malmîsanij, b.n., r. 82.

Dema em li tabloya mînakên kêşana navan dinêrin. Di Halê pirjimar de akkusatif û genetîfê de qertafa **-an** sitandine.

Mînak:

Akk.Pl. Bêrivan kengî hespan tîne malê.

Gen.Pl. Bajarê evîndaran

Di halê vokatif yekjimar de jî li gorî zayendê qertaf sitandine ji bo zayenda nêr **-o** ji bo zayenda mê jî **-ê**. Di pirjimarî de jî zayend nîn e. Vok.Pl. **-no/ino/îno**

Di kurmancî de qertafên pirjimar hertim tîpa **-n** têde heye. Ji vê tîpê jî tê diyar kirin ku pirjimariyê nîşanî me dide. Ji bo qertafên cihnavên kesên serbixwe pirjimar **-in/ne**; ji bo tewangê pirjimar **-an**; ji bo veqetandekê **ên**. Her çiqas di halê vokatif pirjimar de qertafa nêr **-o** piştî tîpa **-n**'yê hatibe jî zayendê diyar nake. Ji ber ku di kurmancî de di halê pirjimar de zayend nîn e. Di halê vokatif pirjimar de qertafên **-no/ino/îno** him ji bo zayenda nêr him jî ji bo zayenda mê tê bikaranîn.

Mînak:

Keçikno ! Lawikno !

Hevalno ! Gundino !

Ji aliye navan ve nuqtayên hevbeş

a) Di hîtîfî û kurmancî de nav li gorî hejmarê, navên yekjimar, pirjimar û komjimar pêk tê.

	<i>Yekjimar</i>	<i>Pirjimar</i>	<i>Komjimar</i>
Hîtîfî	<i>îsha</i>	<i>îshes</i>	<i>utne</i>
Kurmancî	<i>mîr</i>	<i>mîran</i>	<i>welat</i>

b) Di hîtîfî û kurmancî de hinek nav zayenda biyolojîk in. Ji van navan hinek nêr û mê ne.

Hîtîfî	Kurmancî
<i>atta</i>	bav
<i>anna</i>	dayik

c) Him di hîtîfî de him jî di kurmancî de nerênîkirin bi alikariya hinek peyv û qertafan tên çêkirin. Nerênîya navan di hîtîfî de bi alikariya peyva *natta* û di kurmancî

de jî bi alîkariya qertafa *ne* 'yê tê çêkirin.

d) Nerênîkirina navan hît. *-natta* û kurm. *-ne* bi navan ve nayên nivîsandin.

Hîtîfî

apus natta halkis

kas natta lalas

Kumancî

ew **ne** genim e.

ev **ne** ziman e.

e) Di hîtîfî û kurmancî de heşt qertafên halê hene.

f) Di qertafên halê de forma pirjimar genîfîf *-an* hîtîfî û kurmancî de eynî ye.

Hîtîfî

lalan

halkiyan

Kurmancî

(parastina) **zimanan**

(parastina) **zadan, geniman**

Ji aliyê navan ve nuqteyên cuda

a) Di hîtîfî de zayenda navan bi alîkariya determînâtîfan tê diyar kirin, di kurmancî de zayend bi alîkariya qertafên tewang û veqetandekê tê diyar kirin.

b) Halê navan di hîtîfî de tenê bi alîkariya qertafên halê çêdibe. Di kurmancî de bi alîkariya qertafên halê, daçek û guharina cihê lêkerê çêdibe.

c) Qertafên nerênîkirinê di kurmancî de bi lêkeran ve tên nivîsandin, di hîtîfî de cuda tên nivîsandin.

Hîtîfî

le usniyattenî

Kurmancî

nefiroşin

2.2. Cihnav

Ew bêje *ne*, di nava hevokê de li şûna navan tên bikaranîn û hemû taybetiyên wan jî digirin. Wek tewang, mêjer, zayend û nêtarê.⁴⁵¹ Cihnav ji aliyê nîşan û erkên rêzimanî ve li ser van beşan dabeş dibin: Kesî, nîşan, pirsiyarî, hev, pêve, xwe, çendî, neyînî, diyar û nediyar.⁴⁵²

2.2.1. Di Hîtîfî De Cihnav

Di hîtîfî de cureyên cihnavan ev in: Cihnavên kesane (*ez, tu, ew, em, hûn, ew*), cihnavên xwedîtiyê (*a/ê /ên min, te, wê/î, me, we, wan*), cihnavên şanîdanê (*ev, ew*),

⁴⁵¹ Ölçek, b.n., r. 110.

⁴⁵² Kurdo, b.n., r. 115.

cihnavên nediyar (kesêk hwd.), cihnavên pirsiyariyê (kî/kê, çi, kîjan), cihnavên girêkî (a, ê, ên)⁴⁵³ û cihnavên vegerok (xwe).⁴⁵⁴

2.2.1.1. Cihnavên Kesane

Di hîtîti de cihnavên kesane di nava xwe de dibin du cure: Yên enklîtîk û yên serbixwe. Di cihnavên kesane yên serbixwe de kesê yekem û duyem mewcûd in, lê kesê sêyem ne mewcûd e. Di şûna kesê sêyem de cihnavên şanîdanê *apa* (ew) tê bikaranîn. Di cihnavên kesane yên enklîtîk de bi tenê halê datîf û akkusatif mewcûd in û piranî jî bi partîkela *nu* (û)yê re tên bikaranîn.

Mînak:

Partîkel + enklîtîk datîf û akkusatif

nu+mu " û ji min re/ û min (bibe) " ⁴⁵⁵

Part. enkl. Dat. -Akk. Sg. 1.

Di hîtîti de kokeke bi navê enklîtîk-*a* jî mewcûd e, ji bo halê nomînatîf û akkusatif kesê sêyem yên cihnavên kesane-serbixwe tê bikaranîn.⁴⁵⁶

Di hîtîti de cihnavên kesandinê dema tên dawiya lêkerê, cihnavên kesane yên serbixwe *ez, tu, ew, em, hûn* û *ew*'ê nîşan didin.⁴⁵⁷ Mînak: paî " çûyîn "

Sg. 1/ 2 /3. *paîmî/ paîşî/ paîzi* " diçim/diçî/diçe. "

Pl. 1/ 2 /3. *paîwenî/ paîtenî/ panzî* " diçin/diçin/diçin. " ⁴⁵⁸

Tablo 72. Cihnavên Kesane yên Serbixwe (Hîtîti)

Cihnavên Kesane yên Serbixwe				
	Sg.	Sg. 1. ez, min	Sg. 2. tu, te	Sg. 3. ew, wî/ê
H î t î t î t î	Nom.	<i>uk/g, ammuk</i>	<i>zîk</i>	<i>apas c. ,apat n.</i>
	Akk.	<i>ammuk</i>	<i>tuk</i>	<i>apun, apan</i>
	Gen.	<i>ammel</i>	<i>tuel</i>	<i>apel</i>
	Dat.-Lok.	<i>ammuk, uk</i>	<i>tuk</i>	<i>apedanî, apetî</i>
	Abl.	<i>ammedaz(a)</i>	<i>tuedaz(a)</i>	<i>apez, apezza</i>
	Pl.	Pl. 1. em, me	Pl. 2. hûn, we	Pl. 3. ew, wan

⁴⁵³ Van Den Hout, b.n., r. 18.

⁴⁵⁴ Lauffenburger, b.n., r. 35.

⁴⁵⁵ Diçol, b.n., r. 75-6.

⁴⁵⁶ Rieken, b.n., r. 71.

⁴⁵⁷ Hoffner & Melchert, b.n., r. 277.

⁴⁵⁸ Lauffenburger, b.n., r. 55-6.

Nom.	<i>wes, anzas</i>	<i>sumes, sumas</i>	<i>ape, apus c. ape n.</i>
Akk.	<i>anzas</i>	<i>sumas, sumes</i>	<i>apus c. , ape n.</i>
Gen.	<i>anzel</i>	<i>sumenzan, sumel</i>	<i>apenzan</i>
Dat.-Lok.	<i>anzas</i>	<i>sumas, sumes</i>	<i>apedas</i>
Abl.	<i>anzedaz</i>	<i>sumedaz</i>	- 459

Dema em li tabloyê dinêrin. Halên akkusatif û datif Sg/pl. 1., Sg/Pl. 2. wek hev in dibe ku ev alozî ji devokan be. Hîtîti jî wek kurmancî forma sêyem a cihnavên kesane yên serbixwe û cihnavê şanîdanê eynî form e. Hîtîti " apa", kurmancî " ew"

Mînak:

Cihnavê şanîdane	cihnavên kesane
Hîtîti: apez	apas uwazî
Kurmancî: ji wir	ew naye

Di demên berê de ji bo nomînatîfê bi tenê *uk, wes* û *sumes*, ji bo datif- akkusatif jî bi tenê *ammuk, anzas* û *sumas* dihat bikaranîn. Di dema împaratoriye de jî wek grûba zimanên latîni forma akkusatifê ji bo nomînatîfê jî dihat bikaranîn. Pişt re forma *uk* û *wes* pir nehate bikaranîn, forma *sumes* jî him wek nomînatîf û him jî wek akkusatifê hate bikaranîn. Ev rewş, li gorî veguhastina babeta Pl. Nomînatîf û akkusatifê ye. Ji aliyê şêwazê ve datif û akkusatifên *sumes/sumas* jî dişibihan hev, forma *sumes/sumas* halê datifê jî dida diyarkirin. Ti car di navbera forma *zik* û *tuk* de aloziyek çênebûye. Di zimanê kevn de bi tenê forma *sumenzan* dihat zanîn, *sumel* û *anzel* jî formên nû ne.⁴⁶⁰

Mînak:

Nom. Sg. 1. **uk** *tuel parna UL uwamî*

" **ez** nayêma mala te" ⁴⁶¹

Nom. Sg. 1. **ammuk**-waza *linganuwanza nuwa U-UL kuitki memahhi*.⁴⁶²

" **ez** sond dixwîm tişteki nebêjim. " ⁴⁶³

Dat. Sg. 1. *nuwaras ammuk* ^{LU} *MIDI-YA*

⁴⁵⁹Labbreviations & conventional markings- Oriental Institute <https://oi.uchicago.edu/pdf/HittLang.pdf> (1.12.2018)

⁴⁶⁰ Dinçol, b.n., r. 75-6.

⁴⁶¹ Heinrichs, b.n., r. 63.

⁴⁶² Zeïlfelder, b.n., r. 102.

⁴⁶³ Zeïlfelder, h.b., r. 186.

" Bila ew **ji min re** bibe zilam " ⁴⁶⁴

Nom. Sg. 2. **zîk ammel** E-na *lîe uwasî* ⁴⁶⁵

" **tu** neyê mala min " ⁴⁶⁶

Nom. Pl.2. *anda=ma=za sumas kuîes* LU.^{MES} E. DINGIR-LIM

" Her wiha **hûn** wezîfedarê perestgehê jî ne. " ⁴⁶⁷

Tablo 73. Cihnavên Kesane- Enklîtîk-Datîf û Akkusatîf (Hitîfî)

H î t î t î t î	Cihnavên Kesane - Enklîtîk-Datîf û Akkusatîf ⁴⁶⁸						
		Sg.1.min	Sg. 2. te	Sg. 3. wî/ê	Pl. 1. me	Pl. 2. we	Pl. 3. wan
	Dat.	<i>mu</i>	<i>ta/du</i>	<i>sî</i>	<i>nas</i>	<i>smas</i>	<i>smas</i>
	Akk.	<i>mu</i>	<i>ta/du</i>	-	<i>nas</i>	<i>smas</i>	-

Li gorî vê tabloyê cihnavên kesane -enklîtîk bi tenê halê Datîf û Akkusatîf heye. Halê Datîf û akkusatîf Sg.1. /2 û Pl. 1./ 2 wek hev in. Halê sg.3 /Pl. 3. Di halê akkusatîf de nîn e. Li gorî rewşa hevokê forma datîf û akkusatîf ji hevdu tên cudakirin.

Mînak

Dat. Sg. 1. *zîk-ma-mu-za kurur es* ⁴⁶⁹

" lê tu **ji min re** bibe dijmin. "

Dat. Sg. 2. MU.KAM *-za-wa-ta ser tepawessanza*

" sal ji ber wilo **ji te re** kin e. ' "

Dat. Sg. 3. *nu=sî* ^{KUS} E.SIR-*us paî* ⁴⁷⁰

" şekalan dide **wî/ê** "

Dat. Pl. 1. *nu= nas= kan* DINGIR^{LUM} *anda artat* ⁴⁷¹

" Yezdan ji bo **me** rawestiye. "

Dat. Pl. 2. *nu-smas îshîul kîssan esdu*

" ji bo **we** bila peyman bi wî şiklî be " ⁴⁷²

⁴⁶⁴ Süel, b.n., r. 442.

⁴⁶⁵ Zeilfelder, b.n, r. 102.

⁴⁶⁶ Zeilfelder, h.b., r. 186.

⁴⁶⁷ Hoffner & Melchert, b.n., r. 363.

⁴⁶⁸ Amd. İstanbul Üniversitesi Edebiyat Fakültesi: Eski Önasya Dileri ve Kültürleri Bölümü, Başlayanlar için Hititçe ve Akkadça Kılavuzu, İ. Ü. E. F Yayınları, İstanbul, 1967. r. 7.

⁴⁶⁹ Süel, b.n., r. 441-3.

⁴⁷⁰ Brosch, b.n., r. 65.

⁴⁷¹ Brosch, h.b., r. 287.

⁴⁷² Ünal, b.n., r. 162.

Tablo 74. Cihnavên Kesane -Enklîtîk Kesê 3. -Nomînatîf û Akkusatîf (Hîtîti)

H î t î t î	Cihnavên Kesane -Enklîtîk Kesê 3. -Nomînatîf û Akkusatîf			
		Sg. 3. ew/ wî/wê	Pl. 3. ew/ wan	
			HK	HN
	Nom. c.	<i>as</i>	<i>e</i>	<i>at</i>
	Akk. c.	<i>an</i>	<i>us</i>	<i>as</i>
	Nom.-Akk. n.	<i>at</i>	<i>e</i>	<i>at</i>

Dema em li gorî li tabloyê, li van cihnavên kesane-enklîtîk dinêrin. Di dema HK de di navbera forma yekjimar û pirjimar de alozî nîn e , lê pişt re di dema HN de di formên yekjimar de guhertin çênebûne. Lê di yên pirjimar de guhertin çêbûne. navbera formên yekjimar û pirjimar HN de alozî dest pê kirine. Nom. c. Sg : **as**, Akk. c. Pl. HN: **as**, Nom. -Akk. n. Sg/Pl.: **at**, Nom. c. Pl.: **at**

Ev aloziya ku di navbera wan de li gorî rewşa hevokê ji hevdu dihatin cuda kirin. Herwiha cihnavên kesane -enklîtîk ji bo cihnavên şanîdanê ji dihatin bikaranîn. Jixwe di hinek hevokên ku di tabletên mixî de derbasbûne jî diyar in. Hinek ji wan hevokan ev in:

⁴⁷³Nom. Sg. 3. *nu=war = as* TUR-*las*

" **ew** ciwan"

⁴⁷⁴Akk. Sg. 3. *n=an= san* ^{GI}*paddanî daî*

" û **wê** bixe selikekê"

⁴⁷⁵Akk. Pl. 3. *man= us= kan* ^m*Huzziyas*

" Huzziya dixwest **wan** bikûje"

2.2.1.2. Cihnava Vegerok

Di hîtîti de cihnava vegerok bi alîkariya qertafa *-il(a)* û partîkela *-z(a)* 'yê çêdibe. Qertafa *-il(a)* bi cihnavên kesane re tê nivîsandin û wateya û " xwe " bi xwe" " dide. Partîkela *-z(a)* 'yê jî tê wateya " xwe" ye.⁴⁷⁶ Dema bi lêkeran re tê bikaranîn hinek wateyên wan diguherîne.⁴⁷⁷

⁴⁷³ Rieken, b.n., r. 197.

⁴⁷⁴ Rieken, h.b., r. 229.

⁴⁷⁵ Rieken, h.b., r. 152.

⁴⁷⁶ Abbreviations & conventional markings-Oriental Institute <https://oi.uchicago.edu/pdf/HittLang.pdf> (1.12.2018)

⁴⁷⁷ Lauffenburger, b.n., r. 88.

Tablo 75. Cihnavê Vegerok (Hîtîti)

	Cihnavên kesane	Qertafa -îl(a)		
	<i>uk</i>	-îl(a)	<i>ukîla</i>	ez xwe / bi xwe , min xwe / bi xwe
	<i>zîk</i>		<i>zîkîla</i>	tu xwe / bi xwe , te xwe / bi xwe
	<i>apas</i>		<i>apasîla</i>	ew xwe / bi xwe , wî/ê xwe / bixwe
	<i>sumas</i>		<i>sumasîla</i>	hûn xwe / bi xwe , we xwe / bi xwe ⁴⁷⁸
H î t î t î	Lêker	bê -z(a)	bi -z(a)	
	<i>aus(s)</i>	dîtin	fahmkirin, hînbûn, pêhesîn, tecribekirin	
	<i>armahh</i>	himîlekirin	himileman	
	<i>kîs</i>	derbasbûn	bûn	
	<i>pahs</i>	parastin	parastin	
	<i>sakuwaye/a</i>	temaşê kirin	dîtin	
	<i>peda</i>	birin, koç kirin	bi xwe re birin	
	<i>îye/a</i>	kirin	yezdanek pîrozkirin	
	<i>halzîssa</i>	bangkirin	binavkirin, navlêkirin	
	<i>es</i>	rûnistin	rûnistin, cihêxwegirtin, xwedanîn ⁴⁷⁹	
	<i>tarh</i>	biserketin	(yek) têkbirin ⁴⁸⁰	

Dema em li tabloyê dinêrin di hîtîti de Cihnavê vegerok taybetmendiyeke wê derdikeve holê. Ev taybetmendî jî ew e ku cihnavê vegerok bi du forma tê çekirin. Qertafa **-î(la)** bi cihnavên kesane re tê bi kar anîn. Mînak: **apasîla** le uwazî " ew **bixwe** naye", **ukîla** paîmî " ez **bixwe** dimeşim". Partîkala **-z(a)** jî bi lêkeran re tê bikaranîn.

Mînak:

⁴⁸¹ *mahhanma -za ABUYA^m Mursîlîs DINGIR^{LIM}-îs kîsat.*

" lê dema bavê min Mursîlî **bû** Yezdan..." (dema bavê min mir)

⁴⁸² *ta= z kîssarus arrî*

" ew destên **xwe** dişo. "

⁴⁸³ *nu= za harpanallîn kuîn taruhhun nu=ssî îrhus tehun*

" min kîjan dijminê **xwe** têk bir min sînorên wî diyar kir. "

2.2.1.3. Cihnavên Xwedîtiyê

Hîtîtiyan ji bo cihnavên xwedîtiyê him forma cihnavên enklîtîk him jî forma

⁴⁷⁸ Dinçol, b.n., r. 76.

⁴⁷⁹ Rieken, b.n., r. 73.

⁴⁸⁰ Lauffenburger, b.n., r. 88.

⁴⁸¹ Heinrichs, b.n., r. 32.

⁴⁸² Rieken, b.n., r. 73.

⁴⁸³ Rieken, h.b., r. 108-9

cihnavên kesane yê serbixwe bi kar anîne.⁴⁸⁴ Cihnavên kesane yê serbixwe halên genîtîf di dema împaratoriyê de di şûna cihnavên xwedîtiyê de bi kar anîne.⁴⁸⁵

Ev cihnav in: *ammel* " a/ê/ên min" *tuel* " a/ê/ên te" *apêl* " a/ê/ên wî/ê", *anzel* " a/ê/ên me", *sumel* " a/ê/ên we" , *apenzan* " a/ê/ên wan".⁴⁸⁶

Mînak:

Gen. Sg. 1. *ammel* *attas*
" bavê **min**"

Gen. sg . 2. *tuel* *annî*
" ji diya **te** re" ⁴⁸⁷

Gen. Sg. 1. *ammel*^{LU} *KUR*
" dijminê **min** " ⁴⁸⁸

Hîtîtiyan ji bilî van, cihnavên Akadiyan yê xwedîtiyê jî bi kar anîne.⁴⁸⁹
Yekjimar: 1. *YA* " a/ê/ên min" 2. *KA* (m.), *KI* (f.) " a/ê/ên te" 3. *SU* (m.), *SA* (f) " a/ê/ên wî/ê
Pirjimar: 1. *NI* " a/ê/ên me" 2. *KUNU* (m.), *KINA* (f.) " a/ê/ên we" 3. *SUNU* (m.), *SINA* (f.)⁴⁹⁰

Mînak: Sg. 2. *DUMU-KA*
" kurê **te**" ⁴⁹¹

Tablo 76. Cihnavên Xwedîtiyê yê Enklîtîk (Hîtîti)

Hîtîti						
Cihnavên Xwedîtiyê yê Enklîtîk						
Yekjimar	a/ê/ên min	a/ê/ên te	a/ê/ên wî/ê	a/ê/ên me	a/ê/ên we	a/ê/ên wan
	<i>Sg.1.-mî/a</i>	<i>Sg.2.tî/a</i>	<i>Sg.3. sî/a</i>	<i>Pl.1.summî/a</i>	<i>Pl.2.smî/a</i>	<i>Pl.3. smî/a</i>
Nom.c.	<i>mîs</i>	<i>tîs</i>	<i>sîs</i>	<i>summîs</i>	<i>smîs</i>	<i>smîs</i>
Akk.c.	<i>mîn, man</i>	<i>tîn</i>	<i>sîn, san</i>	<i>summîn</i>	<i>sman</i>	<i>sman</i>
Nom.-Akk. n.	<i>mît</i>	<i>tît</i>	<i>sît</i>	<i>summît</i>	<i>smît</i>	<i>smît</i>
Gen.	<i>mas</i>	<i>tas</i>	<i>sas</i>	<i>summas</i>	<i>sma</i>	<i>sma</i>

⁴⁸⁴ Zeilfelder, b.n., r. 112.

⁴⁸⁵ Dinçol, b.n., r. 78.

⁴⁸⁶ Hoffner & Melchert, b.n., r. 133.

⁴⁸⁷ Lauffenburge, b.n., r. 37.

⁴⁸⁸ Rieken, b.n., r. 157.

⁴⁸⁹ Van Den Hout, b.n., r. 78.

⁴⁹⁰ Bloch, b.n., r. 3.

⁴⁹¹ Heinrichs, b.n., r. 40.

Dat.-Lok.	<i>mî</i>	<i>tî</i>	<i>sî</i>	<i>summî/a</i>	<i>smî/a</i>	<i>smî/a</i>
Abl./Instr.	<i>mît</i>	<i>tît</i>	<i>sît</i>	<i>summît</i>	<i>smît</i>	<i>smît</i> ⁴⁹²
Vok.	<i>mî</i> ⁴⁹³					
Pirjimar	Sg.1.	Sg.2.	Sg.3.	Pl.1.	Pl.2.	Pl.3.
Nom.com	<i>mas</i>	<i>tîs/tes</i>	<i>ses</i>		<i>smes</i>	
Akk.com	<i>mus</i>	<i>tus</i>	<i>sus</i>	<i>summus</i>		
Nom.-Akk. n.	<i>mît, met</i>		<i>set</i>		<i>smet</i>	<i>smus</i>
Gen.	<i>man</i>					
Dat.-Lok.		<i>tas</i>				<i>smas</i>
Abl./Instr.						⁴⁹⁴

Dema em tabloya cihnavên xwedîtiyê yê Enklîtik dinêrin. Di hîtîti û zaravayên kurdî de hinek cihnav nêzi hev in.

Hîtîti	Kurmancî	Zazakî	Soranî	Goranî
mî	min	mi(n)	min	amin
tî/a	te	tu	to	tu
<i>sî/a</i>	<i>wî/ê</i>	<i>ey/ayê</i>	<i>ew</i>	<i>a/aw</i>
<i>summî/a</i>	<i>me</i>	<i>ma</i>	<i>ême</i>	<i>ema</i>
smî/a	we	şima	êwe	şuma
<i>smî/a</i>	<i>wan</i>	<i>înan</i>	<i>ewan</i>	<i>işan</i>

Hinek mînak ji bo cihnavên xwedîtiyê yê enklîtik

Mînak:

Nom. c. Sg.1. *tuzziyas=mîs*

"artêşa **min**"

Gen. Sg. 2. *kardiyas=tas*

"qelbê **te**" ⁴⁹⁵

Nom. Pl. 2. *ares=smes*

"hevalên **we**"

Nom.-Akk. n. Sg. 3. *genu=sît*

"çogê **wî/ê**"

Nom.-Akk. n. Pl. 3. *genus=sus*

⁴⁹² Bloch, b.n., r. 3.

⁴⁹³ Cotticelli-Kurras, b.n., r. 15.

⁴⁹⁴ Zeilfelder, b.n., r. 113.

⁴⁹⁵ Hoffner & Melchert, b.n., r. 139.

" çoğên wî/wê" ⁴⁹⁶

Nom. Sg. 1. *attas=miş*

" bavê **min** "

Nom. Pl. 1. *attas= şumîs*

" bavê **me** "

Nom. Pl. 1. *attes=mes*

" bavên **min** "

Nom. Pl. 1. *attes=şumes*

" bavên **me** " ⁴⁹⁷

2.2.1.4. Cihnavên Şanîdanê

Di hîtîti de sê cihnavên şanîdanê hene: *ka*, " ev, vî/ê (herî nêzîk) ," *apa* " ew, wî/ê (nîvek nêzîk) " û *asî* " ew, wî/ê (dûr)." ⁴⁹⁸Ji cihnava *ka* û *apa*'yê hinek hoker hatine dariştin. Wek *ka* " li vir" *ket* " vir", *kez* " ji vir" *apiya* " li wir" *apeda* " wir", " *apez* " ji wir". Dîsa ji koka *ka*'yê du baneşan bi şiklê *kasa* " binêrin" û *kasma* " bibînin" hatine dariştin. ⁴⁹⁹

Kêşana cihnavên şanîdanê bi wî awahî çêdibe.

Tab.lo 77. Kêşana Cihnavên Şanîdanê (Hîtîti)

Kêşana Cihnavên Şanîdanê					
H î t î t î î	500	Sg.	Pl.	Sg.	Pl
		<i>ka: ev, vî/ê</i>	<i>ke: van</i>	<i>apa: ew, wî/ê</i>	<i>ape: wan</i>
	Nom.c.	<i>kas</i>	<i>ke, (keus)</i>	<i>apas</i>	<i>ape</i>
	Akk. c.	<i>kun</i>	<i>kus (keus)</i>	<i>apun</i>	<i>apus</i>
	Nom.-Akk. n	<i>kî, ke</i>	<i>ke, kî</i>	<i>apat</i>	<i>ape</i>
	Gen.	<i>kel</i>	<i>kenzan, kedas</i>	<i>apel</i>	<i>apenzan</i>
	Dat.-Lok.	<i>kedanî, ket/î</i>	<i>kedas</i>	<i>apedanî, apet/î</i>	<i>apedas</i>
	Abl.	<i>kezza, kezzî</i>		<i>apez</i>	
	Instr.	<i>kedand(a)</i>		<i>apedanda</i>	
		501	Sg.	Pl.	
		<i>asî/unî/enî: ew, wî/ê</i>	<i>unîus: wan</i>		
Nom.c.		<i>asîs, unîs, enîs</i>	<i>unîus, enîus</i>		
Akk. c.		<i>unî, unîn, asî</i>	<i>unîus, unî</i>		

⁴⁹⁶ Süel, b.n., r. 440-1.

⁴⁹⁷ Bloch, b.n., r. 3.

⁴⁹⁸ Hoffner & Melchert, b.n., r. 283.

⁴⁹⁹ Diñçol, b.n., r. 81.

⁵⁰⁰ P. Streck, b.n., r. 95.

⁵⁰¹ Cotticelli Kurras, b.n., r. 17.

Nom.-Akk. n	<i>enî, îni, unî</i>	<i>enî</i>
Gen.	<i>unîyas, ⁵⁰² asî, el</i>	-
Dat.-Lok.	<i>edanî</i>	<i>edas</i>
Abl.	<i>edez</i>	

Di tablo de diyar e Hîtîtiyan cihnavên şanîdanê li gorî dûrahiyê bi sê forma bi kar anîne: *ka/apa/asî*/ "herî nêzîk/nivek nêzîk/dûr.

Mînak:

kas antuhsas " *ev mirov* " (*herî nêzîk*)

apas antuhsas " *ew mirov* " (*nivek nêzîk*)

asîs antuhsas " *ew mirov* " (*dûr*)

⁵⁰³Nom.-akk. n. Pl. *mahhan* =*kan ke kistanunun*
" min *ev* çawa jêbirin "

⁵⁰⁴Nom. akk. n. Sg. *enî kurur*
" *ew* dijmin "

Nom. akk. Sg. *enî DUB.BA*
" *ew* tablet "

Nom. akk. Pl. *unî AWATE ^{MES}*
" *wan* gotinan "

2.2.1.5. Cihnavên Nediya

Di hîtîti de cihnavên nediyar *-kuîskî* " kesêk " û *kuîssa* " her kes " ,⁵⁰⁵ her kî, hinik, her yek⁵⁰⁶ *kuîtkî n.* " tiştêk " ,⁵⁰⁷ bi nerêniya *UL* 'ê jî *UL kuîskî c.* " tu kes " , *UL kuîtkî* " tu tişt " .⁵⁰⁸ Koka cihnavên nediyar, pirsyariyê û girêkî *kui/kue ye*⁵⁰⁹ û bi alîkariya paşgira *-ki/a* 'yê dikeve forma *kuîskî, kuelka*.⁵¹⁰ Her wiha, du nîv-cihnavên ji

⁵⁰² Van Den Hout, b.n., r. 137.

⁵⁰³ Rieken, b.n., r. 226.

⁵⁰⁴ Ünal, b.n., r. 164.

⁵⁰⁵ P. Streck, b.n., r. 96.

⁵⁰⁶ Diñçol, b.n., r. 84.

⁵⁰⁷ Brosch, b.n., r. 21.

⁵⁰⁸ Diñçol, b.n., r. 84.

⁵⁰⁹ Rieken, b.n., r. 124.

⁵¹⁰ Van Den Hout, b.n., r. 99.

eynî kokê jî hene: Nîv-cihnava *dama(î)* " a/ê din" û *dapî(ya)* " her kes, her yek, her tişt".⁵¹¹

Tablo 78. Cihnavên nediyar kuîskî, kuîtkî û kuîssa (Hîtîti)

Hîtîti		
512 Cihnavên nediyar kuîskî/kuîtkî		
Hal	Sg.	Pl.
Nom. c.	<i>kuîskî</i>	<i>kuîeska</i>
Akk. com	<i>kuînkî</i>	<i>kuîuska</i>
Nom.-Akk. n	<i>kuîtkî</i>	<i>kuêka, kuêkkî</i>
Gen.	<i>kuelka (kuelkî)</i> ⁵¹³ <i>kuelqa</i>	-
Dat.-Lok.	⁵¹⁴ <i>kuedanîkkî (kuedanîkka)</i>	<i>kuedaska</i>
Abl.	<i>kuêzka, kuêzaka</i>	
515 kuîssa		
Hal	Sg.	Pl.
Nom. c.	<i>kuîssa</i>	<i>kuêsqa, kuêssa</i>
Akk. com	<i>kuînna</i>	<i>kuîusga, kuîussa</i>
Nom.-Akk. n	<i>kuîtta</i>	<i>kuêga, kuêkkî</i>
Gen.	<i>kuella</i>	-
Dat.-Lok.	<i>kuedanîya</i>	<i>kuedasqa,</i> ⁵¹⁶ <i>kuedassa</i>
Abl.	<i>kuêzziya</i>	

Di hîtîti de cinavkên nediyar **kuîskî** c. /**kuîtkî** n. ji koka **kuî**'yê hatine dariştin. Cihnava **kuîs** dişibihe cihnava kurmancî "kesêk". *nuwa kuîskî le uwazî* "anha kesêk nehat". Cihnavên nediyar di hin hevokên nivîsên mixî de bi awahî derbasbûne.

Minak:

⁵¹⁷Nom. c. Sg. *nassu DINGIR-LIM -ni kuîskî peran wastî*

" ger) **kesêk** gunehêk berî Yezdan kiribe. "

⁵¹⁸Nom. c. Sg. *kuîssa para SA ½ UPNI kittarî*

" **her yekî** nîv çengê tijî li wir heye"

Tablo 79. Cihnavên nediyar t/dama(î) û /dapî(ya)

Hîtîti	
519 Cihnava nediyar t/dama(î)	

⁵¹¹ Diñçol, b.n., r. 84.

⁵¹² Van Den Hout, b.n., r. 99.

⁵¹³ Cotticelli Kurras, b.n., r. 17.

⁵¹⁴ Rieken, b.n., r. 124.

⁵¹⁵ Diñçol, b.n., r. 84.

⁵¹⁶ Rieken, b.n., r. 124.

⁵¹⁷ Hoffner & Melchert, b.n., r. 151.

⁵¹⁸ Ünal, b.n., r. 166.

⁵¹⁹ Hoffner & Melchert, b.n., r. 152.

Hal	Sg.	Pl.
Nom. c.	<i>t/damaîs</i>	<i>t/damaes, damaus</i>
Akk. com	<i>t/damaîn</i>	<i>t/damaus</i>
Nom.-Akk. n	<i>t/damaî</i>	
Gen.	<i>t/damel</i>	-
Dat.-Lok.	<i>t/damedani, dametani</i>	<i>damedas</i>
Abl.	<i>tammatta, dameda</i>	<i>damedaz</i>
520 Cihnavâ nediyar dapî(ya)		
Hal	Sg.	Pl.
Nom. c.	<i>dapîanza</i>	<i>dapîantes, dapîdes</i>
Akk. c.	<i>dapîan</i>	<i>dapîus, dapîandus, dapîes</i>
Nom.-Akk. n	<i>dapîan, dapîn</i>	<i>dapîda, dapîanda</i>
Gen.	<i>dapîas</i>	<i>dapîdas</i>
Dat.-Lok.	<i>dapî, dapîantî</i>	<i>dapîas, dapîdas, dapîandas</i>
Abl.	<i>dapîz(a), dapîaz, dapîdaz, tamedaz(a)</i> ⁵²¹	

Di hîtîti de ji bilî cihnavên nediyar *kuîskî/kuîtkî*, cinavkên nediyar bi şiklê formên *dama(î)* û *dapî(ya)* jî derdikevin pêşiya me.

Mînak

tamaîs happîras

"*bajarê din*"

dapîanza paîzî

"*her kes diçe*"

2.2.1.6. Cihnavên Pirsîyariyê

Di hîtîti de cihnavên pirsîyariyê *kuî* û *kuê*⁵²²têne wateya " *kî, kîjan, çi*". Her wiha ji vê kokê hinek hoker jî hatine dariştin. Wek *kuwat*" *çima*", *kuwapî* " *kengî, li ku*" ⁵²³*masî* " *çi qas*" ⁵²⁴

Tablo 80. Cihnavên Pirsîyariyê kuî û kuê (Hîtîti)

Hîtîti		
Cihnavên Pirsîyariyê kuî/kuê		
Hal	Sg.	Pl.
Nom. c.	<i>kuîs</i>	<i>kuîes, kueus</i>
Akk. c.	<i>kuîn</i>	<i>kuîus, kuîes</i>
Nom.-Akk. n.	<i>kuît</i>	<i>kuê</i>

⁵²⁰ Rieken, b.n., r. 114.

⁵²¹ Hoffner & Melchert, b.n., r. 152.

⁵²² Rieken, b.n., r. 106.

⁵²³ Van Den Hout, b.n., r. 87.

⁵²⁴ Ünal, b.n. r. 165.

Gen.	<i>kuel</i>	-
Dat.-Lok.	<i>kuedanî</i>	<i>kuedas</i>
Abl.	<i>kuez(za)</i>	

Koka cihnavê **kuî/e** nêzi koka cihnavê kurmancî **kî'yê** ye. Dema em hînek mînak bidin yê bi awahî çêbibe. **kuîs** apas ? Ew **kî** ye ? kuîes ape ? Ew **kî** ne ?

⁵²⁵ Nom.-Akk. n. Sg. **kuît** apat?, *nu namma kuît?*

" ew **çi** ye ? " " hê **çi** heye? "

⁵²⁶ mase mase ^{NINDA} takarmus LUGAL-us parsiya

" Qral çiqas nanê takarmus parve bike. "

2.2.1.7. Cihnavên Girêkî

Koka cihnavên girêkî jî wek koka cihnavên pirsiyariyê ji *kuî/kue* 'yê ye,⁵²⁷ têne wateya " *kî, kê, kîjan, ku*".⁵²⁸ Cihnavê *kuîs* carna dubare û carna jî bi hokera *îmma* re tê nivîsandin.⁵²⁹ Bikaranîna wê wisa ye: *kuîs kuîs, kuîs-as* " her kî", *kuîs îmma, kuîs îmma kuîs, kuîs-as îmma, kuîs-as îmma kuîs* " kesêk"

Kêşana cihnavên girêkî halê Nom.-Akk., Dat.-Lok. û Abl.

Nom.-akk. Pl. *kue kue*, Gen. *kue îmma*, Dat.-Lok. Sg. *kuedanî, kuedanî îmma*, Dat.-Lok. Pl. *kuedas kuedas*, Abl. Sg. *kuez îmma kuez*.⁵³⁰

Mînak:

Akk. Pl. *nu= za utne keu taruhhun nu= smas îrhus tehun.*

" Dewletên **ku** min têk birin, min sînozen wan diyar kir. "

Dat.-Lok. Pl. *nu utniyantas kuedas panun nu=us=za taruhhun*

" Ez çûme **kîjan** welatan min ew têk birin. "⁵³¹

Nom. Sg. **kuîs kuîs** pehuteîzzî

⁵²⁵ Süel, b.n., r. 45.

⁵²⁶ Ünal, b.n., r. 165.

⁵²⁷ Rieken, b.n., r. 107.

⁵²⁸ Van Den Hout, b.n., r. 86.

⁵²⁹ Cotticelli Kurras, b.n., r. 17.

⁵³⁰ Dinçol, b.n., r. 82-3.

⁵³¹ Rieken, b.n., r. 107-8

2.2.2. Di Kurmancî De Cihnav

Di kurmancî de cureyên cihnavan ev in: cihnavên kesane, cihnavên kesandinê, cihnavên xwedîtîyê, cihnavên şanîdanê, cihnavên nediyar, cihnavên pirsîyariyê, cihnavên berbihevîn, cihnavên lihevxiştî, cihnavên girêkî, cihnava vegerok, cihnavên qertafî û jimari. ⁵³³

2.2.2.1. Cihnavên Kesane

Cihnavên kesane ew bêje ne yê di hevokan de cihê navên kesane, giyanwer û tiştan digrin. ⁵³⁴ Di kurmancî de cihnavên kesane dibin du cure: cihnavên kesane yê xwerû û tewandî.

Tablo 81. Cihnavên Kesane (Kurmancî)

Cihnavên Kesane yê Xwerû			Cihnavên Kesane yê Tewandî	
	Sg.	Pl.	Sg.	Pl.
1	ez	em	min	me
2	tu	hûn	te	we
3	ew	ew	wî	m.
			wê	f.
				wan

Dema em tabloya cihnavên kesane yê kurmancî dinêrin. Di cihnavên xwerû kesê sêyem de zayen nîn e, lê di cihnavên tewandî kesê sêyem de zayend heye. Zayenda nêr " wî " û mê " wê " ye. Dema em cihnava kesê sêyem dinêrin dibe ku bi vî şiklî hatibine guhertin.

Cihnava xwerû → ew → qertafa tewangê nêr -î → ewî → ketine -e → wî

Cihnava xwerû → ew → qertafa tewangê mê -ê → ewê → ketine -e → wê

Di kurmancî de lêker di bin bandora cihnavên xwerû de ye û li gorî wê jî tê kişandin. Cihnavên xwerû bi alîkariya cihnavên kesandinê yekjimari *im/me, î/yî, e/ye* û pirjimari *in/ne* pêk tên. *Ez im, tu yî, ew e, em in, hûn in, ew in.*

⁵³² Ünal, b.n., r. 164.

⁵³³ Samur (2012), b.n., r. 10.

⁵³⁴ Ocek, b.n., r. 113.

⁵³⁵Di dema borî, niha û bê de lêkerên negerguhêz cihnavên xwerû tèn bikaranîn.

Mînak: Ketin

Dema borî: Ez ketim, *Dema niha:* Ez dikevim, *Dema bê:* Ez ê bikevim.

Di dema borî de di lêkerên gerguhêz de cihnavên tewandî, di dema niha û bê di lêkerên gerguhêz de cihnavên xwerû tèn bikaranîn.

Mînak: Dîtin

Dema borî: **Mîn** kevir dît, *Dema niha:* **Ez** kevirî dibinim, *Dema bê:* **Ez** ê kevirî bibînim.

Di lêkerên gerguhêz ên dema borî de kirde dibe cihnavên tewandî, bireser dibe cihnavên xwerû. Di dema niha û bê de kirde dibin cihnavên xwerû, bireser dibin cihnavên tewandî.

Mînak:

Dîtin

Dema borî: **Mîn** tu dîtî, *Dema niha:* **Ez** te dibinim, *Dema bê:* **Ez** ê te bibînim.

2.2.2.2. Cihnava Vegerok

Di kurmancî de cihnaveke vegerok heye, ew jî cihnava " *xwe* " ye.⁵³⁶ Li hin herêman wek " *xo*, *xe* " jî tê gotin.⁵³⁷ Dema ku karê kirde dike dîsa li kirdeyê vedigere cihnava vegerok tê bikaranîn. Ji ber vê yekê navê wê cihnava vegerok e.

Mînak:

Ew **xwe** dişo/dişon.

Wî/ê **xwe** şûşt.

Wan **xwe** şûştin.⁵³⁸

Zîne serê **xwe** şûştiye.

Bizin **xwe** dixurîne.⁵³⁹

⁵³⁵ Yıldırım, b.n., r. 229-230.

⁵³⁶ Ocek, b.n., r. 120.

⁵³⁷ Deham Ebdulfettah, *Cînav di Zimanê Kurdî de: Kurmanciya Jorîn, Weş. Enstituya Kurdi ya Amedê, Stenbol, 2006, r. t., [https://books.google.de/books?id=BMOsBwAAQBAJ\(8.3.2019\)](https://books.google.de/books?id=BMOsBwAAQBAJ(8.3.2019)).*

⁵³⁸ Ocek, b.n., r. 120-1

⁵³⁹ Ebdulfettah, b.n., r. t.

Ji aliyê zayendê û mêjerê ve cihaveke nêtar e, cihê herdu zayendan (mê û nêr) digire, him jî dikeve cihê nav û cihnavên yekjimar û pirjimar.

Mînak:

Tu/ew **xwe** fêrî zimên dikî/dikin (yekjimar û pirjimar).

Her dîn kincên **xwe** naqetîne (mê û nêr).

Dema di hevokê de kirde û bireser himan kes be, cihnava "xwe" yê di şûna bireserê de tê bikaranîn.

Mînak:

Ez **xwe** dibînim (kirde û bireser himan kes e **xwe** bireser e.)⁵⁴⁰

Cihnava "xwe" wateya cihnavên kesane perçîn dike. Mînak:

Min cihê **xwe** xweş kir.

Ez bi **xwe** çûm.⁵⁴¹

Ez bi **xwe** hatim.

Me bi **xwe** got.⁵⁴²

2.2.2.3. Cihnavên Xwedîtiyê

Di kurmanci de cihnavên xwedîtiyê ji veqetandek, cihnava veqerok, cihnavên kesane yên tewandî û cihnavên şanîdanê yên tewandî, cihnava veqerok û ji veqetandekên diyarkirî pêk tên.⁵⁴³ Veqetandekên diyarkirî yekjimar *-a* (mê), *-ê* (nêr), pirjimar *-ên* ligel cihnavên kesane yên tewandî yekjimar *min*, *te*, *wî/wê*, pirjimar *me*, *we*, *wan* tên û cihnavên xwedîtiyê pêk tînin.

Cihnavên xwedîtiyê

Yekjimar -mê: a min, a te, a wî/wê, a me, a we, a wan

Yekjimar -nêr: ê min, ê te, ê wî/wê, ê me, ê we, ê wan

Pirjimar: ên min, ên te, ên wî/wê, ên me, ên we, ên wan⁵⁴⁴

⁵⁴⁰ Ocek, b.n., r. 120-1

⁵⁴¹ Aktuğ, b.n., r.256.

⁵⁴² Tan, b.n., r. 132.

⁵⁴³ Taş, b.n., r. 129.

⁵⁴⁴ Tan, b.n., r. 149-50

Mînak:

Keça te dibistan xelas kir, **a min** xelas nekir.

Kurê te çû gund, **ê min** ji gund hat.

Mamosteyên we biyanî ne, **yên me** xuyanî ne.⁵⁴⁵

Bi veqetandekên binavkirî û cihnavaya veqerok

a xwe, ê xwe, ên xwe

Mînak:

Ê xwe biparêzê baş e.

A xwe bixapîne ne baş e.

Ên xwe azad dikin bedew dibin.⁵⁴⁶

Wan **a xwe** nedan min.

Xatunê **yê xwe** da min.

Berfinê **yên xwe** kil kirin.⁵⁴⁷

Bi veqetandekên binavkirî û cihnavên kesane yên tewandî.

a vî, a vê, a van

ê vî, ê vê, ê van

ên vî, ên vê, ên van

Mînak

Dara gûzê **ya vî** ye.

Sêva sor **a vê** ye.

Mala mezin **a van** e.

Tevîr **ê vî** ye.

Ev derî **yê vê** ye.

Ev hesp **ê van** e.

Ev dar **ên vî** ne.

Ev gul **ên vê** ne

Baxçê **yên van** in.⁵⁴⁸

⁵⁴⁵ Yıldırım, b.n., r. 237.

⁵⁴⁶ Ocek, b.n., r. 124.

⁵⁴⁷ Taş, b.n., r. 129.

⁵⁴⁸ Tan., b.n., r. 150.

2.2.2.4. Cihnavên Şanîdanê

Cihnavên şanîdanê tişteki nêzîk û dûr nîşanî me didin. Di nava xwe de dibin du cure, cihnavên şanîdanê yê xwerû û tewandî.

Cihnavên şanîdanê yê xwerû

Du heb in. Yekjimar **Ev** (nêzîk) û **ew** (dûr) in û ji aliyê zayende ve jî nêtar in. Bi cihnavên kesandinê yekjimarî û pirjimarî wan diyar dibe.

Mînak:

Yekjimar-nêzîk: Ev hat.

Yekjimar-dûr: Ew hat

Pirjimar- nêzîk: Ev hatin

*Pirjimar-dûr: Ew hatin*⁵⁴⁹

Cihnavên şanîdanê yê tewandî

Cinavkên şanîdanê yê xwerû **ev** û **ew** dema tèn tewandin. Halê wan mêjer û zayendê wisa ye:

Ev

Ew

Yekjimar-nêzîk-nêr: vî

Yekjimar-dûr- nêr: wî

Yekjimar-nêzîk-mê: vê

Yekjimar-dûr-mê: wê

Pirjimar-nêzîk: van

Pirjimar-dûr: wan

Mînak:

Vî çend sêv xwarin.

Wî çend sêv xwarin.

Vê çend sêv xwarin.

Wê çên sêv xwarin.

Van çend sêv xwarin.

Wan çend sêv xwarin.⁵⁵⁰

2.2.2.5. Cihnavên Nediya

Cihê navên nediya digirin. Hinek ji wan li gorî mêjer û zayendê ditewin. Yê bingehîn ev in:

Hin, hinek, hiç, qet, tu, hemû, kes, ewk, çik, filan, bêvan, her yek, gelek, giş,

⁵⁴⁹ Ocek, b.n., r. 118-9.

⁵⁵⁰ Yıldırım, b.n., r. 235.

gişk, çend, kes, kesêk,⁵⁵¹ yek, çîk, piçek, heçî.

Mînak:

Hin dîkin **hin** jî dixwin.

Tiştêk bi **kesî** nebûye.

Heçî kurd be divê fêrî zimanê xwe bibe.⁵⁵²

Her yek li dû xem û xeyalên xwe ketibûn.

Gelekan ji gotinên te tiştêk fêhm nekir.

Yekî helbesta jibîrbûyiyan xwend, **gişk** giriyan piştî jibîrbûyiyan.⁵⁵³

Hemû tên li me diqelibin.

Her yek bi aliyekî ve çûye.

Yekî ji **yekê** re got, meçe!⁵⁵⁴

2.2.2.6. Cihnavên Pirsiyariyê

Cihnavên pirsiyariyê, ji aliyê pirsê ve di hevokê de cihê navan û cihnavên din digirin. Hin cihnavên pirsiyariyê ev in: **kî, kê, kîjan, çî, çend**.⁵⁵⁵

Yekjimar-pirjimar-xwerû: **kî**

Yekjimar-pirjimar-tewandî: **kê**

Yekjimar-pirjimar-mê û nêr-tewandî: **kîjanê/kîjanî/kîjanan**

Yekjimar-pirjimar-nêtar: **çî**

Pirjimar-hevedudanî: **çend**

Mînak:

Kî berxan dibe gund?

Kê stranên evîne gotin?

Kîjanê/ kîjanî got?

Çî firî?

Ew **çend** in?

Kî ne ên helbestan dixwînin?

Kê ne ên çavên xwe kil kirin?⁵⁵⁶

Kîjanan gotin?

Çî birin?

Te **çend** dîtin?⁵⁵⁷

⁵⁵¹ Taş, b.n., r. 128

⁵⁵² Ocek, b.n., r. 134.

⁵⁵³ Taş, b.n., r. 128

⁵⁵⁴ Tan, b.n., r. 149.

⁵⁵⁵ Ocek, b.n., r. 132

⁵⁵⁶ Taş, b.n., r. 126.

⁵⁵⁷ Tan, b.n., r. 155-6.

2.2.2.7. Cihnavên Girêkî

Cihnavên girêkî ji veqetandekên diyarkirî yekjimar *-a* (mê), *-ê* (nêr) û pirjimar *-ên* û cihnavên *ku* 'yê pêk tên. Ev cihnav hevokan digihîjîne hev û wan bi hev ve girê dide.

Mînak:

Ê/a ku helbestan dixwîne hevalê/a min e.

Ên ku helbestan dixwînin hevalên me..⁵⁵⁸

Ji aliyê cihnavan ve nuqteyên hevbeş

a) Di hîtî û kurmancî de cihnavên kesandinê dema tî dema dawiya lêkerê, cihnavên kesane nîşan didin.

Hîtî

(*ammuk*) *paîmî*

(*anzas*) *paîwenî*

Kurmancî

(ez) *diçim*

(em) *diçin*

b) Di hîtî û kurmancî de cihnavên xwedîtiyê dema aîdiyetê didin, pêşî nav pişt re cihnav tên.

Hîtî

kardiyas=tas

Kurmancî

qelbê *te*

c) Di hîtî û kurmancî de hinek cihnavên pirsîyariyê nêzî hev in.

Hîtî

kûi/kue

Kurmancî

kî/kîjan

d) Cihnavên girêkî di hîtî de *kûi/kue* ye û di kurmancî de *ku* ye koka wan nêzî hev in.

Hîtî: *nu= za utne keu taruhhun nu= smas îrhus tehun.*

Kurmancî: Dewletên *ku* min tîk birin, min sînorên wan diyar kirin.

e) Di hîtî û kurmancî de hinek cihnavên nediyar nêzî hev in.

Hîtî

kûiskî

Kurmancî

kesêk

f) Di hîtî û kurmancî de cihnavên kesane forma kesê sêyem û forma cihnavên şanîdanê de eynî form e.

⁵⁵⁸ Ocek, b.n., r. 131.

Cihnav kesane/şanîdanê

Hîtîfî		Kurmancî
	<i>apa: ew</i>	
Cihnav şanîdanê:	<i>apas antuhsas</i>	ew mirov
Cihnav kesane:	<i>apas le uwasî</i>	ew naye

Ji aliyê cihnavan ve nuqteyên cuda

a) Ji aliyê cureyên cihnavan ve yên hîtîfî ji yên kurmancî kêmtir in.

b) Di hîtîfî de cihnavên kesane yên serbixwe halên genîfîf pêşî cihnav tîn pişt re nav, di kurmancî de pêşî nav tîn pişt re cihnav.

Hîtîfî	Kurmancî
Gen.sg. 2. <i>ammel attas</i>	bavê min

c) Di hîtîfî de cihnav vegerek bi alîkariya qertafa *îl(a)*- û partîkela *z(a)* 'yê çêdibe. Di kurmancî de bi cinavka vegerek bi alîkariya *xwe* 'yê çêdibe.

Hîtîfî

Qertafa *îl(a)*-

sumasîla " hûn *xwe*/ bi *xwe*, we *xwe*/bi *xwe*"

Partîkela *z(a)*-

ta= z kîssarus arrî

" ew destên *xwe* dişo"

Kurmancî

" ew destên *xwe* dişo/dişon"

d) Di hîtîfî de partîkela *-z(a)* " *xwe*" Dema bi lêkeran re tê bikaranîn wateya hinek lêkeran diguherîne. Di kurmancî de cihnav *xweyê* wateya ti lêkeran naguherîne.

Hîtîfî

Lêker *bê (a)* *bi z(a)*

halzîssa bangkirin binavkirin, navlêkirin

Kurmancî

Lêker *bê xwe* *bi xwe*

şuştin şuştin *xwe* şuştin

e) Di hîtîfî de dema cihnav tên kêşandin di dawîya wan de hinek taybemendî çêdibin. Halê *gen. Sg/Pl* bi paşgira *-el* tê dawîkirin. Di kurmancî de taybemendiyeke wisa nîne.

Hîtîfî

Cihnavên Kesane yê Serbixwe

ammuk " ez, min", *zîk* " tu, te", *ape* " ew, wî/ê", *anzas* " em, me", *sumes* " hûn, we"

Gen. Sg.1. *amel*, Sg.2. *tuel*, Sg.3. *apel*

Gen. Pl. 1. *anzel*, Pl. 2. *sumel*

Kêşana Cihnavên Şanîdanê

ka " ev, vî/ê (herî nêzîk)", *ape* " ew, wî/ê (nîvek nêzîk)", *asî* " ew, wî/ê (dûr)"

Gen. *kel*, *apel*, *el*

Cihnavên pîrsiyariyê

kuî/e " kî, kîjan?, çi?"

Gen. *kuel*

Cihnavên Girêkî

kuî/e " kî, kê, kîjan, kû"

Gen. *kuel imma*

f) Di hîtîfî de dema cihnav tên kêşandin di dawîya wan de hinek taybemendî çêdibin. Halê *Gen. Pl.* bi paşgira *-enzan* tên dawî kirin. Di kurmancî de rewşeke wisa nîn e.

Hîtîfî

Cihnavên Kesane yê Serbixwe

sumes " hûn, we", *apus* " ew, wan"

Pl. 2. *sumenzan*, Pl.3. *apenzan*

Cihnavên Şanîdanê

ke " van", *ape* " wan"

Pl. 2. *kenzan*, wan, Pl.3. *apenzan*

g) Di hîtîfî de dema cihnav tên kêşandin di dawîya wan de hinek taybemendî çêdibin. Halê *Dat.-Lok Sg/Pl û Abl. Sg/Pl.* dawîya wan bi paşgira *-eda(n)* tê dawîkirin. Di kurmancî de taybemendiyeke wisa nîn e.

Cihnavên Kesane yê Serbixwe

ammuk " ez, min", *zîk* " tu, te", *anzas* " em, me", "*sumes* " hûn, we"

Abl. Sg. 1. *ammedaz(a)*, Sg.2. *tuedaz(a)*, abl. Pl. 1. *anzedaz*, Pl. 2. *sumedaz*

Kêşana Cihnavên Şanîdanê

ka " ev, vî/ê (herî nêzîk)", *ape* " ew, wî/ê (nîvek nêzîk)", *asî* " ew, wî/ê (dûr) "

Dat.-lok. Sg. *kedanî*, *apedanî*, *edanî*, dat.-lok. Pl. *kedas*, *apedas*, *edas*

Cihnavên Nedyar

damaî " a/ê/ên din"

abl. Sg. *damedâ*, abl. Pl. *damedaz*

h) Di hîtîti de dema ku cihnav tên kêşandin di dawîya wan de hinek taybemendî çêdibin. Halê Nom.-Akk. n. Sg./Pl. dawîya wan bi paşgira **t-yê** tê dawîkirin. Di kurmancî de taybemendiyeke wisa nîn e.

Kêşana Cihnavên Şanîdanê

ape " ew "

Nom.-akk. Sg. Sg. *apat*

Cihnavên Pirsyariyê

kuî/kue " kî, kîjan?, çi? "

Nom.-akk. Sg. *kuî*

2.3. Rengdêr

Rengdêr ew e, navan ji aliyê; reng, rewş, teşe, hejmar, dirûv, nekifîşî û pirsê ve nîşan dide.⁵⁵⁹

2.3.1. Di Hîtîti De Rengdêr

⁵⁵⁹ Aktuğ, b.n., r. 230.

Rengdêr, wek gelek zimanên Hînd-Ewropî û yê din ji aliyê hal, zayend⁵⁶⁰ û hejmarê ve hevsaziyek heye.⁵⁶¹ Di hîtîti de rengdêr berî navan tên.⁵⁶²

2.3.1.1. Rengdêrên Çawaniyê

Di hîtîti de rengdêrên çawaniyê piranî tên pêşiya navan, Lê ku rengdêr bibe lêker pêşî nav tê pişt re rengdêr.

Mînak:

arranza halkîs

" genimê **şûştî** "

harran watar

" ava **lewitî** " ⁵⁶³

sallî Kur-e (utne)

" welatê **bêqisûr** ".⁵⁶⁴

^mAnîtas nakis LUGAL eszî

" Anîta qralekî **bi hêz** e ".⁵⁶⁵

2.3.1.2. Rengdêrên Şanîdanê

Di hîtîti de cihnavên şanîdanê yê bingehîn *ka* (ev) û *apa* (ew) ye.⁵⁶⁶ Ji bo cihnav û rengdêran tên bikaranîn.⁵⁶⁷ Cihnava *ka* (ev) û *apa* (ew) di halê akk. c. Sg. *akun* (*kan*) nom.-akk. n. Sg. *kî* (*ke*), Nom. c. Pl. *kê*, Nom. c. Sg. *apas* (*abas*), Abl. Sg. *apêz* (*apizza*) e.⁵⁶⁸

Mînak:

Cihnava -ka (ev)

Nom.-Akk. n. *kî ishul*

⁵⁶⁰ von G. Heinrichs, Einführung in die hethitische Sprache, r.47, www.g-heinrichs.de/hethitisch/Kapitel10.pdf (13.11.2018)

⁵⁶¹ Süel, b.n., r. 453.

⁵⁶² Heinrichs, b.n. r. 47.

⁵⁶³ Süel, b.n., r. 439.

⁵⁶⁴ Hoffner & Melchert, b.n., r. 271.

⁵⁶⁵ Heinrichs, b.n., r. 47.

⁵⁶⁶ Dinçol, b.n., r. 80.

⁵⁶⁷ Hoffner & Melchert, b.n., r. 283.

⁵⁶⁸ Dinçol, b.n., r. 84.

" vê berpirsiyariyê"

Akk. c. Sg. *kun* SAL-an

" vê jinê"

Nom.-Akk. c.Pl. *kê arkuwarrî* HI.A

" van diayan "

Cihnav –apa (ew)

Nom. c.Sg. *apas-* pat memias

" aha ew mesele"

Abl.Sg. *apez lînkîyaz*

" ji wê sondê" ⁵⁶⁹

2.3.1.3. Rengdêrên Nediya

Di hîtîti de cihnavên nediya *kuîskî* c. û *kuîtkî* n. bikaranîna wan ji bo rengdêran " hinek her, heçî" nerênîya wan jî *UL kuîskî* c. û *UL kuîtkî* n. " ti, hîç" ji bilî van du nîv-cihnavên nediya ji eyni kokê *dama(i)*" xeynî, a/ê din" ⁵⁷⁰ û *dapî(ya)-dapiyant* " hemû", her wiha rengdêra *humant* jî tê wateya " hemû" ⁵⁷¹

Mînak:

nu=smas sardiyas kuîskî paîzzî

" û **hinek** piştgirî ji wan re tê"

man DINU=MA kuîtkî salleszî

" ger **hinek** dozên zagonî çêbin".

man DUMU. LUGAL kuîskî wastai

" **heçî** prensê gunehê wî hebe"

tamaî utne

" welatê din" ⁵⁷²

damaîn antuhsan

" mirovê/a **din** "

arrahzenas utneantes humantes

⁵⁶⁹ Süel, b.n., r. 439-40.

⁵⁷⁰ Dinçol, b.n., r. 84.

⁵⁷¹ Hoffner & Melchert, b.n., r. 271.

⁵⁷² Hoffner & Melchert, h.b., r. 287.

" hemû dewletên cîranan " ⁵⁷³

2.3.1.4. Rengdêrên Pirsiyariyê

Di hîtî de formên pirsê bi cihnavên pirsiyariyê *kuî û kue* " kî, kîjan, çi? ",⁵⁷⁴ *masîwant* " çi qas, çend", herwiha ji hokerên pirsiyariyê *kuwat* " çima" *kuwapî* " li ku, kengî" ⁵⁷⁵ û *mahhan* " çawa" têne çêkirin. ⁵⁷⁶

Mînak:

kues ERÎN ^{MEŞ} ?

" **kîjan** yekîneyên lêşkerî"

NAM. RA ^{MEŞ} *kues*?

" **kîjan** êsîrên sivîl? " ⁵⁷⁷

2.3.2. Di Kurmancî De Rengdêr

Di kurmancî de rengdêr, piştî navan tên. Bi tenê rengdêrên hejmarkî him berî him piştî navan tên.⁵⁷⁸

2.3.2.1. Rengdêrên Çawaniyê

Di kurmancî de rengdêrên çawaniyê, rengdêrên resen in. Di nava hevokê de tu guherîn di wan de çênabe û bi tenê qertafên paye distînin; rewş, reng û teşeya navan didin diyarkirin.⁵⁷⁹ Rengdêrên çawaniyê, piştî navan tên.

Mînak:

Ava **sar**

Barê **giran**

Şeva **tarî**

Çiyayê **spî** ⁵⁸⁰

⁵⁷³ Süel, b.n., r. 439.

⁵⁷⁴ Van Den Hout, b.n., r. 86.

⁵⁷⁵ Süel, b.n., r. 439-40.

⁵⁷⁶ Zeilfelder, b.n., r. 135.

⁵⁷⁷ Süel, b.n., r. 441.

⁵⁷⁸ Aktuğ, b.n., r. 230.

⁵⁷⁹ Taş, b.n., r. 100.

⁵⁸⁰ Lezgîn, b.n., r. 62.

Maseya **girover**

Textê **çarçik** ⁵⁸¹

Ew ji te biçûktir e.

Sêv ji hêjîrê xweştir e. ⁵⁸²

2.3.2.2. Rengdêrên Şanîdanê

Di kurmancî de dema cihnavên şanîdanê xwerû " *ev* û *ew*" û halê wan tewandî " *vî*, *vê*, *van*, *wî*, *wê*, *wan*" têne pêşiya navan wan nîşanî me didin, dibin rengdêrên şanîdanê. ⁵⁸³Peyvên wek " *hanî*, *halo*, *wiha*, *wisa*, *wilo*, *werê* " jî rengdêrên şanîdanê ne. ⁵⁸⁴ Bi alîkariya lêker û cihnavên kesandinê yekjimarî û pirjimariya wan diyar dibe.

Mînak:

Ev

Xwerû-nêzîk-yekjimar

xwerû-nêzîk- pirjimar

Ev mêr e.

Ev mêr in.

Ev jin e.

Ev jin in.

Ew

Xwerû-dûr-yekjimar

xwerû-dûr- pirjimar

Ew mêr e.

Ew mêr in.

Ew jin e.

Ew jin in. ⁵⁸⁵

Vî (nêr), **Vê** (mê) û **Van** (pirjimar)

Tewandî-nêzîk-yekjimar

Tewandî-nêzîk- pirjimar

Vî lawikî têr nan nexwar.

Van rebanan çî digot. ⁵⁸⁶

Vê gulê bide Gulistanê.

Van kulîlkan av bide. ⁵⁸⁷

Wî (nêr), **Wê** (mê) û **Wan** (pirjimar)

⁵⁸¹ Aktuğ, b.n., r.232.

⁵⁸² Tan, b.n., r. 168.

⁵⁸³ Yıldırım, b.n., r. 235.

⁵⁸⁴ Samur (2014), b.n., r. 249.

⁵⁸⁵ Yıldırım, b.n., r. 235.

⁵⁸⁶ Tan, b.n., r. 172.

⁵⁸⁷ Taş, b.n., r. 103.

Tewandî-dûr-yekjimar

Wî xortî nivîsî.

Wê jinikê nivîsî.⁵⁸⁸

Tewandî-dûr-pirjimar

Wan mêrikan nivîsî.

Wan belangazan şîv nexwaribûn.⁵⁸⁹

Bi şiklê peyvan-nediyar-dûr

Dermanên **wiha** bi kar neyinin.

Ez kare **hanî** nakim.

Bi şiklê peyvan-diyar-nêzik

Germa **wisa** ji mirov re xetere ye.

Dilê min naçe xwarinên **wilo** rûnî.⁵⁹⁰

2.3.2.3. Rengdêrên Nediyar

Di kurmancî de Rengdêrên nediyar, bi alîkariya cihnavên nediyar çêdibin. Dema ev cihnavên nediyar têne pêşîya navan wan nediyar dikin. Dibin rengdêrên nediyar.

Mînak:

Hemû zerdeleyan bike hindurê tûrikî.

Filan xanimê ev xwarin çêkiriye.

Her gundî divê ji gundê xwe hez bike.⁵⁹¹

Hinek gund ji navçeyan xweştir in.

Di misîn de **piçek** av maye.

Gelek evîndar nagihîjin hev.

Çend xwendekar ji zanîngehê hatin.⁵⁹²

2.3.2.4. Rengdêrên Pirsyariyê

Rengdêrên pirsyariyê, bi riya pirsê navan ji aliyê rewş, reng, teşe, cih, hejmar û mêjerê ve bi me dide nasîn.⁵⁹³ Di kurmancî de rengdêrên pirsyariyê yên bingehîn ev in: *çi, kîjan, çi qas, çend?*⁵⁹⁴, *çawa, çito, çilo, çerê?*

⁵⁸⁸ Malmîsanij, b.n., r. 119.

⁵⁸⁹ Ocek, b.n., r. 150.

⁵⁹⁰ Samur (2014.), b.n., r. 119.

⁵⁹¹ Taş, b.n., r. 104.

⁵⁹² Yıldırım, b.n., r. 259.

⁵⁹³ Lezgîn, b.n., r. 64.

⁵⁹⁴ Yıldırım, b.n., r. 259.

Mînak:

Dara gûzê **çawa** ye?

Dara gûzê **bilind** e.

Bajarî mirovên **çilo** ne?

Bajarî mirovên **wilo** ne.⁵⁹⁵

Kîjan beran qelew e?

Ev beran.

Çi qas dewê meşkê ma?

Gelek dewê meşkê ma.

Çend navçeyên Wanê hene?

Yazdeh navçeyên Wanê hene.⁵⁹⁶

Ji aliyê rengdêran ve nuqtayên hevbeş

a) Di hîtîti û kurmancî de cihnavên şanîdanê tên ber navan û wan nîşan didin.

Bi vî awayî dibin rengdêr.

Hîtîti

kî îshul

apez lînkîyaz

Kurmancî

vê berpirsiyariyê

ji wê sondê

b) Di hîtîti û kurmancî de hinek peyvê rengdêrên nediyar nêzî hevin.

Hîtîti

humant

Kurmancî

Hemû

c) Di hîtîti û kurmancî de hinek peyvên rengdêrên pirsariyê nêzî hev in.

Hîtîti

kuî/e

Kurmancî

kîjan

d) Di rengdêrên nediyar ên hîtîti û kurmancî de rengdêr him tê ber navan him jî tê pişt navan.

Hîtîti

damaîn antuhsan

Kurmancî

mirovê/a din

⁵⁹⁵ Tan, b.n., r. 176-7.

⁵⁹⁶ Ocek, b.n., r. 152.

*arrahzenas utneantes **humantes***

hemû dewletên cîranan

Ji aliyê rendêran ve nuqtayên cuda

a) Di rengdêrên çawaniyê de di hîtîti de rengdêr tê ber navan di kurmancî de tê pişt navan.

Hîtîti

arranza halkîs

Kurmancî

genimê şûştî



3. HOKER, ERGATÎF, LÊKER

3.1. Hoker

Hoker, peyvên wateya lêker, rengdêr û hokeran ji aliyê rewş, dem, çendanî, cih û pirsariyê ve dide nasîn. Hoker, peyvên wek çawa, kengî, çi qas, li ku ji lêkerê dide pirsîn.⁵⁹⁷

3.1.1. Di Hîtîfî De Hoker

Di Hîtîfî de hoker peyvên mîna *mahhan* " çawa, kengî" *kuwapî* " li ku, kengî" û kêma carna ji *kussan* " kengî",⁵⁹⁸ *kuwat* " çima, bo çi" *kuwatka* " çawa, bi çi şiklî" ji lêkerê dide pirsîn.⁵⁹⁹

Hokerên çawaniyê

kîssan " wiha", *apenîssan* " wiha, vî awayî", *enîssan* " vî awayî, wekî pêşî derbas bû", *appenîssan* " wilo, bi wî awayî", *kuwatka* " bi awayekî, bi rengêkî", *arumma* " bi zêdeyî", *îmma* " bi rastî, heqîqeten, *katta* " gorvî, bi encamî", *karsî* " dilsozî, bi rastî, bê henek,"⁶⁰⁰ *apadda* " bi vî awayî, loma, ji ber vê yeke, *apadda seîr* " ji ber vê yeke, " *namma* " ji bilî vê, dîsan, cardin, " *assu* " baş, têr baş, " ⁶⁰¹

Hokerên demê

kînun " anha, niha", *apiya* " wê demê, pişt re", *kuwapî* " dema ku, gava ku" *kuwapiya* " herdem, hertim", *karu* " demekê, berê", *annisan* " berê, berê de, demekê de" *lukatta* " roja din, sibê"⁶⁰², *namma* " pişt re", *nuwa* " hê, hîna", ⁶⁰³ *kuîtman* " heta, heta ku, ta, ta ku, " ⁶⁰⁴ *ziladuwa* " dema bê, siberoj, " *nawî* " anha na, " *nawî kuîtman*

⁵⁹⁷ Malmîsanij, b.n., r. 159.

⁵⁹⁸ Hoffner & Melchert, b.n., r. 289.

⁵⁹⁹ Van Den Hout, b.n., r. 87.

⁶⁰⁰ Hoffner & Melchert, b.n., r. 291.

⁶⁰¹ Ünal, b.n., r. 239-240.

⁶⁰² Friedrich, b.n., r. 128.

⁶⁰³ Hoffner & Melchert, b.n., r. 290.

⁶⁰⁴ Van Den Hout, b.n., r. 87.

" berê ewilî, " nuwan " qet, ti car, " duwan para " heya niha, " hudak " zû, zûka, ji nişka ve. " ⁶⁰⁵

Hokerên cihî

anda " tê de, hundurû", *andan* " "tê de, di nav de", *appa* "paş, pişt" *appan* (li)paş, (li)pişt, *pey re*, *pişt re*" *katta* " jêr, xwarê, binî", *kattan* " (li)bin, (li) jêr, (li) xwarê", *para* " pêş, ber bi pêş ve, ber bi derve", *peran*" (li) pêş, (li)ber", *sara* " ser, banî, jor"⁶⁰⁶, *ser* "(li) ser, (li) banî, (li) jor", *arha* " (li) dûr",⁶⁰⁷ *ka* " li vir, vira, " *ket* " vir, vira, " *kez* " ji vir " *menahhanda* " li himberî, li ber, " *dammeda* " cihekî din, li cihekî din " *tapusa* "aliyê rex " ⁶⁰⁸

Mînak:

Hokerên çawaniyê

mahhan-kan ke kistanunun

" min ev **çawa** paqij kirin" ⁶⁰⁹

^{LU}KUR ***karsî*** zahhiyaddumat

" bi dijmin re **bi dilsozî** şer bike".⁶¹⁰

Hokerên Demê

nu-za ABU-YA ***kuwapî*** DINGIR ^{LIM}-îs DU-at

" **Gava** bavê min bû Yezdan"

nu ***kuîtman*** ABU-YA INA KUR ^{URU}Mîtannî *esta*

"**Heta** bavê min li dewleta Mîtannî be. ⁶¹¹

namma ^{GIS} *huwallîs wîtenît kîstanumî*

" **Pişt re** bi ava dara merxê paqij dikim" .⁶¹²

Hokerên Cihî

HUR.SAG-î ***ser***

" li **ser** çiyê"

suhhî ser

⁶⁰⁵ Ünal, b.n., r. 239.

⁶⁰⁶ Rieken, b.n., r. 158.

⁶⁰⁷ Dinçol, b.n., r. 90.

⁶⁰⁸ Ünal, b.n., r. 238.

⁶⁰⁹ Rieken, b.n., r. 226.

⁶¹⁰ Friedrich, b.n., r. 128.

⁶¹¹ Süel, b.n., r. 448.

⁶¹² Rieken, b.n., r. 226.

" li **ser** ban"

^{GIS} BANSUR-î *katta(n)*

" li **bin** maseyê"

E-rî *anda*

"di **hundurê** malê de"

^Etarnuî *appan*

" li **pişt** beravxaneyê".

attas-mas appan

" li **pey** bavê min" ⁶¹³

LU.MES ^{URU} *Hallapiya luliyas ser aranta*

" Gelê bajarê Hallapiya li **ser** gola biçûk sekinîne" ⁶¹⁴

3.1.2. Di Kurmancî De Hoker

Di kurmancî de pênc cureyê hokeran hene: hokerên çawaniyê, demê, cihê, çêndî û pirsyariyê.⁶¹⁵ Di kurmancî de hoker pirsên wek çawa, çima, kengî, li ku û çi qas ji lêkerê dide pirsin.⁶¹⁶

Di kurmancî de hokerên bi alîkariya pêşgir û paşgiran pêk tên ev in: Pêşgîra î-, paşgîrên *ane-*, *-kî*, *-ka*, ⁶¹⁷ *-î/ê*, *-kanî*.⁶¹⁸

Mînak:

Îsal, îşev, îro,⁶¹⁹ bêrî, berê, kerane, korkanî, paşpaşkî,⁶²⁰ hêdîka.⁶²¹

Hokerên çawaniyê

Bilez, xweş, giran, baş, hêdî, rind, rast, hêdîka, bi dizîka, qenc, xirab,⁶²² bilind,

⁶¹³ Süel, b.n., r. 444-5.

⁶¹⁴ Brosch, b.n., r. 161.

⁶¹⁵ Yıldırım, b.n., r. 174.

⁶¹⁶ Lezgîn, b.n., r. 76.

⁶¹⁷ Ocek, b.n., r. 173-4.

⁶¹⁸ Malmîsanij, b.n., r. 159.

⁶¹⁹ Ocek, b.n., r. 173.

⁶²⁰ Malmîsanij, b.n., r. 159.

⁶²¹ Ocek, b.n., r. 174.

⁶²² Aktuğ, b.n., r. 442.

bi rastî, halo, jidil, mîna, nola, her wekî, nizm, serserkî, çilo, çito, dereng.⁶²³

Hokerên demê

Pêr, duho, îro, bi roj, pêr, îşev, êvarî, nîvro, berî nîvro, piştî nîvro, berbanga sibê.⁶²⁴ Ji îşev heta sibê, pêrar, îsal, serêvarkî, ber bi êvarî,⁶²⁵ niha, hîn, zû, hergav, her tim, berê.⁶²⁶

Hokerên cihî

Jor, jêr, xwar, hundurû, derve, pêş, paş,⁶²⁷ li dûv, ji dûr ve, bi pêş ve, bi wir de,⁶²⁸ vir, wir, vê derê, ser, bin.⁶²⁹

Mînak:

Hokerên çawaniyê

Keçikên pordirêj **xweşik** dipeyîvin.

Cîwan ji mala xwe **bi lez** derketin.

Bixebite **mîna** şêran, bixwe **mîna** mêran.⁶³⁰

Rustem **bi rastî** ketibû pey şopa gur.

Mizgîn, **bi dizî** hat, **bi dizî** çû.

Divê te **halo** negotiba.⁶³¹

Hokerên demê

Duho hevalê min hate vir.

Ew ê **îşev** werin mala me.⁶³²

Ez **anha** diçim, **sibê** tem

Berêvarkî derket hat.⁶³³

Îsal kur bû, **par** hevûr bû.

⁶²³ Yıldırım, b.n., r. 180-1.

⁶²⁴ Tan, b.n., r. 181.

⁶²⁵ Ocek, b.n., r. 176.

⁶²⁶ Yıldırım, b.n., r. 176.

⁶²⁷ Aktuğ, b.n., r. 444.

⁶²⁸ Tan, b.n., r. 185.

⁶²⁹ Yıldırım, b.n., r. 179.

⁶³⁰ Taş, b.n., r. 143.

⁶³¹ Yıldırım, b.n., r. 180-1.

⁶³² Tan, b.n., r. 184.

⁶³³ Lezgîn, b.n., r. 76.

Pêrar me bi hev re pirtûkek xwend.⁶³⁴

Hokerên cihî:

Tu li **ser** darê mayî.

Ez li **bin** darê rûniştim.

Yek jî li **paş** min sekinî.

Xwendekarek li **pêş** mîn sekinî.⁶³⁵

Em hatin **jêr**.

Em derketin **jor**.

Ez çûm **xwar**.

Bêje bila zarok herin **hundurû**.⁶³⁶

Ji aliyê hokerê ve nuqteyên hevbeş

a) Di hîtîtî de hokera cihî **ser** di kurmancî de hokera cihî **ser** hevpar in.

Hîtîtî

suhî ser

Kurmancî

li **ser** ban

b) Di hokêrên demê de morfolojiya hinek peyvên nêzî hev in.

Hîtîtî

kuwapî

nuwa

kuîtman

Kurmancî

dema ku, gava ku

nûha, hîna

heta, heta ku

3.2. Ergatîf

Ji berê ve zimanzanan, ziman li gorî du kategoriyan tasnîf kirine. Zimanê akkusatîf û ergatîf.⁶³⁷ Di zimanên dinyayê de hinek ziman akkusatîf û nîvakkusatîf in, hinek jî ergatîf û nîv-ergatîf in.⁶³⁸ Di zimanên akkusatîf de lêker li gorî kirdeyê tê kişandin⁶³⁹ û kirde di lêkerên gerguhêz û negerguhêz de her tim di halê xwerû de ye.

⁶³⁴ Ocek, b.n., r. 176.

⁶³⁵ Yıldırım, b.n., r. 179.

⁶³⁶ Aktuğ, b.n., r. 444.

⁶³⁷ Roşan Lezgîn, "Kürtçe'de Akuzatif-Ergatif Özellik," Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, hjm: 2. 2015, r. 84.

⁶³⁸ Samur (2014), b.n., r. 249.

⁶³⁹ Lezgîn, b.n., r. 140.

Lê di zimanên ergatîf de di lêkerên negerguhêz de kirde xwerû ye, lê di lêkerên gerguhêz de kirde tewandî ye.⁶⁴⁰ Yanê di hevokên gerguhêz de kirde qertafekê distîne û ji halê xwerû dikeve halê tewandî. Di van hevokên gerguhêz de bireser di halê xwerû de ye⁶⁴¹ û lêker li gorî bireserê tê kişandin.⁶⁴² Ev rewşa rêzîmanî di hinek zimanan de hemû deman di lêkerên gerguhêz de lê di hinek zimanan de jî bi tenê dema borî di lêkerên gerguhêz de tê xuya kirin.⁶⁴³ Dema ev rewş bi tenê ji bo dema borî bê kişandin dibêjin nîv-ergatîf, lê ji bo hemû deman bê kişandin dibêjin tam-ergatîf.⁶⁴⁴

Zimanzan *Mario van de Visser*, dibêje di zimanên dinyayê de ji sedî di bîst û pêncan de rewşa ergatîfî heye û zimanzan Wiliam Bernard McGregor jî dibêje di hemû zimanan de xaleke ergatîfî heye.⁶⁴⁵

3.2.1. Di Hîtîti De Ergatîf

Hevoksaziya zimanê hîtîti bi piranî li gorî xweseriyek ji zimanê Hînd-Ewropî pergala akkusatîf tê şuxilandin. Di him lêkerên gerguhêz û him lêkerên negerguhêz de kirde di halê nomînatîf de tê dîtin. Digel vê yekê bireser rasterast di lêkerên gerguhêz de di halê akkusatîfê de tê dîtin. Her wiha Emile Laroche li gorî rêzîmanê tiştêk anî zimên. Dema navekî nêtar bibe kirdeya lêkerên gerguhêz pêwîst e ev navê nêtar qertafa Sg. *-anza* û Pl. *-antes* bistîne.⁶⁴⁶ Ev qertaf di zimanê luwî de wek Sg. *-antîs*, Pl. *-antînzî*⁶⁴⁷ û di zimanê lîkyayî de jî wek Sg. /Pl. *-edî* tê dîtin.⁶⁴⁸

Hîtîti: man=an pahhuen-anza arha warnuzî

" hêvî dikim agir wî tam dişewitîne"

Luwî: sanduw=ata parn-antînzî... tarus-antîs

" xanî û peykeran azad dikin"

⁶⁴⁰ Lezgîn, Kürtçe'de Akusatif-Ergatif... r. 84.

⁶⁴¹ Atilla Batmaz, *Urartu Kültürünü Oluşturan Temel Öğeler*, Teza Doktorayê ya çapnebûyî, Ege Üniversitesi İzmir, 2011, r. 187.

⁶⁴² Lezgîn, b.n., r. 140.

⁶⁴³ İlyas Sayım, *Kurmancî ve Hintçede Ergatif Yapı Üzerine Bir İnceleme*, Teza Masterê ya çapnebûyî, Muş Alparslan Üniversitesi, 2017, r. 1.

⁶⁴⁴ Lezgîn, b.n., r. 140.

⁶⁴⁵ Petra Goedegebuure, *Split-Ergativity in Hittite*, University of Chicago, r. 1, https://www.academia.edu/11413676/The_rise_of_split-ergativity_in_Hittite 12.3.2019)

⁶⁴⁶ Hoffner & Melchert, b.n., r. 66.

⁶⁴⁷ Oscar Jäntti, *Evaluating Anatolian 'Ergativity'*, Leiden University, MA Comparative Indo-European Linguistics, r.1. www.academia.edu/27038870/Evaluating_Anatolian_Ergativity(19. 3.2019)

⁶⁴⁸ Petra Goedegebuure, *Split-ergativity in Hittite (final submitted version)*, University of Chicago, r. 4, www.academia.edu/632870/Split-ergativity_in_Hittite_final...(19. 3. 2019)

Lîkyayî: s=ene tes-efî qantî trmmîlîjetî

"sondên (welatê) Lîkyayê wî bi dest bixwin" ⁶⁴⁹

Ev rewş Andrew Garrett weke ergatîfa Anadolu anî zimên.⁶⁵⁰ Di hîtî de rewşa ergatîfê bi qertafên *-anza/ants* û *-antes* tên dawiya navên nêtar, bi awayî tê çêkirin.⁶⁵¹ Li gorî hinek zimanzanan ev qertaf li ser bingeha qertafa *-ant'*ê hatine saz kirin.⁶⁵² Garret ev qertaf wek qertafên ji bo sazkirina ergatîfê tên çêkirin anî zimên. Her çî qas li gorî xwe ew rewş anîbe zimên jî ji bo şikê deriyek vekirî hiştibû. Zimanên xweseritiya pergala ergatîfa belavbûyî (split ergatîf) tede tê xuyakirin, ev taybetî di hemû nomînal sentaksa hîtî de jî tê xuyakirin. ⁶⁵³

Sazkirina ergatîfê wiha ye: peyvên nêtar + paşgirên ergatîf sg. **-anza** û pl. **-antes** û lêkerên gerhuhêz.

Mînak:

nu ^mKessîn îdalalawanza GIG -anza harzî

" û nexweşiyê nebaş Kessî girtiye. " ⁶⁵⁴

SAG. DU-ann=a îslhîsn-antes app-anzî

" yên bi bendîkaran serê xwe bigrin " ⁶⁵⁵

Pişt re jî ji aliyê zanyaran ve, mijara ergatîfê hate niqaş kirin. Hinan ji wan rewşa ergatîfî red kirin û hinan jî pîranî nêrina Laroche qebl kirin. Yê din jî nêrinên xwe dianîn zimên. Hinan ji wan jî qertafa *-anza/antes* wek qertafa ku wateya " hêzê û biçûkkeriyê" dide anîn zimên, hinan jî digot dema qertafa *-anza/antes* tê navên nêtar wan ji rewşa nêtarî dike rewşa zindîti an jî ya zayendîtiyê de.⁶⁵⁶

3.2.2. Di Kurmancî De Ergatîf

Di kurmancî de ergatîfî bi tenê di lêkerên gerguhêz ên dema borî de tê xuya

⁶⁴⁹ Jäntti, b.n., r. 4.

⁶⁵⁰ Ilya Yakubovich, Ergatîfê in Hittite, r. 2, [PDF] [Ergatîfity in Hittite by Yakubovich](#) (14.3.2019)

⁶⁵¹ Petra Goedegebuure, The rise of split-ergatîfity in Hittite, New Orleans, 2015, r. 1, [https:// www.academia.edu/.../The_rise_of_split-ergatîfity_in_15](https://www.academia.edu/.../The_rise_of_split-ergatîfity_in_15). 3. 2019)

⁶⁵² Jäntti, b.n., r. 1.

⁶⁵³ Hoffner & Melchert, b.n., r. 66.

⁶⁵⁴ [The Problem of the Ergatîfê Case in Hittite - UCLA](#) (17.3.2019)

⁶⁵⁵ Jäntti, b.n., r. 13.

⁶⁵⁶ Jäntti, h.b., r. 1.

kirin. Ji ber wê kurmançî nîvergatîf e.⁶⁵⁷ Ger bireser yekjimar be lêker ti qertafên mêjerê nastîne, lê bireser pirjimar be lêker qertafa *-in* 'ê distîne. Ger kirde nêr yekjimar be qertafa *-î*, mê be qertafa *-ê*, pirjimar be qertafa *-an* distîne.⁶⁵⁸ Bi kurtasî di kurmançî de ergatîf dema borî di lêkerên gerguhêz de kirde wek cihnavên tewandî *min, te, wî/ê, me, we, wan* hatibe bikaranîn⁶⁵⁹ û bireser jî wek cihnavên xwerû *ez, tu, ew, em, hûn, ew* 'ê hatibe bikaranîn û li gorî van cihnavên xwerû cihnavên kesandinê hatibin dawiya lêkeran.⁶⁶⁰

Mînak:

Bireser Yekjimar-Pirjimar

Min kovar xwend. →bireser yekjimar

Min kovar xwend**in**.⁶⁶¹ →Bireser pirjimar

Kirde nêr-mê Lêker Yekjimar-Pirjimar

Ehmedî rojnameyê xwend. → kirde -nêr →lêker yekjimar kesê sêyem

Ehmedî rojnameyê xwend**in**. →irde- nêr →lêker pirjimar kesê sêyem

Rukenê rojname xwend. → kirde -mê →lêker yekjimar kesê sêyem

Rûkenê rojname xwend**in**→ kirde-mê→ lêker pirjimar kesê sêyem⁶⁶²

Kirde pirjimar lêker Yekjimar û pirjimar

Heval**an** rojnameyê xwend. →kirde pirjimar →lêker yekjimar kesê sêyem

Heval**an** rojname xwend**in**.⁶⁶³ →kirde pirjimar →lêker pirjimar kesê sêyem

Kirde Cihnavên-Tewandî-Bireser Cihnavên-Xwerû

Wî ez girtim. →kirde tewandî →bireser xwerû →lêker yekjimar kesê yekem.⁶⁶⁴

Wan em girtin.→kirde tewandî -pirjimar →bireser xwerû→lêker pirjimar kesê yekem

Min **tu** dîtî. →kirde tewandî →bireser xwerû →lêker yekjimar kesê

⁶⁵⁷ Ocek, b.n., r. 52.

⁶⁵⁸ Yıldırım, b.n., r. 77.

⁶⁵⁹ Aktuğ, b.n., r. 226.

⁶⁶⁰ Taş, b.n., r. 64.

⁶⁶¹ Ocek, b.n., r. 52.

⁶⁶² Sayım, b.n., r. 8.

⁶⁶³ Yıldırım, b.n., r. 77.

⁶⁶⁴ Taş, b.n., r. 64.

duyem⁶⁶⁵

Wê **ew** dît. →kirde tewandî →bireser xwerû →lêker yekjimar kesê sêyem

Wan **ew** dîtîn. →kirde tewandî →bireser xwerû →lêker yekjimar kesê sêyem

We **em** dîtîn. →kirde tewandî →bireser xwerû →lêker pirjimar kesê yekem

Ji aliyê ergatîfê ve nuqtayên hevpar

a) Di hîtîti de ergatîfi bi şiklê ku lêker gerguhêz be qertafên -ant Sg. û -antes Pl. bên navekî nêtar çêdibe. Di kurmancî de ergatîfi bi tenê dema borî di lêkerên gerguhêz de tê çêdibe. Ji ber wê rewşa ergatîfi di hîtîti û kurmancî de bi tenê qismekî tê çêkirin û herdu jî ne tam-ergatîf in.

b) Ji bo sazkirina ergatîfê him di hîtîti de û him kurmancî de lêker gerguhêz in.

Ji aliyê ergatîfê ve nuqtayên cuda

a) Hevoksaziya hîtîti bêhtir li gorî pergala akkusatîfê tê şixulandin, di pergala akkusatîfê de lêker li gorî kirdeye tê kişandin. Hevoksaziya kurmancî li gorî ergatîfê tê bikaranîn û lêkêr jî li gorî bireserê tê kişandin

b) Di kurmancî de ji bo rewşa ergatîfê çêbibe pêwîst e dema borî be, lê di hîtîti de qaîdeyeke wisa nîn e.

c) Di hîtîti de ji bo rewşa ergatîfê çêbibe pêwîste nav nêtar be, lê di kurmancî de qaîdeyeke wisa nîn e.

3.3. Lêker

Di rêzimanê de peyvên di nava hevokê de xebat, kar û tevgerê didin nîşan jê re dibêjin lêker. Mînak: rabûn, çûyîn, kirin, bûyîn hwd.⁶⁶⁶ Lêker bingeha hevokê ye.⁶⁶⁷ Herwiha lêker ji aliyê dem, rawe, avanî û rewşê ve bi kirdeyê re tê kişandin.⁶⁶⁸

⁶⁶⁵ Sayım, b.n., r. 5.

⁶⁶⁶ <https://ku.wikipedia.org/wiki/Lêker> (21.3.2019)

⁶⁶⁷ Yakup Selimoğlu, Lêker, mamosteye-zimane-kurdi.blogspot.com/2014/11/leker.html (10.4.2019)

⁶⁶⁸ Ocek, b.n., r. 208

3.3.1. Di Hîtîfî De Lêker

Di hîtîfî de lêker xwedyê du kişandinên cuda ye û ev kişandin li gorî sitandina paşqertafa Prs. Sg. 1. kişandina " *mî û hî*" yê ye.⁶⁶⁹ Ev kişandin nasandina kesan (Sg/pl. 1.2.3) jî dide diyarkirin.⁶⁷⁰ Kişandina " *mî* " yê di hinek zimanên din de jî tê xuyakirin, lê kişandina " *hî* " yê bi tenê xweseriyeke zimanê hîtîfî ye.⁶⁷¹

Lêkera hîtîfî xwedyê du hejmar, avanî, rawe û dema yê jî, li gorî van: Hejmara yekjimar û pirjimar, avaniya aktîf û medîo-pasîf, raweya daxuyanî û fermanî, dema niha û dema borî.⁶⁷² Dema niha ji bo dema fireh û bê jî dihate bikaranîn. Zimanzanan li gorî rewşa hevokê ew ji hevdu cuda dikirin.

Di hîtîfî de di şûna avaniya pasîf de avaniya medîo-pasîf dihat bikaranîn. Sedama wê jî ev e, saziya avaniya hîtîfî her tim wek pasîf nedihat bikaranîn.⁶⁷³ Ev medîo-pasîfa hîtîfî dişibihe şiklê medîo-pasîfa zimanê Grekî û zimanên Indo-Îranî, her çî qas kişandina lêkerê medîo-pasîf hatibe kişandin jî, lêker wek wateya aktîf tê xuyakirin.⁶⁷⁴ Di hîtîfî de rader (înfînîtîv) qertafên *-wanzî* û *-anna* disitînin⁶⁷⁵ û di lêkerên cuda de bi du awaya tê çêkirin:

Di Lêkerên ablaut (guherîna dengdêra) de bi -anna

Mînak:

ed " xwarin " *adanna* " xwarin "

eku " vexwarin " *akuwanna* " vexwarin "

Bi alîkariya -uwanzî

es " bûyîn " *assuwanzî* " bûyîn "

ses " razan " *sesuwanzî* " razan " ⁶⁷⁶

Di hîtîfî de avaniya dançêker bi alîkariya qertafa *-nu* ' yê çêdibe.

Mînak:

⁶⁶⁹ Brosch, b.n., r. 22.

⁶⁷⁰ P. Streck, b.n., r. 97.

⁶⁷¹ Ünal, b.n., r. 171.

⁶⁷² Zeilfelder, b.n., r. 47.

⁶⁷³ Alparslan, b.n., r. 16.

⁶⁷⁴ Dinçol, b.n., r. 92.

⁶⁷⁵ Dinçol, h.b., r. 95.

⁶⁷⁶ Ünal, b.n., r. 181-2.

Lêker: *ar* → gihaştin → *arnu* → gihandin.⁶⁷⁷

Lêker: *war* → şewitîn → *warnu* → şewitandin.

Lêker: *weh* → zivirîn → *wahnu* → zivirandin.

Lêker: *link* → sond xwarin → *linganu* → sond dan xwarin⁶⁷⁸

Tablo 82. Qertafên dema Niha (Hîtîti)

Hîtîti Dema Niha			
⁶⁷⁹ Aktîf		⁶⁸⁰ Medîo-pasîf	
